Rojên Derbasbûyî

Piştî jiyineke sê salan jiyineke tal û şêrîn ez ji Amûdê bi dûr diketim... Çend hevalên min ên fedakar û çend sûxteyên min ên wefakar dora timobîla me girti bûn. Yek, du heval xuya ne bûn; Xwedê zane ne ji bêbextî, dibe ko ji diltengiya ji hev qetandinê çavên wan bar ne bû bû û ne hati bûn...²

Bi kel û girî min û hevalan destên xwe bi hustiwên hev re bir û anîn. Me hevdû dispart Xwedê... Bi germiyeke wusan me destên hev diguwaşt ko dilên me ji hev re digotin: Emê her û her heval û bira bimînin...³

¹nav *m* name; esasî original; şair *m* poet; nivîskar *m* writer; herî very; bi quwet powerful; mekteb *f* school; Hawar a Kurdish journal; him...him both...and; pexşan *f* prose; şîr poetry; bedew splendid; kurteçîrok *f* short story; nûjen modern; hatîne dinê to be born; dest birin bi (+ inf.) to begin; xwendegeh *f* school; bilind high; Anteqya Antioch; Îskenderûn Alexandretta; mamostatî kirin to teach.

²jiyin = jîyîn life; tal bitter; şêrîn sweet; Amûda ‘Amûdā, a town in Syria near Qāmishlî; bi dûr ketin (kev) ji to leave behind; heval friend; fedakar devoted; sûxte theological student; ên = yên; wefakar faithful; dora ... girtin to surround; timobîl *f* automobile; xuya bûn to show up; bêbextî disloyalty; ko = ku here ‘as if’; diltengî *f* sadness; ji hev qetandin to part from one another; çavên wan bar nebûbû ‘they hadn’t been able to bear the sight.’

³kel û girî crying and weeping; hustu *m* neck; spartin Xwedê to entrust to God, to say goodbye; germî *f* warmth; wusan thus; guwaştin (guvêş) to squeeze; her û her forever and ever; man (mîn) to remain.

READINGS

Gava timobîl bi rê ket, bê hemd çend hêsir ji çavên min herikîn... Ji alîkî, ji hevalan bi dûr diketim, ji aliyê din birîna hêta min ez diêşandim; giyanê min dihejiya; min ne zanî bû êşa vê birînê ewê çiqas dom bike û ewê çi li eniya min binivîse!¹

Gelek rojên xweş û pir rojên reş min li Amûdê derbas kirin. Paşiya paşîn ez bûm zelûlê serencameke kirêt.²

Gava diçûm dibistanê û vedigeriyam, dêlikek teva du cewrên xwe li ser riya min xuya dibûn û bi min da direyan. Cewrekî gurî bû, çavekî wê kwîr bû, rîşekê nêviyê rûyê wî şewitandi bû... Cewrikê din kurmî bû, mîna bi nexweşiya firengiyê lê be, gava direya kewtîn û kazkaza wî, nola kwîsiyê lablabik bi berde ma be, bi der diket...³

Belê van cewrikan timî dixwestin riya min bibirin... min jî guh ne dida wan... ne dihate bîra min ko rojekê hestiyekî bavêjim ber wan û xwe ji wan biparêzim. Rojekê ji nişka ve cewrikekî—Xwedê zane ê kwîr bû—ji paş ve bi hêta min girt û ez birîn kirim...

Tixtoran ji min re hewa guhastin û cih guherandin berpêş û “Eyndîwer” nîşan kir.⁴

Timobîla me hêdî hêdî ji Amûdê bi der ket û paşê lezand; hevalan, hetanî

¹**bi rê ketin** to start out; **bê hamd** reluctantly, unwillingly; **hêsir** *m* tear; **herikîn** to flow; **ji alîkî** (= *aliyekî*) on the one hand; **ji aliyê din** on the other hand; **hêt** *f* thigh; **êşandin** to hurt; **giyan** *m* soul; **hejiyan** to be excited; **êş** *f* pain; **dom kirin** to last; **enî** *f* forehead; **nivîsîn** to write.

²**xweş** good, happy; **reş** black, bad; **derbas kirin** to spend (time); **zelûl** despondent (+ construct ‘because of’); **serencam** *f* outcome; **kirêt** awful, vile.

³**dêlik** *f* bitch; **teva** with; **cewr** pup; **li ser riya** on front of; **reyan** to bark; **gurî** scabby, mangy; **kwîr** blind; **rîş** *f* hair; **nêvî** (= *nîvî*) half; **şewitandin** to burn; **kurmî** wormy; **mîna** like; **nexweşiya firengiyê** syphilis; **lê bûn bi** to be afflicted with; **kewtîn** barking; **kazkaz** *f* wail; **nola** like; **kwîsî** *m* tortoise; **lablabik** *m* marsh.

⁴**timî** always; **riya ... birin** to block the way of; **guh dan** to pay attention to; **hestî** *m* bone; **parastin** (*parêz*) to defend; **ji nişka ve** suddenly; **ê kwîr** the blind one; **birîn kirin** to wound; **hewa guhastin** to have a change of air; **cih** *m* place; **guherandin** to change; **berpêş kirin** to propose; **Eyndîwer** ‘Ayn Dîwār, a small place in Syria directly south of Cizre; **nişan kirin** to indicate.

KURMANJI KURDISH

em ji hev wenda bûn, destên xwe ji min re kil dikirin. Timobîl, her ko diçû, xwe diguvaşt... li aliyê çepê çiyayên Kurdistanê li alî rastê çola Cezîrê û şorezara Erebîstanê diherikîn. Xunaveke bêdeng hûrik hûrik dibariya. Şifêr digot: Xwedê bike baran boş nebare û em xwe bigihînin Qamişlokê...¹

Xwedê em ji herî û çiravê parastin, baran ne bariya. Lê hetanî em gihiştin Qamişlokê xwenavê rûyên me dialast.²

Bi lez û bez min xwe gihand cem tixtor. Birîna min pansiman kir û hinek derman da min. Roja din em gihiştin Dêrikê, li ba hevlekî bûm mêvan, lê bi şev xewnîne bi tirs ez vediciniqandim. Birîna min diêşiya.³

Sibehê ez li timobîlekê geriyam, bi dest ne ket, vêcar li ser hespan me berê xwe da “Eyndîwerê.” Piştî du saetan em gihiştin wir. Ji xortên wir Fetahê Mele Sadiq û Mihemedê Mele Ehmed derketin pêşiya min û bi rûkenî û bi dilgermî destê min guvaştin.⁴

Di yekê Adarê de gihiştim “Eyndîwerê.” Herkesî ji min re digot: Bextê te baş e, tu di serê biharê de hatî vir, ji îro pê ve bihar e, bihara Eyndîwerê mîna bihara zozanên Kurdistanê ye.⁵

Ev fala ko herkesî ji min re vedikir, wusan derneket. Bi hêjmar, mehek û sê rojan, bi şev û bi roj baran bariya. Bi hezar dijwarî min xwe digihand dibistanê. Sûxteyên dibistanê, mîna yên Amûdê, pirê wan kurd bûn. Ji lewra

¹le^zandîⁿ to accelerate; he^tanî until; wenda bûn to be lost; dest kil kirin ji...re to wave at; her ko diçû ‘the farther it went’; guvaştin to squeeze; çiya *m* mountain; çol countryside; Cezîre Upper Mesopotamia; şorezar *f* desert; Erebîstan Arabia; herikîn to flow; xunav *f* sprinkle, light rain; bêdeng silent; hûrik hûrik little by little; bariyan to rain down; şifêr driver; baran *f* rain; boş abundant; xwe gihandin (gihîn) to get oneself to.

²herî *f* mud; çirav *f* muck; parastin (parêz) to protect; hetanî by the time; gihiştin to reach; xwenav (= xunav) *f* sprinkle, light rain; alastin (alês) to lick.

³bi lez û bez hurriedly; xwe gihandin cem to get oneself to; tixtor doctor; pansiman kirin to dress; derman *m* medicine; li ba at the house of, with; ve-ciniqandin to startle.

⁴sibehê in the morning; geriyam li to look for; bi dest ketin to be found; vêcar then, so; hesp horse; berê xwe dan to set out for; saet hour; gihiştin (gihêj) to arrive at, to reach; xort *m* youth, young man; rûkenî *f* smile; dilgermî *f* warmth.

⁵Adar March; herkesî everybody; bext *m* luck; zozan *m* mountain pasture.

READINGS

me zû hevdû nas kir û me zû ji hev hez kir...¹

Qederê mehekê min nikari bû dora xwe bidîta, bi şev baran... bi roj baran... êdî canê me bawî bû bû, hundirê me zingar girti bû. Birîna min jî hêj dixebitî, min bawer ne dikir ko ewê kînga rehet bibe.²

Piştî mehekê bi şun da, niva, roj derket, giya şîn bû, gul û çîçekên rengereng xuya kirin... min fam kir ko buhara Eyndîwerê bihareke welatî ye. Li hember: Çiyayê Cûdî, wargehê Nûh Pêxember, di bin de çemê “Dicle” diherike. Li berê çem “Cizîra Botan” welatê Mem û Zînê xuya dike. Ev her sê bargehên dîrokî di jiyîna min de wergerandineke mezin çêkirin û giyanê min bi axa wê derê ve girêdan... Di rojên baranê de, dost û hevalan jî min re digotin: Malava bihna xwe teng meke, îro sibe, baran ê bisekine, êdin bihar e, emê herin “Pira Bafet” seyranê, tiwê bibînî çî cihekî xweş e, çî cihekî xweş... Min û hevalan çend seyran çêkirin. Vêcar dora “Pira Bafet” bixwe hati bû. Rojekê, me xwarîna xwe bi xwe re bir û em çûn “Pira Bafet,” pira dîrokî (dibêjin di zemanê Mîr Mihemedê yekdest de ava bûye). Bi rast jî cihekî pir xweş bû. Dicle, di bin lingên me re diherikî. Birca Belek rind xuya dibû, li ser Cûdî berfa sipî diçirîsî...³

Hetanî êvarê em li wir man... Hevalê yekta û rûşêrîn Mehemedê Mele mîna hergav weke şalûlekî dikirî şeşşeş, jî dîwana Cizerî perçên dilşewat

¹**fal** (*f*) **ve-kirin** to make a prediction; **wusan** like that; **der-ke_{tin}** to turn out; **meh** *f* month; **dijwarî** *f* difficulty; **pirê wan** most of them; **ji lewra** for that reason; **zû** soon; **nas kirin** to get to know; **hez kirin ji** to like.

²**qeder** *f* fate; **can** *m* body; **bawî** rheumatic; **hindir** *m* inside; **zingar girtin** to rust; **hêj** still; **bawer kirin** to believe; **kînga** ever; **rehet bûn** to get well.

³**giya** *f* grass; **şîn** green; **gul** *f* rose; **çîçek** *f* flower; **rengereng** many-colored; **fam kirin** to realize; **buhar** *f* spring; **welatî** country (adj); **hember** opposite; **Çiyayê Cûdî** Mt. Judi, the mountain on which Noah’s ark came to rest; **wargeh** *f* camping site; **Nûh** Noah; **pêxember** prophet; **çem** *m* river; **Dicle** *f* Tigris; **herikîn** to flow; **Cizîra Botan** the mesopotamian region on the Botan River; **welat** *m* country; **bargeh** *f* headquarters; **dîrokî** historical; **wergerandin** *f* alteration; **mezin** great; **ax** *f* land; **der** *f* place; **girê-dan bi...ve** to attach to; **malava** ‘be reasonable’; **bihn** *f* breath; **bihna xwe teng kirin** to be upset; **sekinîn** to stop; **êdin** from now on; **seyran** (*f*) **çê-kirin** to go on an outing; **pir** *f* bridge; **tiwê** = *tu + ê*; **bixwe hatin** to come into one’s own, to be at one’s best; **xwarin** *f* food; **zeman** *m* time; **yekdest** as a piece; **ava bûn** to be built; **birc** *f* tower; **rind** beautiful; **berf** *f* snow; **sipî** white; **çirîsîn** to gleam.

KURMANJI KURDISH

dibijart û destê xwe bi aheng kil dikir û digot:¹

“Me di dil de heye narek ko disijit seqerê
Erzihala ko nivîsî me bi xûna cegerê.”²

Birîna min hêdî hêdî rehet dibû.

Êdin wexta girtina dibistanan hat. Ji alîkî kêfxweş, ji aliyê din dilnexweş bûm. Ezê vegeyama Şamê, minê hevalên xwe ên li wir û ên li ser rê bidîtana. Lê destê min ji Eyndîwerê û hevalên Eyndîwerê ne dibû. Şaîrekî çiqas rast gotiye: “Gava meriv li cihekî dimîne, bi însan û axa wê derê ve bi benên nexuyayî tîr girêdan, kînga meriv ji wir diçe, ew benên ha dilê meriv ber bi xwe ve dikişînin û diêşînin...”³

Gava ji Eyndîwerê derketim, mîna roja Amûdê qirika min tije girî bû bû.⁴

Roj, meh, sal... çiqas zû derbas dibin. Ev bûn du sal—ne kêr, ne zêde—ji wan cihan, ji wan hevalan bi dûr ketime. Li cihine wisan dimînim ko ne “here” ne “were” dibîsim; guhê min ji vê ahenga pîrestesî bê par maye. Li dora xwe dinêrim ji berdêla Cûdî û Diclê leyline xapînok dibînim.⁵

Hevalekî dewsa Mehemedê Melê, ew dewsa vala, tijî bike nîne—Xwedê giyanê wî bihuştî bike—sûxtê min jî ne Biro û Remo nin, ji diyariya wan deran bi tenê tiştek bi min re maye; di hêta min de hêj jehra diranê wî cewrikî dilive. Ew cewrikê bê xwedî; ew cewrikê serberdayî...⁶

¹**yekta** unique; **rûşêrîn** lighthearted; **hergav** always; **şalûl** magpie; **şeqeşeq** chatter; **dîwan** *f* divan, collected works; **Cizerî** Jizari, a Kurdish poet; **dilşewat** *f* sadness; **bijartîn (bijêr)** to choose; **kil kirin** to wave.

²**nar** pomegranate; **sijîn** to ooze (*disijit* the archaic 3rd-person singular present = *disije*); **seqer** *f* a poison that drips from a tree in hell; **erzihal** letter; **xûn** *f* blood; **ceger** *f* liver.

³**wext** *f* time; **girtîn** to close; **kêfxweş** happy; **dilnexweş** unhappy; **ve-geriyan** to return; **ên** = *yên*; **însan** people; **ax** *f* land; **ben** *f* string; **nexuyayî** invisible; **girê-dan** to attach, to tie; **ew benên ha** those very strings; **kînga** when.

⁴**qirik** *f* throat; **tije** full of; **girî** weeping.

⁵**bîstîn (bîs)** to hear; **aheng** *f* melody; **pîrestes** worship; **bê par** deprived; **leylan** *f* mirage; **xapînok** deceitful.

⁶**dews** *f* place; **vala** empty; **tijî kirin** to fill; **hevalekî dewsa ... tijî bike nîne**

READINGS

OSMAN SEBRÎ

[Her ziman û edebiyat bi hin nav û kesan ve têtê nasîn. Yan jî, ji bervajiyê, gava meriv qala hin nav û kesan dike, welatekî, zimanekî û edebiyatekê tê bîra merivan. Herwekî ku Victor Hugo ziman û edebiyata klasîk û Jean-Paul Sartre ya nûjen ya fransîzan; Goethe ziman û edebiyata klasîk û Heinrich Böll ya nûjen ya almanan; Fîrdewsî ziman û edebiyata klasîk û Sadiq Hîdayet û Ehmed Şamlû ya nûjen ya farîsan tînin bîra merivan.¹

Herwiha hin navên kurdî jî bi ziman û edebiyata kurdî re bûne yek. Bê şik, mezintirîn nav ku bi ziman û edebiyata kurdî ya klasîk re bûye yek, Ehmedê Xanî ye. Ev yeka him ji bo zaravayê kurmançî û him jî ji bo zaravayê soranî rast e.

Lê belê, herçî edebiyata kurdî ya nûjen e, ji ber perçebûna welêt, 1923, riyên zaravayên kurmançî û soranî ji hevûdu vediqetin. Zaravayê kurmançî bêgav dimîne û nikare tevgerên geş yê edebî bîne pê—ji bilî tevgera *Hawarê*.²

Hawar, ji aliyê mîr Celadet Bedirxan dihat weşandin. Celadet Bedirxan serok, pêşeng, plançêker û sernivîskarê kovarê bû. Û navên din yê ve ekolê li doraliyê wî civiyabûn. Lê kesê ku heval, hogir û şagirtê wî bû û pê re dimeşiya, bi her awayî alîkarî li kovarê dikir, Osman Sebrî bû. Osman Sebrî navê duduyan yê ve ekolê bû. Li ser *Hawarê* xebat û weşîna wê, gelek caran, ez bi Osman Sebrî, Rewşen Bedirxan, Cegerxwîn û Hesên Hîşyar re peyivîme. Li gor van xeberdanan, Osman Sebrî him wekî nivîskar, alîgir, rêvebir û him jî, pir caran wekî karker di weşîna kovarê de beşdar bûye.]³

‘there is no friend to fill the place of...’; **bihuştîn** in paradise; **diyarî** *f* gift, memento; **der** *f* place; **hêj** still; **jehr** *f* poison; **diran** *m* tooth; **livîn** to stir; **bê xwedî** godless, damned; **serberdayî** stray.

¹**leheng** champion; **ziman** *m* language; **edebiyat** *f* literature; **ji bervajiyê** conversely; **qala ... kirin** to pronounce; **klasîk** classical; **nûjen** modern; **fransîz** French; **alman** German; **farîs** Persian.

²**herwiha** likewise; **bê şik** doubtless; **zarava** *m* dialect; **perçebûn** *f* fragmentation; **hevûdu** each other; **rû ve-qetîn** to take separate directions; **bêgav** helpless; **tevger** *f* activity; **geş** flourishing; **ji bilî** except for.

³**ji aliyê** by (with passive); **weşandin** to publish; **pêşeng** scout; **plançêker** planner; **sernivîskar** editor; **kovar** *m* journal; **ekol** *f* school; **doralî** *m* surrounding; **civîyan** to gather; **heval** companion; **hogir** *m* intimate friend; **şagirt** *m* apprentice; **meşîyan** to walk; **alîkarî kirin** to help; **weşîn** *f* publication; **peyivîn bi ... re** to talk with; **li gor** according to; **xeberdan** *f* information; **alîgir** helper; **rêvebir** guide; **karker** worker; **beşdar bûn di ... de** to participate in.

KURMANJI KURDISH

Çar Leheng: Leheng I: Ferzende Beg

Di sala 1929-an da şerê Agirî hêdî hêdî berve xurtbûnê diçû. Şervanên kurd li her alî welêt berên xwe didan Agirî û li dora serdarê şoreşê Îhsan Nûrî xwe didan hev. Hingê ji bo parastina sînorê çiyê û gaziyan bi lez siwarî divyabûn û di çiyê da hesp hindik mabûn. Serdar Îhsan Nûrî, Ferzende digel şêst siwarî şande nav eşîrên Serhedan da ku sedek hesp peyda bike, serê her gundê dewlemend hespek an dudu jê dixwestin. Civandina hespan ne karek e ku ji hikûmetê bihata veşartin. Zuka haya hikûmetê jê bû. Serdariya leşkerên tirk yê rojhilat du alayî siwarî şandin pêşiya Ferzende. Herdu alayî ne dûrî hev berî dabûn erdima ku tê da hesp dihatin civandin.¹

Li pêş Geliyê Zilan alayiyek ji wan raste Ferzende hat, lê nexwest bi tena xwe şerî wî bike, ji ber ku dizanîn Ferzende kî ye. Ji lewra dûredûr li pê çû heya alayiya din jî xwe digehîne ser. Lê Ferzende bîra vê yekê dibir û nedixwest herdu alayiyên li ser xwe bigehîne hev. Bê dudilî hespên ku civandibûn sipartin deh siwaran, bi pêncî siwarî dirêjî alayiya tirk kir. Şer bi awakî birûskin dest pê kir. Şervanên kurd bê ku tîfingê biteqîn, li pê bavê Efrasiyab ajotin ser nîveka alayiya dijmin. Devê tîfingên wan bê minet dighan qefsînga neyar, wek colek gurên dev bi xwîn bikeve nav keriyek pez. Turkan ev celeb şer nedîtibûn, nedikarî sînga xwe ji devê tîfingên şehsiwarên kurd biparêzin. Kurdan tîfing dest bi dest berra pîsîra neyar didan. Leşkerên tirk wek pelkên daran di ser piştê hespan de dihatin xarê. Bîstek neborî neyar dest ji ber hev berdan û her yek bi alîkî da revîn.²

¹şer *m* war, battle; Agirî Ağrı, in extreme eastern Turkey; hêdî hêdî little by little; ber ve ... çûn to become; xurt strong, powerful; şervan warrior; berê xwe dan to head for; serdar leader; şoreş *f* revolution; xwe dan hev to unite; parastin (parêz) to defend; sînor *m* border; gazî warrior; bi lez in haste; siwarî bûn to mount; hesp *m* horse; hindik few; eşîr *f* tribe; serhed border; da ku in order that; peyda kirin to find; dewlemend wealthy; xwestin serê ... to request from; civandin to put in motion; hikûmet *f* government; ve-şartin (şer) to hide; zuk obvious; hay *f* attention; serdarî *f* leadership; leşker soldier; tirk Turk(ish); rojhilat east; alayî *f* regiment; ne dûrî hev not far from each other; erdim *f* region.

²geli *m* valley; raste straight toward; bi tena xwe by himself; ji lewra therefore; dûredûr far away; pê behind, backward; xwe gehandine ser (gehandin = gihandin) to arrive; bîra ... birin to take into consideration; dudilî hesitation; sipartin (sipêr) to entrust; bi awakî like; birûsk *f* lightning; tîfing *f* gun; teqandin (teqîn) to shoot

READINGS

Holê keysa dijmin ketibû Ferzende û digel siwarên xwe yê mêrxas da ser pişta wan. Hespên tirkan ne evçend beza bûn, kurd bi hêsanî dighanê û ew di ser pişta hespan da tanîn xar. Saetek neborî, qada şer ji cendekên tirkan hate dagirtin, gelek hesp û tîfing bê xwedî mabûn.¹

Gava alayiya duduyan giha qada şer ji Ferzende û siwarên wî pê va kes nedîtîn. Berî ku leşker li ber xwe binêrin, Ferzende ajote ser wan, wek bazên ku dikevin nav refê qulingan, her ew di ser pişta hespan da tanîn xar. Herwekî destên tirkan girêdayibe bes deng ji tîfingên kurdan dihatin. Ji lewra şer dom nekir, alayiya duduyan jî revî û pişta xwe da kurdan.²

Ji ber ku hespên kurdan westiyabûn û ji hal ketibûn gelekî li pê dijmin neçûn û li qada şer vegefrîn. Pirrtirî dused û pêncî kuştî ji leşkerên tirkan hebû, ji kurdan tenê sê kes birîndar bûbûn û birîna wan sivik bû. Heke gotin û nivîsandina bûyereke holê hêsan be jî bawerkirina wê hinekî dijwar e, lê ev bû, ya ku wê rojê qewimî. Piştî şer qediya Ferzende hesp û tîfingên kuştîyan civandin û berê xwe da hêla Agirî. Piştî vî şerî bi çar pênc rojan herdu alayiyên tirk nedikarî siwarên xwe yê pij û belav buyî bigehînin ser hev. Piştî hatina ser hev û xisara xwe nasînê, fedî kirin ku Ferzende bi pêncî siwarî ew holê şerpeze kirine, qumandanê herdu alayîyan raporek derewîn şandin ji serdariya leşker ra ku eşîrên Geliyê Zîlan tevda alîkariya Ferzende kirine, ji lewra hinde leşker hatin kuştin. Li ser vî raporê bû ku hukumeta tirk heştê gund li Geliyê Zîlan, tevî kal û pîran, jin û zarokan, da şewitandina heştê gundên kurdan.³

(gun); **li pê** in the manner of; **ajotin ser** to attack; **nîvek** *f* half; **dev** *m* mouth; **bê minet** relentlessly; **qefsing** *f* breastbone; **neyar** *m* foe; **col** *m* pack; **gur** wolf; **kerî** *f* flock; **pez** sheep; **celeb** *m* sort, kind; **sing** *f* breast; **şehsiwar** rider, horseman; **tîfing berra ... dan** to aim a gun at; **dest bi dest** continually; **pîsîr** (= *pêstîr*) *f* windpipe; **pelk** leaf; **dar** *f* tree; **hatin xarê** to fall down; **bîstek neborî** it didn't take long before; **revîn** to flee.

¹**holê** thus; **keys** *f* advantage; **mêrxas** gentleman; **dan ser pişta** to pursue; **beza** fast-running; **hêsanî** ease; **qad** *f* field; **cendek** *m* corpse; **da-girtin** to cover; **xwedî** owner.

²**gihan** to arrive at; **baz** hawk; **ref** *m* flock; **quling** crane; **herwekî** (+ subj.) as though; **bes** a lot; **deng** *m* noise; **pişta xwe dan** to turn one's back on.

³**ji hal ketin** to be exhausted; **pirrtirî** more than; **kuştî** slain; **birîndar** wounded; **sivik** slight; **heke** if; **bûyer** *f* event; **qewimîn** to happen; **qediyên** to be finished; **hêl**

KURMANJI KURDISH

Mêraniya Ferzende ne tenê ev bûye, di gelek şeran de mêraniyên holê kirine, lê zanîna me di vî warî da gelekî teng e. Yek jê, di şerekî Agiriyê mezin (1930) da tirkan çepera wî li ser tehtekî nasîn. Nêzîka dused gulleyên tepan berdanê, çeper bi ser hevda hilweşî, Ferzende di ranê xwe da birîn bû. Hevalên wî xwestin hinekî ji çepera hilweşî bi dûrxin, heya hinakî vehêse, lê bavê Efrasiyab qîma xwe bi lavayî û daxwaza wan neanî û got:¹

—Gava rom bizane ku torinekî Hesenî du gavan ji çepera xwe bi şûnda çûye, dê vê yekê ji xwe ra serdestî bizanin. Ez qîma xwe bi mirinê tînim, lê ne bi vê yeka han.

Di cihê xwe da ma heya êvar bû û şer sekinî. Rehma Xwedê lê bit, ew ji pêşengên lehengên Kurdistanê bû ku dirêjîya umrê xwe rev nenasî.²

KURDO HUSÊN

[Nivîsandin jiyana gel e. Neynika bûyeran e, raxistina daxwaziyan e. Pîrr nivîskar, dema dixwazin li ser kurdan binivîsin, jiyana kurdî di pencerek teng de, di kulekek tarî de dibînin, di dan û standina çend gundî û çiyayîyan de dibînin. Ew pêwîst e ku nivîskarên me li ser jiyana gundî û axan biaxivin, lê pêwîstir e ku ew ji bîr nekin ku kurd li şehran jî dijîn, diêşin, mezin dibin. Pêwîst e ku nivîskarê kurd birçiyê zanebûn û nûyînê be, û berhemên çanda navneteweyî bixwîne, nas bike, ji wan fêde bike.³

Hêviya min ji nivîskarên îroj ew e ku ew rêyek nû li ber romana kurdî fireh vekin

f direction; **pij** scattered; **belav bûn** to be dispersed; **xisar** *f* loss; **fedî kirin** to be ashamed; **şerpeze kirin** to devastate; **qumandan** commandant; **rapor** report; **dere-wîn** false; **tevda** altogether; **hinde** (+ sing.) some; **kal** old man; **pîr** old woman; **jin** woman; **zarok** child; **şewitandin (şewitîn)** to burn.

¹**mêranî** *f* bravery; **di vî warî** in that regard; **çeper** *f* barricade, hide-out; **teht** *m* mountain range; **gulleya tepan** mortar fire; **bi ser hevda hil-weşîn** to collapse; **ran** *m* thigh; **bi dûr xistin ji** to drag away from; **ve-hisîn (hês)** to rest; **qîm** *f* satisfaction; **qîma xwe anîn bi** to accede to; **lavayî** pleading; **daxwaz** *f* request.

²**rom** Byzantines, i.e. Ottomans; **torin** grandson; **gav** *f* pace, step; **serdestî** *f* rule; **rehm** *f* mercy; **bit** = *be*; **pêşeng** vanguard; **dirêjî** *f* length; **umr** *m* lifetime; **rev** retreat.

³**gel** *m* nation; **neynik** *f* mirror; **bûyer** *f* event; **kulek** *f* hole; **çiyayî** hillbilly; **axa** agha, chieftain; **birçî** hungry; **çand** *f* culture; **navneteweyî** international; **fêde kirin ji** to benefit from.

READINGS

û kirasekî nû jê re bidirûn. Lê çanda navneteweyî mîna lehiyê ye: her tiştî li ber xwe dibe. Naskirina edeba cîhanî erê pîrr pêwîst e, lê nivîskarê kurd nabe nasnama xwe di nav de wînda bike û dûrî reh û pencên çanda xwe bikeve.]¹

Başoke

Saet nêzîkî dudiyê piştî nîvroje bû û, wê rojê, germa havînê tu gêj kiribûyî. Te pencere vekiribû û ji derve, pêlên bayê hênîk bi şermdarî derbasî hundirê oda te dibûn. Pirraniya mirovên bajêr çûbûn havîna xwe li ber lêvên derî û dengizên başûr derbas kin. Hin ji wan, bi balefîran, ya jî bi gemiyên mezin dûrtir çûbû, çûbûn nav giravên Ferensî, dûr ji germa Parîsê û bêhna benzîna makînan. Lê tu, Siyamendê Xelo, tu girtiyê bajarê Parîsê bûyî, girtiyê xwe bûyî, girtiyê cîhanê bûyî. Te karekî pîsik peyda kiribû û rojên te herdem wekhev derbas dibûn, wekhev bûn. Pirraniya caran, dema karê te tev dibû, tu li kêlekên çemê Sen dîgeriyayî. Te xwe ji bîr dikir û te çemê bajarê xwe tanî bîra xwe, ava wî û gul û sewsenên li kendalên wî. Gelek caran gotina helbestvanê Ferensî yê ji sedsala nozdehan Alfred de Musset dihat bîra te: “Piyala min ne mezin e, lê ez ji piyala xwe vedixom.” Çemê bajarê te mîna Sen ne pîrr fireh û mezin bû û qesir û koşik û balaxane li her dû aliyên wî nebûn. Lê te pîrr ji çemê şehrê xwe hez dikir. Ava çemê te ji nav dilê wan çiyayên bilind derdiket, xwe dida hev, pîrr dibû û di nav xaniyên ji ax û kerpîçan, bi evînî derbas dibû, dûr diçû û di nav gundên dûr re wînda dibû.²

Pencera oda te vekiribû û dilê te girtî bû, teng bû. Çavên te girtî bûn û

¹fireh *kirin* to expand; *kiras m* appearance; *dirûtin (dirû)* to sew; *lehî f* flood; *edeb f* literature; *cîhanî* world (adj.); *reh û penc* root.

²*başoke* falcon; *nîvroje* noon; *germ f* heat; *havîn f* summer; *gêj kirin* to make dizzy; *pencere f* window; *ve-kirin* to open; *derve* outside; *pêl f* wave; *ba m* wind; *hênîk* cool; *bi şermdarî* modestly; *derbasî hundirê ... bûn* to pass into the interior of; *ode f* room; *pirranî f* majority; *derbas kirin* to spend (time); *lêv f* edge; *derî (= derya) f* sea; *dengîz* ocean; *başûr m* south; *balefîr m* airplane; *gemî f* ship; *girav f* island; *bêhn f* stench; *benzîn f* gasoline; *makîne f* car; *girtî* prisoner, imprisoned; *cîhan f* world; *pîsik* nasty; *herdem* always; *wekhev* alike; *dema* when; *kar tev bûn* for things to be going well; *kêlek f* bank; *çem m* river; *Sen* the Seine; *geriyan* to stroll; *av f* water; *gul f* rose; *sewsen* lily; *kendal f* mountain slope; *helbestvan* poet; Alfred de Musset (1810–1857), French poet; *piyale f* glass; *fireh* broad; *qes(i)r f* palace; *koş(i)k f* pavilion; *balaxane f* balcony; *ax f* earth; *kerpîç m* sun-baked brick; *evîn f* love; *wînda bûn* to be lost.

KURMANJI KURDISH

germa dijwar laşê te sist kiribû, te gêj kiribû. Ma hişê te li ku bû dema telefona li ber te, li ser masa te, lê xist?¹

—Siyamend? Tu yî? Dengekî bi zimanê zikmakî pirsî. Dengekî kûr û hênîk. Te lê veğerand?²

—Erê, bira, ez im, ma tu kî yî?

Û dema hevalê te yê biçûkanîyê û zaroktiyê navê xwe hilda, kê mabû ku dila te ji kêfa ji sînga te derkeve, bû mîna çivîkên girtî ku bê berdand di azmanekî bê aso. Dema Cengî navê xwe got û ji te re got li çî îstgahê li hêviya te bû, te germa havîna Parîsê ji bîr kir, te xwe ji bîr kir û bi dengekî bilind te ji hevalê xwe re got:³

—Cengî, di ciyê xwe de bimîn. Ez ê wek gule bêm!

Û bi rastî tu mîna gula ji lûla tufîngê derkeve, tu ji malê derketî û te berê xwe da tirêna di binê erdê de, te berê xwe da “Mêtro.” Te xwest bibî başoke, ew teyrê te pîr jê hez dikir û te xwest bayê dûrbûnê bi baskê xwe biqelêşî.⁴

Deh salên te li şehrê Parîsê derbas bûbûn. Deh sal ji jiyana pîs, ji windabûnê, ji sejtîyê, ji sihitîyê. Te xwe herdem didît mîna qurmê dara mirî, mîna naynika şikestî, mîna pelân kovarek kevin, avêtî di nav gemara bajarê Parîsê yê sar. Mehek sax derbas nebûbû ji hatina te ku hemû xewnên te belav bûbûn, ji hev ketibûn, bûbûn mîna dûmana cixarek li ber bayê xurt.⁵

¹**dil girtin** to feel sad; **dil teng bûn** to be homesick; **girtî** closed; **laş** *m* body; **sist kirin** to debilitate; **hiş** *m* awareness; **ku** where?; **mase** *f* table; **lê xistin** to ring.

²**zikmakî** native, inborn; **kûr** deep; **ve-gerandin li** to reply to.

³**erê** yes; **biçûkanî** *f* childhood; **zaroktî** *f* childhood; **hil-dan** to blurt out; **kêm mabû ku** (+ subj.) almost; **kêf** *f* joy; **sîng** *f* breast; **der-keşin** to leap out; **çivîk** sparrow; **girtî** captured; **ba** (obl *bê*) wind; **ber-dan di** to release into; **azman** *m* sky; **aso** *f* horizon; **îstgah** *f* station; **li hêviya ... bûn** to wait for.

⁴**gule** *f* bullet; **bi rastî** truly; **lûle** *f* barrel; **tufîng** (= *tifîng*) *f* rifle; **tirên** *f* train; **di binê erdê de** underground; **başoke** falcon; **teyr** bird; **dûrbûn** *f* distance; **bask** *m* wing; **qelaştin (qelêş)** to split.

⁵**pîs** bad; **sejtî** *f* filth; **sihî** *f* irritation; **qurm** *m* tree stump; **mirin** to die; **naynik** *f* mirror; **şikestîn** to break; **pel** *m* page; **avêtin (avêj)** to throw away; **gemar** *f* filth; **sar** cold; **sax** whole; **ji hev ketin** to fall apart; **dûman** *f* smoke; **cixar** *f* cigarette;

READINGS

Erê, pîrr tişt hatin guhertin di jiyana te de. Tu nikarî bawer bikî çiqas tişt hatin guhertin. Her tişt hatibû guhertin û qesir û xaniyên xewnên rojan xwe li ber germ û serma wê bêxwediya Parîsê negirtin. Di nava te de, xweliyê şûna avahiyên û xewnên şêrîn girt û mirine, ji rojên pêşî, perda xwe ya reş raxist di nava te de.¹

Deh sal buhurîbûn û te ne gotinek ji hevalê zarokiyê jî negirtibû, ne bihîstibû. Carna te ji xwe dipirsî: Gelo ew jî wek min winda bûye, bêxweda û bêbawerî maye? Di hundirê mêtro de, te ev pirs ji xwe kir, lê pêlên bîraniyan di qahfê serê te de li hev ketin, kefdan û te bersîva wê pirsê neda. Bi rastî te ew pirs ji bîr kir ji ber ku te nedixwest bersîva wê bidaya. Merovên di hundirê mêtro de, li ber çavên te bûn mîna rewrewkê. Gelek caran, te xwe di mêtro de ji bîr dikir û li îstgahin dûr peya dibûyî. Loma, wê rojê, hayê te ji te hebû, te nexwest danîştî û tu jî piyan mayî û çavên te herdem li navên îstgahan man. Deqe bi deqe, tu nêzikî hevalê xwe dibûyî, diketî nava jiyana rast.²

Pîrr bi te nexweş bû ku tu bi tenha xwe, bi serê xwe biçî pêşiya dostê xwe. Te dixwest jinek porzer û laş spî û dagirtî bi te re baya. Te dixwest wê porê xwe yê zêrîn raxistibaya li ser milên te û te ew bi hevalê xwe bida naskirin. Lê mîna kurm, tu rût bûyî, û wê rojê, tu diçûyî pêrgî hevalê xwe, bi tenha xwe û dilê te mişt kelem bû.³

Gelek caran, dema tu û Cengî diwestiyan, hûn li ser kendalên li dora çem rûdiniştin û we ji hev re digot: Dema em dê bighêjin Ewropa, keçên porzer li Ferensa û li Swêdê wê li ser porê me dîn bibin. We digot keç û jinên Ewropî yên porzer û çav şîn yan çav kesk xwe didin kuştin ji bona xortên ji

xurt strong.

¹**bêxwedî** lonely; **xweli** *f* ash; **şûn** *f* place; **avahî** *f* edifice; **girtin** to die down; **perde** *f* curtain; **ra-xistin** to spread.

²**buhurîn** to pass; **bihîstin** to hear; **carna** sometimes; **gelo** I wonder if; **bêxweda** godless; **bêbawerî** unbelieving; **pêl** *f* wave; **bîranî** *f* memory; **qahf** *m* cavern; **kefdan** to foam; **bersîv** *f* answer; **rewrewik** *f* mirage; **peya bûn** to get off; **loma** for that reason; **ji piyan** standing; **deqe bi deqe** any minute now; **rast** real, true.

³**nexweş** displeasing; **porzer** golden-haired; **laş spî** fair-skinned; **dagirtî** well-built; **por** *m* hair; **zêrîn** golden; **mil** *m* shoulder; **dan naskirin** to introduce; **kurm** worm; **rût** naked; **çûn pêrgî** to go to find; **mişt** full of; **kelem** *m* thorn.

KURMANJI KURDISH

Rojhilata Navîn û ji bona sîngên wan yên pîr bi pîrç û mû.¹

Lê Siyamendê Xelo, baweriyên we pîr ji rastiye dûr bûn. Keçên li ser porreşan dîn dibûn dihatin hijmartin le ser her deh tiliyên destan. Tişteki dîn, xort û zîlamên Ewropa jî, wek we, ji jinan hez dikirin, dikenyan, diêşyan, û xwedî jin û zarok bûn. Rast e, Xwedê ji rastiye hez kiriye, rast e te pîr keç peyda kirin, ji ber ku tu pîr bedew bûyî di du-sê salên peşî de, lê yekê ji wan jî nexwest bi te re bimîne, jiyana xwe bi te re saz bike, di bin banekî de, li dora agirekî xwe ji can û dil bide te. Rast e destên te li ser sed bedenî çûn û hatin û tiliyên te pîr sîngên spî givaştin. Rast e car-carna lêvên te yên herdem tî têr dibûn. Lê te çî ji wê windabûnê derxist? Ma tu ne herdem di odakê de yî? Odate mîna koxa mirîşkan, mîna qula rêviyan? Tişte ji ber wan keçan mabû, çend wênên zerbûyî bûn, çend namên evînê û qirkaliyek bi mezinbûna dengizan. Dema te tifa xwe dadiqurtand, devê te herdem zuha dibû, pûç dibû û zimanê te, mîna perçek textê mirî, di devê te de giran bû.²

Tu di hundirê mêtro de bûyî û mijûl dibûyî. Serê te ji bîraniyan giran bû. Te dizanîbû ku Cengî jî, mîna te, tenha bû, ji ber ku ew bi tenha xwe ji Swêdê dihat.

Roja dawî, roja ku te paseportek peyda kir, tu û Cengî hûn ji bajar dûr ketin. We berê xwe da çiyayên bilind. Gotinên we pîr bûn û dilê we mişt bû ji tiştên negotî, lê hûn wê rojê bêdeng man. Baran ketibû û bêhna axa şil û gihayê ter xurt dihat û digihaşt bêvila we. Ava çem jî, wek we, bêdeng bû, wê rojê. We şehr li dû xwe hişt û hûn çûn nêzîkî çiyayên bilind. Hûn li ser keçên porzer û çavşîn û kesk neaxiftin. We dixwest çavên xwe têr bikin ji wan çiyayên şaşik spî, bikevin nav berfa wan. Lê sînor herdem daxwaziyên

¹westiyan to stop; **kendal** *f* slope; **em dê bighêjin** = *emê bigihêjin*; **gihaştin** (**gihêj**) to reach; **wê** = *ê*; **dîn bûn li ser** to be mad for; **ji bona** for; **xort** youth; **bi pîrç û mû** hairy.

²**bawerî** *f* belief; **porreş** black-haired; **hijmartin** to count; **tîlî** *f* finger; **zîlam** guy; **keniyan** to laugh; **bedew** splendid; **jiyana xwe saz kirin** to make a life; **ban** *m* roof; **beden** *m* body; **givaştin** (**givêş**) to squeeze; **lêv** *f* lip; **tî** thirsty; **têr bûn** to be slaked (thirst); **kox** *f* coop; **mirîşk** *f* chicken; **qul** *f* hole; **rêvî** fox; **wêne** *f* picture; **zer bûn** to yellow; **nameya evînê** love letter; **qirkalî** *f* bitter aftertaste; **bi mezinbûna** as vast as; **dengiz** sea; **tîf** *f* spit; **da-qurtandin** to swallow; **dev** *m* mouth; **zuha** dry; **pûç** useless; **ziman** *m* tongue; **perçe** *f* piece; **texte** *m* board; **giran** heavy.

READINGS

we dibirin. Nêrînên we difirîn li ser hesinê tirênê. Leşkerên tirk bi tufing li ber çavên we winda dibûn... Belkî ji ber ku hezkirina te ji wan çiyayên bilind pirr bû ku te pirr ji başokan jî hez dikir. Te herdem dixwest bibî başoke, baskên xwe li hev xî di ezmanekî şîn de û xwe berdî li ser serên wan çiyayên bilind.¹

Tu ji hundirê mêtro derketî. Mêtro wek rehên xwînê, di canê Parîsê de belav dibûn. Tu herdem aciz dibûyî dema tu bi pelikan diketî zikê bajêr. Her carê tu diketî nava zemînê de, te ji xwe re digot: Xwedê, ma ez ê karibim careke din rûyê dinyê bibînim? Ev tirsê han bi serpêhatiya te û bi jiyana nû û dijwar girêdayî bû. Li welatê xwe, dema tu diketî hundirê şikeftan te xwe li ser axa hênik vedizeland, tu diketî zikê dayika xwe. Di teriya şikeftan de, tirs û sawa te winda dibûn. Te çavên xwe digirt û carna jî te gewdê xwe digirt û carna jî te gewdê xwe dida hev, çogên xwe dixist zikê xwe û tu dibûyî mîna zarokê şeş mehî, di zikê dayika xwe de. Nava mêtroya Parîsê, te pirr ditirsand û li ber çavên te dibûn “labîrenta” windabûnê.²

Dema mêtro rawestiya, tu bi pelikan çûyî jor û bêhna te fireh bû dema tu gihaştî rûyê zemînê. Tirên bi rêzê rawestiya bûn û laşên wan yên hesinî û sincirî di bin roka havînê de bêhna mirovan diçikand. Çavên te li hevalê te geriyan û dilê te di sînga te de kir kurpe-kurp. Tirên dihatin û tirên diçûn û însan, di hundirê îstgaha fireh û bêhewa mezin de, mîna xweliyê bûn, mîna bizrê kullî bûn. Te gez li lêva xwe kir û te nedixwest hêsirên çavên te bêne xwar. Lê dema te hevalê xwe dît û tu bi ber de çûyî, du hêsirin mezin, cardî jî, çavên te şil kirin. Çentek biçûk li ber, Cengî li hêviya te bû û çavên wî li çavên te digeriyan.³

¹**mijûl bûn** to be preoccupied; **şil** damp; **gihayê ter** refreshed; **bêvil** *f* nostril; **li dû xwe hiştin** to leave behind; **çavşîn û kesk** blue- and green-eyed; **axiftin li ser** to speak of; **têr kirin** to satiate; **şaşik spî** white-turbaned; **sînor** *m* border; **daxwazî birîn** to block a desire; **nêrîn** *f* view; **firîn** to fly; **hesin** *m* iron; **baskên xwe li hev xistin** to flap one's wings together.

²**reha xwînê** artery; **aciz** helpless; **pelikan** stairs; **zik** *m* belly; **zemîn** *f* earth; **serpêhatî** *f* experience; **ve-zelandin** to stretch out; **terî** *f* bottom; **saw** *f* fear; **çavên xwe girtin** to close the eyes; **gewdê xwe girtin** to hug oneself; **gewdê xwe dan hev** to curl up; **çog** *f* knee; **tirsandin** to frighten.

³**jor** up; **bêhn** (*f*) **fireh bûn** to be out of breath; **rêz** *f* line; **sincirî** flaming; **ro** *f* sun; **roka = royeka**; **bêhn** (*f*) **çikandin** to suffocate; **kurpe-kurp kirin** to thump; **fireh**

KURMANJI KURDISH

Wê rojê dîtina Cengî bû mîna kêra ku tu di birînê de bigerînî. Destê rastê yê Cengî ketibû nav devê makinekê li Swêdê û hatibû birîn. Wê destê yê çepê dirêjî destê te yê rastê kir. Dema te ew hembêz kir û bi herdu destan bedena wî li ser sînga xwe guvaşt, wî destê xwe yê çepê li piştta te xist û hêsirên wî jî bêfedî û bêşermî, hatin xwar, mîna hêsirên te. Hûn bûn du zarokên deh salî û di wê îstgahê de borînî, bi we ket.¹

Û hate bîra te, dema carna tu û Cengî di newalên li dora çem de, li ser kevirên pehn û latên sivik digeriyan û we ew heldibijartin. We bi hiner ew kevir davêtin li ser rûyê ava golan. Latên sivik û şahîtok ji destê we derdiketin û dibûn mîna hehecikên ku, bi firê, nikilên xwe li avê dixistin û bilind dibûn. Pênc, heşt, deh caran ew lat bilind dibûn berî ku giranbûna wan wan bikişîne binê golê. Bi dîlana kevirên pehn li ser rûyê avê, dilê we jî dîlan dikir û bayê welat kenê we û şadiya dilê we li hawîrdora çem belav dikir. Di lîstika xar û kapan de û di avêtina latên sivik li ser rûyê golan de Cengî pirr xurt bû.²

Wê roja ku germa Parîsê te gêj kiribû, û di wê îstgaha fireh de, Cengî destê xwe vedişart, çakêtê xwe avetibû ser milê rastê. Lê, Siyamend, wê rojê te dikir û nedikir, te nikaribû awirên xwe ji destê çakêtê vala dûr bikî.³

Cengî çiqasî di ber dilê te da û ji te re got ku ew hîn bûbû bi destê çepê her tiştî bike, te dizanibû ku birîna wî pirr fireh bû û kula dilê wî ji çûna destekî diwartir bû. Hundirê Cengî jî, wek hundirê te, ji camê bû û ew cam hatibû şikestin, hûrhûrî bûbû.⁴

vast; **bêhewa** airless; **xwelî** ash, dust; **bizir** *m* seed; **kullî** cotton; **gez kirin** to bite; **cardî** once again; **şil kirin** to wet; **çente** *f* suitcase.

¹**kêr** *f* knife; **gerandin (gerîn)** to twist; **birîn** to sever; **dirêjî kirin** to extend; **hembêz kirin** to embrace; **beden** *f* body; **guvaştin (guvêş)** to press; **bêfedî** shameless(ly); **bêşermî** unashamedly; **borînî bi we ket** ‘you could be forgiven.’

²**newal** *f* valley; **kevir** *m* rock; **pehn** flat; **lat** *f* stone; **sivik** light; **hel-bijartin** to select; **hiner** *m* skill; **gol** *f* lake; **şahîtok** gay; **hehecik** swallow; **bi firê** in the open air; **nikil** *m* beak; **bilind bûn** to skip; **giranbûn** *f* weight; **kişandin (kişîn)** to drag; **dîlân** *f* dance; **şadî** *f* happiness; **hawîrdor** *f* surroundings; **lîstik** *f* game; **xar û kapan** name of a game.

³**ve-şartin (şêr)** to hide; **çakêt** *m* jacket; **te dikir û nedikir** try as you might; **awir** *f* glance; **awirên xwe dûr kirin ji** to take one’s eyes off; **vala** empty.

⁴**hîn bûn** to learn; **kul** *f* pain, suffering; **cam** *f* glass; **hûrhûrî** smashed to smith-

READINGS

Wê roja dawîn, tu û Cengî bêdeng bûn. Hûn bê axaftin ketin rehên mêtro. Hûn di zikê bajarê Parîsê de winda bûn. Deriyê mêtro vebû û hûn hatin daqurtandin, mîna pîr mirovên din.

Hûn bêtirî pêncî mitrî di binê zemîna Parîsê de bûn û hûn li ser rêya vegera welat mejûl bûn. Hûn li ser çiyayên bilind û li ser başokan axaftin.¹

ŞAHÎNÊ B. SOREKLÎ

[Di sala 1946'an de ez li gundê Mezrê, başûrê rojavayê Kurdistanê, hatim dinê. Bavê min, M. Elî Soreklî ber destpêkirina şerê cihanî yê duwem ji gundekî Soregê (Sêwreg) hatiye ev beşê welêt. Diya min, Nayla Bozanê Ebrûş, li wir bûye û meriyên wê îroj li her du hêlên xeta hesin bi cîh dibin.²

Ez heft salîn, bê ku bi zimanê erebî bizanibim, ketim xwendegeha bajarê Kobanî. Navê bajêr yê mîrî Eynilereb e. Dû xwendina heşt salan li wir ez çûme bajarê Helebê, li wê derê min xwendina lîsê di sala 1965'an de kuta kir. Di dawiya wê salê de ez bo xwendinê çûm bajarê Vîyen. Ta dawiya sala 1968'an min li bajarên Vienna, Graz û Munşîn zimanê almanî û dûre beşê rêzanî û aboriyê dixwend. Bo sedemên aborî û yên din, ez di dawiya wê salê de hatim Australya û ji wê demê şûn ve min piraniya rojên xwe li bajarê Sydney derbas kirine. Di destpêkê de ez di karê makînistîya trimbêlan de mijûl bûm, dû re min biryar stend ez dîsa vegeyriyam zanîngehê. Di salên xwendinê de ez bi roj diçûm zanîngehê û bi şev di klûban de, yan wek şofêrê taksî dixebitim. Di dawiya sala 1977'an de min xwendina xwe bi şhadayên “bachelor of arts” û “diploma of education” kuta kir. Piraniya qûrsên xwendina min li ser zimanên îngilîzî, almanî, rêzanî û pêdagojîkê bûn. Ji wê demê û vir de ez di kare şîretvaniya hînkirna zimanan û mamosteyetiyê mijûl dibim.³

ereens.

¹**axaftin** (= *axiftin*) to speak; **da-qurtandin** to swallow; **bêtirî** more than; **zemîn** *f* ground; **rê** *f* road; **veger** *f* return.

²**başûr** *m* south; **rojawa** *m* west; **destpêkirin** *f* beginning; **merî** relative; **hêl** *f* side; **xeta hesin** *f* the “Iron Line,” the border between Turkey and Syria; **bi cîh bûn** to live.

³**mîrî** governmental, official; **Eynilereb** ‘Ayn al-‘Arab, a small town just inside Syria south of Sûrtûç; **Heleb** *f* Aleppo; **lîsê** *lycée*, high-school; **kuta kirin** to complete; **Vîyen** Vienna; **Munşî** Munich; **rêzanî** *f* politics; **aborî** *f* economics; **ji wê demê şûn ve** from that time on; **makînistî** *f* mechanics; **trimbêl** *f* automobile; **biryar stendin (stîn)** to make a decision; **dîsa** again; **zanîngeh** *f* university; **klûb** bar; **şhade** *f* degree; **qûrs** course; **şîretvanî** consultation; **hîn-kirin** to teach;

KURMANJI KURDISH

Vegera Mal

“Yadê, bavo ê kengê vegere?” pirsî Azad bi dengê nizim. Te digot belkî ne dixwest kesek din xeyn ji dayka wî pirsê bibihîse. Nazê kir ku wê dengê kurê xwe ne bihîst, lê nihêri û got: “Zû qedeha xwe vala ke, bo ez ji te re dîsa tijî kim. Zû, zû hengê çay sar ne bûye.” Azad dest ne avêt qedehê û ne jî li dayka xwe nihêrî. Ber çend salan, dema ew hê mindalek biçûk bû, wî sê çar qedeh çay li ser xwarina firavînê vedixwarin, lêbelê çaya îroj wek ava dilopan soravîn bû, ne tama xwe tama çayê bû û ne jî şêraniya xwe. Wek rojên kevin şekirê kapikîn jî di tasê de tune bû, bo mirov çêke devê xwê û çayê li dû bir xwe ve ke. “Yadê, bavo ê kengê vegere?” dîsa pirsî Azad ji dayka xwe, ya ku ji dest na hat der carek din guhên xwe der heqê pirsê lawê xwe de ker bihêlê; rabû ser xwe, bervê Azad maşiya, li ber wî danişt, her du destên xwe li dora wî gerandin, ew hembêz kir û bi dengê pir nizim di guhê Azad yê çepê de got: “Azad, min jî bîra bavo kiriye, wek te; an belkî hê bêtir. Ew ê were; îşellah hefta li pêş. Ger na, meha tê ew ê were. Têye bîra te ew çawa şevêkê tevî hevaleyê xwe rakirî û tûrikên şekir û xurman kirin destên te. Ew ê di van rojan de dîsa were; ez dizanim.”¹

Hejmara lêxistina dilê Azad bi bersiva dayka wê re rabû jor û baş hat bîra wî, çawa bavê wî ew di kûraniya şevê de cara berê ji xew rakir. Berf wê demê hê tune bû; dawiya payîzê bû, li derve vîzevîza bê bû. Ew saeta wê şevê wek xewnek şêrîn dihat bîra wî. Hundur xaniyê wan ji dûyê cixaran tijî bûbû. Mirovek zixim, demançe li piştê, tîfing li pêş, ser dawiya doşega wî rûniştibû û bavê wî jî ew kiribû hembêza xwe, radimûsa û tûrikên armûxanan didan wî. Dû rohilat, dema ew ji xew rabû, ji şeva çûnî tenê bîna dûyê

mamosteyefî *f* teaching, pedagogy.

¹**yadê** *f* mamma!; **kengê** when?; **ve-gerîn** to return; **nizim** low; **belkî** maybe; **xeyn** *f* other than; **bihîstîn** (**bihîs**) to hear; **kirin ku** to pretend that; **kur** son; **nihêrîn** *f* to look at; **qedeh** *f* cup; **çay** *f* tea; **dest avêtin** to touch; **hê** still; **mindal** child; **firavîn** *f* midday meal; **lêbelê** but; **dilop** *m* drop; **soravîn** dark red; **tam** *f* taste; **şêrani** *f* sweetness; **kevin** olden; **şekir** *m* sugar; **kapik** bran; **tas** *f* bowl; **xwê** *f* salt; **der heqê** about, concerning; **destên xwe gerandin li dora ...** to put one's arms around; **hembêz kirin** to embrace; **bavo** daddy; **îşellah** God willing; **hefte** *f* week; **ger na** if not; **meha tê** next month; **çawa** how; **ra-kirin** to take away; **tûrik** *m* sack; **xurme** *f* date; **dîsa** again.

READINGS

cixaran di hinder de mabû. Dayka wî tûrikên şekir û xurman buhirî, Nazê, dayka wî, tenbe li wî kiribû.¹

Azad hê di hembêza Nazê de bû, dema dayka wê hat bîra wê. Zarokiya dayka wê jî wek ya Azad derbas bûbû. Kalê Nazê, Heme, di navbera salên 1946 û 48'an de tenê sê caran di nivên şevan de hatibûye mal û dû re şevkê li ser sînor hatibûye kuştin. Çavên Nazê ne dikaribûn êdî hêstiran paş ve vegefinin, yê ku dest pê kirin li ser ruyê Azad bibarin. Kur û dê dilên xwe bi girî honik kirin.²

Mam Reşîd ji bîrê av dikişand. Vê sibê dinê pîr sar bû; bayê şeva buhirî berf li ser erdê işk û luht kiribû. Her roj keça wî Bihar diçû avê, lêbelê îroj Mam Reşîd zû ji xew rabûbû, nimêja sibê kiribû û hatibû ser bîrê avê ji ber qîza xwe ve bikişîne. Rojên Mam Reşîd hemî li vî gundî derbas bûbûn. Di wan de yê xweş jî û yê reş jî hebûn, lê tev hemî kêmasiyan jî, ew ji jiyana xwe razî bû, ta sala buhirî, dema kulfeta wî rojekê nexweş ketibû û dû-sê rojan miribû. Mirina şûşa wî şahiya dilê wî jî bi xwe re kiribû axa gornê û nema êdî kesekî ken li ser lêvên wî dîtibû.³

Ji zaroyên Mam Reşîd tenê Bihar hê bêkar bû. Ewên din hemî xudan kulfet bûn û îroj li şûnên din diman. Lêbelê nuha bûkek wî tev mindalê xwe bi wî û Biharê re li gund rûniştibûn, çiku kurê wî Seyid jî wek mêrê Nazê pêşmerge bû.⁴

¹ **hejmar** *f* number; **lê-xistin** to beat; **kûranî** *f* depth; **berê** first; **ji xew ra-kirin** to rouse from sleep; **payîz** *f* autumn; **vîzevîz** *f* rustling; **ba** (obl *bê*) wind; **saet** *f* hour; **dû** *m* smoke; **zixim** huge; **demaçe** *f* pistol; **doşeg** *f* mattress; **ra-mûsan** to kiss; **tûrik** *m* bag; **armûxan** gift; **dû** after; **rohilat** dawn; **bîn** *f* odor; **buhirîn** to take away; **tenbe** (= *tenbih*) **kirin li** to warn.

² **derbas bûn** to pass, be over; **kal** old man, grandfather; **di navbera** between; **dû re** afterwards; **hêstir** *m* tear; **bariyan** to rain down; **dê** mother; **dilê xwe honik kirin** to soothe the heart; **girî** *f* weeping.

³ **mam** paternal uncle; **bîr** *m* well; **av** (*f*) **kişandin** to draw water; **dinê** (= *dinya*) weather; **erd** *f* ground; **işk** dry; **luht kirin** to leave bare; **keç** daughter; **nimêj** *f* prayer; **qîz** daughter; **hemî** totally; **kêmasî** *f* deficiency; **razi bûn ji** to be satisfied with; **ta** until; **buhirî** last, past; **kulfet** *f* wife; **şûş** sudden; **şahî** *f* joy; **gorn** *f* grave; **nema êdî** no longer; **ken** *m* smile.

⁴ **zaro** child; **bêkar** unmarried; **ewên din** the others; **xudê kulfet** married (of a

KURMANJI KURDISH

Mam Reşîd satila xwe tijî kir, ew li şûnê hişt û hebki wê de çû, li ser keviyek reş rûnişt, tûrikê titûnê ji beriya xwe derxist û dest pê kir cixarekê bipêje. Keleboxa ji satila avê radibû bi kinî bala wî kişand ser xwe, lê dû re her du çavên wî xaniyên gund bo xwe kirin nêşan. Hat bîra wî ku çawa wî û Resûl Mamend, xezûrê Nazê, ber salne pîrr xaniyên xwe di hindir zikê sê heftan de, yek li kêleka yê din lêkirin. Bê ku bixwaze, stûyê wî berva hêla mezêlê gund leviya û çavên wî têkoşiyar ku gora Resûl di nav yên din de bi cih bikin. Dûyê cixarê giran giran di her dû bêvîlên wî re derdiket û xwe di nav bayê sar de wenda dikir. Tama cixarê ji her dem bêtir tal bû di devê wî de û li kêfa wî ne dihat, lê carekê hatibû vexistin û divabû ku were kişandin. Di dilê xwe de Mam Reşîd li pêçandina wê poşman bûbû, çiku wî pîrr caran biryar dabû ku êdî li xurînî cixarê ne kişîne. Waye cixareyek li vala çû, di ev rojên teng de, dema ku tiştên wek titûn û çayê û şekir bûbûn wek dermên.¹

Mam Reşîd kutek din li cixarê xist, ew di bin lingek xwe vemirand, rabû ser xwe, satila avê bi destê rastê rakir û hêdî hêdî ber bi mal meşiya. Valabûna destê çepê di qafê de fikrek peyda kir, ku xwiziya wî satila Nazî jî bi xwe re anî ba, bo tijî av bike. Her der vê sibê gewr spî xuya dikir xeyn ji malan. Serên kaşên li derdora gund ji mij xuya ne dikirin. Xeyn ji dengê segekî tu dengên din ne dihatin guhan, lê dirêj ne kir, dema dengê segekî bû yê duduyan û sisiyan û çaran. Mam Reşîd satil danî û li dora xwe mêze kir. Tiştekan ne dihat xuya kirin ku mirov bibêje ev ê bikaribe bibe sedema ewte ewta kûçikên gund. Hê Mam Reşîd di vê girikê de mijûl bûbû, dema dengê balefiran ji dûr ve ket guhên wî. Wisa, ew tê gihişt çima deng bi segan

man); **şûn** *f* place; **nuha** now; **bûk** daughter-in-law; **çiku** because; **pêşmerge** guerrilla.

¹**satil** *f* bucket; **hebki** (= *hebekî*) a bit; **titûn** *f* tobacco; **berî** *f* pocket; **der-xistin** to take out; **pêjîn** to light (a cigarette); **kelebox** *f* sloshing; **bi kinî** slightly; **bala ... kişandin** to attract the attention of; **nêşan kirin** to focus on; **xezûr** father-in-law; **kêlek** *f* edge; **yek li kêleka yê din** one next to the other; **lê-kirîn** to build; **stû** *m* neck; **hêl** *f* direction; **mezêl** *m* graveyard; **levîn** (= *livîn*) to move; **tê-koşiyar** to make an effort; **gor** *f* grave; **bi cih kirin** to make out; **giran giran** heavily; **bêvîl** nostril; **tal** bitter; **kêf** *f* enjoyment; **vê-xistin** to light; **pêçandin** to roll; **poşman bûn li** to regret; **çiku** because; **li xurînî** before breakfast; **waye** look here, see now; **li vala çûn** to be wasted; **teng** tight; **derman** (obl *dermên*) *m* medicine.

READINGS

ketiye; dîsa dest avêt satilê, ew rakir û meşa xwe domand. Hatina dengê balefiran di van rojan de ne tişteke ecêb bû.¹

Dengê ji ezmên herku diçû bêtir dibû. “Tu caran weha nêzikî gundê me ne kirine” di dilê xwe de digot Mam Reşîd, dema ku gurmîniyek wek dengê tavek meha nîsanê hat guhan, pîrr dirêj ne kir gurmîniyek din wek bêtaran îcar ji hêlek gund hat û erd di bin lingên wî del hizand, satil vê re ji dest xist. Gurmîniya çaran Mam Reşîd li ser qûnê xist, yê ku ber xwe da bo rabe ser xwe û dît çawa xaniyê wî û yê Resûl di hundur dûmanek gewr û reş de winda bûne. Her du çongên wî ketin ber, dîzên wî sist bûn û janek zirav xwe berda kûranîyê dilê wî; ew li ser zik ket xwar û rûyê wî di komikek berf de winda bû.²

Dinê hê sar bû, lê yekî dizanibû ku zivistan êdî mala xwe hêdî hêdî bar dikê ye. Sê hefte û çar roj mabûn ku Newroz xwe bigihîne holê. Şerko, mêrê Nazê, di şeva reş de nêzikî li gund dikir. Îroj ew bi tenê xwe û du hevalên wî li gundek din mabûn û ew ê ber rojhilat dîsa li şûnekê hevûdu bidîtina. Barê Şerko ne sivik bû. Xeyn ji klaşnîkovê malek gullan li piştta wî bû; çar bombeyên destan di tûrikekî de, bi qayîşa wî de hatibûn girêdan û li ser milek wî jî tûrek mezin hebû, yê ku di hindirê xwe de şekir, çayî, şûşak qazaxî û tiştên din yên ku ji qaçaxçiyên hatibûn kirîn, dihewandin. Îro kurê Mam Reşîd jî hin titûn û hûr-mûrên din bo malbata xwe tev Şerko şandibûn.³

¹**ku** xistin to puff; **ve-mirandin** to put out; **meşîyan** to walk; **qaf** *m* head; **fikir** *f* idea; **xwiziya** (= *xwezî*) if only; **gewr spî** grayish white; **kaş** *m* slope; **derdor** *f* environs; **mij** *m* mist; **seg** *m* dog; **sedem** *f* cause; **dirêj kirin** to last long; **gotin** (*bêj*) to say; **ewte ewte** barking; **kûçik** dog; **girik** *m* conundrum; **balefir** *m* airplane; **tê-gihîştin** to understand; **domandin** to continue; **ecêb** strange.

²**ezman** (obl *ezmên*) sky; **herku diçû bêtir dibû** ‘grew louder the closer it came’; **gurmînî** boom; **tav** *f* downpour; **nîsan** *f* April; **bêtar** storm; **del hizandin** to shake violently; **qûn** *f* backside; **dûman** smoke; **çong** *f* knee; **dîz** knee; **sist** weak; **jan** pain; **zirav** thin; **kûranî** *f* depth; **komik** *f* pile.

³**hê** still; **zivistan** *f* winter; **mala xwe bar kirin** to pack up and leave; **hol** *f* view, sight; **mêr** husband; **nêzikî kirin li** to approach; **hevûdu** each other; **bar** *m* load; **klaşnîkov** *f* Kalashnikov rifle; **malek gullan** a cartridge belt; **bombeya destê** hand grenade; **qayîş** *f* belt; **tûr** *m* sack; **şûşe** *f* bottle; **qazaxî** butane; **qaçaxçî** smuggler;

KURMANJI KURDISH

Ev bûbûn nêzîkî pênc mehan ku Şerko û şûya xwe hê pênc deqe ji çavên yê din dîr bihev re derbas ne kiribûn. Dilê wî dikir gupe gup û gavên wî bi lez pêş ve dihatin avêtin. Destên wî yê işk û sar ê bi canê Nazê yê nerm û şêrn germ bibana. Wey hawar, wî çiqas bîra Nazê û Azad kiribû! “Şekir û xurmeyên Azad, ez ê ber ji mal derkevim bidimê” di dilê xwe de digot Şerko. Dû re ew demek din di hundur derd û xeman de winda bû: Ta kengê ê bidomîne ev rewşa xirab; kengê aşîfî ê vegere van dorhêlan; kengê azadî û serbestî ê têkevin şûna sitemkarî û zordariyê...? Dengê segên gund Şerko dîsa hişyar kir, yê ku ji kêfxweşiyê hema hindik mabû bifire. Kişandina cixarek din û ew ê bigihîsta mala xwe, bo xwe têxe binê lihêfê û bedena xwe û ya Nazê bike yek, bo winda bibe di evîna dilan de, bo dîr keve ji derd û kulên dinê... Ew ê dû re qazaxî berde paporê, avê bo çayê bide ser, cixareyek qalind bipêçe, guh bide ser dengê Nazê û ji wê re bipeyive. Dema wan têr şor kirin, ew ê deng li Azad ke, wî di hembêza xwe de bide rûniştandin û ramûse, dîsa ramûse û carek din. Dû re ew ê tûrikên naylon yê tijî şekir û xurme bide wî...¹

Tirseke sivik bi nişka ve ket dilê Şerko, yê ku bi dengê nizim ji xwe pirsî: “Kuro lawo, ka xanî?” Wî baş dizanibû ku wê rê şaş ne kiriye. Wî û segên gund hev naskiribûn û kûçikê Mam Reşîd bi wî re dimeşiya, yan xwe davêt bin lingên wî, wek ku dixwaze haya wî bikişîne ser tiştêkî. Tirs herku çû bêtir bû û tamarên Şerko sist kirin. Bi carekê ve wî dît çawa tirsu nuha daye ser tirsu ji mirinê. Rojek derbas nedibû, bê ku ew û mirinê li çavên hev ne nihêrin, lê tu caran tirsu mirinê tamarên wî wisa sist ne dikirin, ew êdî fêr bûbû wê rewşê. Dema ew gihîşt dara ku bavê wî di roja bûyîna wî de çandibû, tenê komên kevir û xweliyê li şûna xaniyê wî û yê Mam Reşîd

kirîn to buy; **hewandin** to contain; **hûr-mûr** little item; **malbat** *f* family; **şandin** to send.

¹**şû** spouse; **gupe gup kirin** to pound; **gav avêtin** to take a step; **wey oh**; **hawar** cry for help; **derd** pain; **xem** grief; **ta kengê** how long?; **rewş** *f* manner; **xirab** evil; **aşîfî** *f* truce; **dorhêl** *f* environs; **azadî** *f* liberty; **serbestî** *f* freedom; **tê-kevin şûna ...** to take the place of; **sitemkarî** *f* tyranny; **zordarî** *f* oppression; **hişyar kirin** to awaken; **hindik mabû bifire** “little remained that he fly” = he almost flew; **xwe tê-xistin** to throw oneself; **lihêf** *f* quilt; **papor** *f* kerosine cooking stove; **qalind** thick; **peyvîn ji...re** to speak with; **şor kirin** to chat; **deng kirin li** to speak to; **tûrik** *m* bag; **naylon** plastic.

READINGS

xuya dikirin.¹

Pêşmerge pişta xwe da darê û kir ne kir bigirî, lê ne dikaribû. Jan û gurr û şewat û qehra di dilê wî de ne dixwestin xwe têxin hindir hêstiran bo werin der.²

Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê

Nûdem, No. 9 (1994): 282–85.

Cihekî bajarê Mehabadê yê taybetî di dilê me de heye. Ew di nava kurdên her çar perçeyên welêt de tê naskirin û hezkirin û ji bo ku ew di nava nivşe nûhatî û nûgihîştî de neyê jibîrkirin, navê wê li zarokan tê kirin.³

Berî ku ewrekî reş yê şînê bi ser vî bajarê de bigire, di 22'ê çileyê paşin 1946'an de, Xwedê li vî bajarî tê rehmê, ji pişt çiyar rojeke bêhawe xweş bilind dibe, bi germî û tîrêjên xwe zivistana sar û dijwar bi dûr dixê, di şûna wê de bihareke geş tîne. Gava xelkê Mehabadê, ji bo xweamadekirina roja pîroz sibehê zû radibûn ser xwe û çav li wê roja xweş dikevin, dilê wan geş dibe, kêfa wan difûre û ji bo wê roja xweş ya pîroz ji Xwedayê xwe duan dikin. Her ku roj bilind dibe Mehabadî dikevin tevgerê, keçên Mehabadiyan, yên ku bi spehîbûna xwe navdar in, cil û bergên bi reng, bi ser bejnên xwe yên zirav û bilind de berdidin, çavên xwe yên mezin bi kilên Suphanî kil dikin, mîna ku ew ê herin dîlanekê û li wê dîlanê pêrgî hezkiriyên di xeyalên xwe de werin, xwe li ba dikin û bi geşî dadikevin meydana Çarçirayê. Pîr û jin jî cil û bergên xwe yên kevin davêjin, derd, kul, êş û elemên malbat û eşîrê ji bîr dikin, xwe mîna bûkên nûzewicî dixemilînin û bi zar û zêçên xwe, di kuçeyên Mehabadê yên zîvironekî de tevî pêla keçên ciwan dibin u xwe berdidin Meydana Çarçirayê. Xort û peyayên Mehabadî yên bejinbilind, şal û şapikên xwe bi ser bejnên xwe de berdidin, piştên kes,

¹ka where's; **şaş kirin** to be mistaken; **tamar** (= *damar*) nerve; **fêr bûn** to learn; **bûyîn** to be born; **çandin** to plant; **tenê** only; **kom** *f* pile; **kevîr** *m* stone.

²**pişta xwe dan** to lean against; **kir ne kir bigirî** 'he almost wept'; **jan** *f* pain; **gurr** *f* thunder; **şewat** *f* burning; **qehr** *f* wrath; **xwe tê-xistin hindir** to put oneself inside of; **hêstir** (= *hêsir*) tear.

³**cumhûriyet** *f* republic; **taybetî** special; **perçe** *f* part; **nivşe nûhatî û nûgihîştî** the younger generation; **ji bîr kirin** to forget; **nav hatin kirin li** for a name to be given to.

KURMANJI KURDISH

sor u zer li piştên xwe girêdidin, bi coş û heyecan xwe di kuçe û kolanan re berdidin Meydana Çarçirayê. Wê rojê, li Mehabadê tu kes di hunduran de namînin. Meydana Çarçirayê dibe mîna deryayeke bi reng, tevgera mirovan mîna pêlên deryayê dibin. Wê roja xweş, ya ku biharê ji zivistane dizîbû, bajarê Mehabadê kiribû mîna seyrangehekê. Li wê meydana ku gelê kurd hem xweşî hem jî dilêşiyê jiyaye, te ax biavêa li erdê nediket. Ew qerebalixa geş, bi kincên bi reng, bi rûyên bi ken û bi heyecan li benda peyayekî bûn. Ew ê peyayek bihata, ji wan re bipeyiviya û mizgîna azadiya wan bigihanda wan. Wî ê jî wan re behsa girîngiya wê roja pîroz bikira. Û ew peyayê ku ew li bende bûn, di nava çend peyayê din de, bi bejna xwe ya bilind û bi cubeyê xwe yê fireh bi jor ket, çû ber maseyeke dirêj û li pişt masê li ser lingan rawestiya. Ew peya Qadî Mehemed bû. Wî demekê bi dilekî geş çavên xwe li ser wê qerebalixa mirovan gerand, hîsê wî yên neteweyî bilind bûn, kêf û heyecana wî fûriya û bi dengêkî nizim û giran dest bi peyva xwe kir: “Gelê kurd, gelekî serbixwe ye, divê li ser axa xwe, bi azadî bijî, qedera xwe bi xwe tayîn bike, loma îro ez di huzûra we de Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê îlan dikim.”¹

¹**ewr** *m* cloud; **şîn** (= *şwîn*) *f* mourning; **çileyê paşîn** January; **bêhawe** exceptional(ly); **germî** *f* heat; **tîrêj** *f* ray; **zivistan** winter; **dijwar** difficult; **bi dûr xistin** (x-) to drive away; **xelk** *m* people; **xwe amade kirin** to prepare oneself; **roja pîroz** glorious day; **geş** joyful; **fûrîn** to bubble, boil; **ji Xwedayê xwe dua kirin** to pray to one’s God; **tevger** *f* movement; **spehî** beautiful; **navdar bi** renowned for; **cil û berg** clothes; **bejn** *f* stature; **zirav** thin; **kil** *f* collyrium, kohl; **dîlan** *f* wedding feast; **pêrgî ... hatin** to meet; **xeyal** *f* dream; **kevin** old; **avêtin** (avêj) to throw away; **elem** pain; **malbat** *f* family; **eşîre** tribe; **bûk** bride; **nûzewicî** newly-wed; **xemilandin** to adorn; **zar û zêç** household members; **kuçe** lane; **zîvîronekî** twisting; **de tevî** mixed up with; **ciwan** pretty; **xwe ber-dan di...re** to betake oneself to; **meydan** *f* square; **xort** youth; **peya** man; **bejinbilind** tall of stature; **şal** *m* baggy Kurdish trousers; **şapik** *m* short Kurdish jacket; **ços** enthusiasm; **heyecan** excitement; **kolan** *f* street; **derya** *f* sea; **zîn** (zê) to come to life; **seyrangeh** *f* place for an outing; **gel** *m* people, nation; **jiyan** to live; **qerebalix** *f* crowd; **li benda** waiting for; **mizgîn** *f* good news; **gihandin** to deliver; **behsa ... kirin** to discuss; **girîngî** *f* importance; **cube** *m* robe; **mase** *f* table; **çavên xwe gerandin li ser** to look around at; **hîs** *f* feeling; **neteweyî** national; **peyv** *f* speech; **serbixwe** independent; **qeder** *f* destiny; **tayîn kirin** to determine; **huzûr** *f* presence; **cumhûriyet** *f* republic; **îlan kirin** to announce.

READINGS

Pêla mirovan diheje, keç û jin dilflînin, mêr tivingan ber bi hewa ve berdidin. Coşî û geşiyek dikeve nava wan mirovan, bang dikin, diqîrin, destmalên bi reng li ba dikin...¹

Di îlankirina Cumhûriyate Mehabadê de piraniya axa û serokeşîrên kurd jî beşdar dibin. Serok û nûnerên eşîrên mîna; Mehabad, Mameş, Mîngûr, Kevork, Zerza, Herkî, Beyzade, Barzan û hwd...²

Qadî Mehemed zêde napeyive. Ew di wê kurtepeyvandina xwe de ji bilî îlankirina Cumhûriyetê, ji kurdan re behsa yekîfî, hevkarî û miletbûna kurdan dike. Hêviya wan ya çilmisî geş dike. Paşê dadikeve jêr, cubeyê xwe yê fireh ji xwe dike, bi tena unîformayekî Sovyetî û şaşîka xwe ya spî dimîne.³

Lê xelkên Mehabadê wê roja han mîna karnevalekê pîroz dikin, dehol û zurnevanên bajêr lêdixin, Mehabadî jî bi destên hev digirin û direqisin.⁴

Hema piştî îlankirina Cumhûriyetê, di bin serokatiya Qadî Mehemed de serokeşîr û pêşevanên kurdan li hev dicivin û bi alîkariya Sovyetiyên hukûmetekê ava dikin. Qadî Mehemed dibe serokcumhûrê vê hukûmetê û wezîrtî û serokwezîrtî jî di navbera pêşevanên kurd yê din de têne belavkirin.⁵

Cumhûriyeta Mehabadê di dîroka Kurdistanê ya nêzîk de yek ji bûyerên herî girîng e. Civateke feodalî, ku hê nenasê kapîtalîzmê û îndustriyê bû, hêdî hêdî ber bi bajarvanîyê ve gavan diavêje, bi alîkariya Sovyetiyên cumhûriyeteke nûdem pêk tê, ji bo liserlingan mayîna Cumhûriyetê artêşek tê avakirin, lê belê li gorî artêşê welatên dorhêlê artêşeke qels, bi sîlehên sivik

¹ **lîlandin** (**lîlîn**) to ululate; **tiving** (= *tifing*) *f* rifle; **coşî** *f* enthusiasm; **geşî** *f* joy; **bang kirin** to cry out; **qîrîn** to scream; **destmal** *f* handkerchief; **li ba kirin** to throw into the air.

² **piranî** *f* majority; **serok-eşîr** tribal chieftain; **nûner** representative; **hwd** = *her wekî din* etc.

³ **zêde** much; **ji bilî** in addition to; **hevkarî** *f* cooperation; **miletbûn** *f* nationalism; **hêvî** *f* hope; **çilmisî** faded; **da-ketine jêr** to come down; **ji xwe kirin** to take off; **bi tena** only; **unîforma** *m* uniform; **şaşîk** *f* turban.

⁴ **karneval** *f* carnival; **dehol** *f* drum; **zurne** *f* clarion; **zurnevan** clarion player; **lêxistin** to play (an instrument); **bi destên hev girtin** to join hands; **reqîsîn** to dance.

⁵ **hema** immediately; **serokati** *f* leadership; **pêşevan** leader; **civîn** to meet; **alîkarî** *f* help; **hukûmet** *f* government; **ava kirin** to establish; **serokcumhûrê** president; **wezîrtî** *f* ministry; **serokwezîrtî** *f* prime ministry.

KURMANJI KURDISH

ku ji Sovyetê tê şandin. Lê belê dîsan jî, serok û birêvebirên Cumhûriyetê bi enerjî û bawerîyeke xurt ji bo Cumhûriyeta xwe dixebitin, dixwazin ji civaka eşîrtî bi dûr bikevin, elemanên xwe hînî ajotina otomobîlan, hînî şer û xweparastinên modern dikin, ji bo pêşdexistina civaka xwe, xwendevanên xwe ji bo xwendina dibistanên bilind dişînin Sovyetê. Herweha bi çapxaneyê ku Sovyetî dide wan, pê rojnameya xwe ya rojane *Kurdistan*, kovarên mîna *Hawar*, *Agir*, *Hîlale* û hwd. derdixin, pirtûkên dersan yên bi kurdî çap dikin û dibistanên kurdî vedikin. Bi weşandina kovar û rojnameyên bi kurdî bal û meyleke baş ji ziman u edebiyata kurdî re çêdibe, cih bi cih navên hin şaîr û nivîskaran tê bihîstin. Yek ji şaîrên wê demê Hejar e. Hingî mamosta Hejar ji bo marşa Cumhûriyetê bi zaravayê soranî helbestekê dinivîsîne û ew helbest bi alet û awazekî nûjen tê gotin.¹

Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê ji bo hemû kurdan dibe hêviyek, loma Barzanî digel hêzeke xurt ya çekdar berê xwe dide Mehabadê û li wir û der û dora wir bi cih dibe, dixwaze ji avakirina Cumhûriyetê re bibe piştgir û alîkar.²

Digel ku temenê Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê gelekî kurt e jî, dîsan em dibînin ku kurdên me yên ku qet tradisyoneke wan ya dewletbûn an dîplomasiyê tune bû, dîsan ew zû adapte dibin, di wê kurtedemê de gelek danûstandinên dîplomatîk datînin. Lê mixabin ku danûstandinên wan yên dîplomatîk jî di hundurê sînorên Îranê de dimînin. Ji ber ku tiştê em dizanin danûstanên wan bi dinyaya derve re qet çênebûye. Ji xwe ger danûstandinek

¹**dîrok** *f* history; **bûyer** *f* event; **civat** *f* society; **nenas** unfamiliar; **bajarvanî** *f* bourgeoisie; **gavan avêtin ber bi...ve** to take steps toward; **nûdem** modern; **pêk hatin** to come into being; **liserlingan mayîn** to remain standing; **artêş** *f* army; **li gorî** in comparison with; **dorhêl** *f* surroundings; **qels** weak; **sîleh** *m* weapon; **sivik** light; **birêvebir** leader; **bawerî** *f* belief; **xebitîn** to labor; **civak** *f* community; **eşîrtî** tribal; **bi dûr ketin** to cease to exist; **eleman** teacher; **hînî ... kirin** to teach; **ajotin** to drive; **şer** *m* war; **xweparastin** *f* self-defence; **pêşde-xistin** to advance; **xwendevan** literate; **dibistan** *f* school; **çapxane** *f* printing press; **rojname** *f* newspaper; **rojane** daily; **kovar** *f* journal; **pirtûk** *f* book; **ders** *f* lesson; **weşandin** *f* publication; **bal** *f* interest; **meyl** *f* inclination; **çê-bûn** to be created; **hin** some; **şaîr** poet; **nivîskar** writer; **marş** *f* anthem; **zarava** *m* dialect; **helbest** *f* poem; **alet** *m* tool; **awaz** *m* sound; **nûjen** modern.

²**hêz** *f* force; **çekdar** armed; **piştgir** supporter; **alîkar** helper.

READINGS

bi dinyaya derve re hebûya û dinyaya derve an yekîtiya neteweyan Cumhûriyeta wan bipejirandina, ew ê ji bo hilweşandina Cumhûriyeta Mehabadê nebûna alîkar.¹

Kurdên Îranê saleke bi hevî buhurandin û ji bo ku ew jî êdî sermiyanê xwe bûn, wan xwe gelekî serbilind û bi rûmet hîs dikirin. Lê belê hêdî hêdî hêviya wan diqurmiçî, kêf û şahiya wan di qirika wan de dima, her ku diçû cih li wan teng dibû. Li gorî peymanê Îngilîz û Sovyetîyan û li gorî biryara Yekîtiya Neteweyan, diviyabû Sovyet di demeke kurt de ji Îranê derketa. Ji Îranê derketina Sovyetê dibe dawîhatina Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê. Piştî bipaşdevekişandina Sovyetê ya ji Îranê bi demeke kurt, Cumhûriyeta Azerbeycanê hildiweşe û paşê jî Faris berê xwe didine Kurdistanê.²

Qadî Mehemed, birayê wî Sadrî Qadî û pismamê wî Seyfî Qadî, 31'ê adara 1947'an, saet sisê sibehê ji mal têne derxistin û berê wan didine Meydana Çarçirayê. Bajar kerr e, xelkê bajêr di xew de ne, Qadî Mehemed, bira û pismamê xwe li Meydana Çarçirayê, di bédengî û kerrîtiya şevê de, bi sêpiyên cihê cihê ve têne daliqandin. Laşên wan yên pak, ji hemû xerabî û kirêtiyan dûr, di hênkahiya sibeha adarê de li ba dibin. Dawiya çîroka Cumhûriyeta kurdî ya Mehabadê tê.³

FIRAT CEWERÎ

[“Ez di sala 1959 an jî 1960 li gundekî Dêrika Çiyayê Mazî, li Balfisê, li beriya Mêrdînê hatime dinyayê. Di sê çar saliya min de ji ber tunebûna malê dinyayê me mal bar kir Wîranşar. Li wir em du salan man. Paşê bi belavkirina erd ya bi destê

¹**temen** *m* age; **gelekî** very; **kurt** short; **qet** (+ neg.) not at all; **dewletbûn** statehood; **an** or; **adapte bûn** to adapt; **danûstandin** *f* relation; **mixabin** unfortunately; **dinya** *f* world; **derve** outside; **ger** even if; **Yekîtiya Neteweyan** the United Nations; **pejirandin** to accept, recognize; **hil-weşandin** to destroy, to cause to collapse.

²**buhurandin** to spend (time); **sermiyan** head of household; **serbilind** proud; **rûmet** *f* respect; **hîs kirin** to feel; **qurmiçîn** to crumble; **qirik** *f* throat; **peyman** *f* agreement; **biryar** *f* decision; **der-keşîn** to pull out; **bipaşdevekişandin** *f* withdrawal; **hil-weşîn** to collapse; **Faris** Persian.

³**bira** brother; **pismam** cousin; **adar** *f* March; **kerr** silent; **kerrîtî** *f* silence; **sêpî** *f* gallows; **da-liqandin** to hang; **kirêti** *f* defilement; **hênkahî** *f* coolness; **li ba bûn** to go with the wind; **dawî** *f* end; **çîrok** *f* story.

KURMANJI KURDISH

hikûmetê, perçek erd li Balfisê para me jî ket. Em dîsan bi paşde veşeriyên gund û em hûr û gir di nav wî erdî de xebitîn. Û hingî ji ber dîndariya bavê min, min û birayê xwe yê mezin me dest bi xwendina dînî kir. Min ta bi demeke xwendina dînî û ya dibistanê bi hev re meşandin. Di salên 70'î de me mal bar kir Nisêbînê. Piştî wê bi demekê ji bo kar ez çûme Îzmîrê. Çûyîna min ya Îzmîrê bû guhertina jiyana min. Nêrîna welathezî li wir bi min re çêbû. Sala 1977'an ku ez veşeriyam Nisêbînê, mijûliya min bi tenê bû siyaseta. Di 78'an de me di bin navê "Xortên Şoreşger Yê Demokrat" de komeleyek vekir. Ji sala 1978'an û ta destpêka 1980 ez serokê ve komelê bûm. Di 80'yî de ji ber hin sedeman ez ji welêt derketim. Ji wê salê heta bi niha ez li Swêd dijîm."¹

Kêzika Bênav

Piştî rêwîtiyek dirêj ez ji Şamê gihîştim Qamişlokê. Ji bêxewiyê û ji guhertina hewa û xwarinê ez gêj bûbûm. Wê êvarê, her çiqas hin malbatên kurdan nexwestin ez herim hotêlê û bi çûyîna min ya hotêlê dilê xwe girtin jî, dîsa min bi ya xwe kir; ji bo rehetiya xwe û bi fikira ku ezê her roj bikaribim serê xwe bişom, ez çûm hotêlê.²

Qaşo hotel luks bû. Ji xwe gava ku mirov ji derve li avahiya hotêlê dinihêrî, hotel gelekî xweş û luks xuya dikir. Li gora hotêlek Rojhilata Navîn û bajarekî piçûk, ger em paqijiyê deynin aliyekî, hêwana wê jî ne xerab bû. Nizanim çima, lê dibe ji ber ku ez biyanî bûm û xwediyê pasepor-teke Swêdî bûm, ne şagirtên hotêlê, lê xwediyê wê bi xwe bi min re mijûl

¹Mêrdin Mardin; **haîne dinyayê** to be born; **ji ber** on account of; **mal bar kirin** to pack up and move; **Wîranşar** Viranşehir; **paşê** later, then; **belavkirin** *f* distribution; **erd** *m* land; **hikûmet** *f* government; **perçe** *m* piece; **par** *f* share; **ve-geriyan** to return; **hûr û gir xebitîn** to toil; **hingî** then; **dîndarî** *f* religiousness; **dînî** religious; **ta bi demeke** for a while; **dibistan** *f* elementary school; **bi hev re** together; **meşandin** to carry out; **Nisêbîn** Nisibin; **kar** *m* work, job; **Îzmîr** Izmir, Smyrna; **guhertin** to change; **jiyan** *f* life; **nêrîn** *f* thought, idea; **welathezî** *f* patriotism; **çêbûn** to be created; **mijûlî** *f* occupation; **bi tenê** only, solely; **xort** (*m*) youth; **şoreşger** revolutionary; **komele** *f* society; **ve-kirin** to open, to start; **destpêk** *f* beginning; **serok** *m* president; **sedem** *f* reason; **der-keşin** *ji* to leave; **niha** now; **jiyîn (jî)** to live.

²**piştî** after; **rêwîti** *f* journey; **Qamişlok** Qamishli in northeastern Syria; **bêxewî** sleeplessness; **hewa** *f* air; **gêj bûn** to be dizzy; **dilê xwe girtin** *bi* to be put out by, to be insulted by; **bi ya xwe kirin** to do as one wants; **rehetî** *f* comfort; **bi fikira ku** thinking that.

READINGS

dibû.¹

Gava ku mêrik odeya min û nivînê ku ezê tê de razêm, nîşanê min da, galonekî mazotê jî anî û ji min re sobe dada.²

—Swêd sar e; lê şevên biharan welatê me jî sar e, bi ken got, şevbaşî da min û derket.³

Ez demekê wilo bédeng li ser nivînê xwe rûniştim û min çavên xwe li hundirê odê gerand. Ji serşuştin û razanê pêve tu tişt nedihate bîra min. Ji ber ku min zanîbû wê saetê ava germ peyda nabe, di destên min de bi tenê razan mabû. Her çiqas pakbûna nivîna ne bi dilê min bû jî, min kincên xwe jî xwe kir, lampa xwe vemirand û hêdî ketim nava nivînê xwe. Hema ku xilmaş bûm dengê xişxişekê hat min. Bi bihîstina deng re min bi hêz serê xwe li ser bahlifê rakir, guhên xwe miç kirin û li wî dengî guhdarî kir. Îcar ne bi tenê dengê xişxişê, her wisa dengê çîzçîzikê jî hat min. Ez bi xwe jî kurmik û kêzikan ditirsim, an jî ez ji wan zehf acizim, loma ez ji nav nivîna pekiyam û min zû lampe pêxist. Çer ku min lampe pêxist, min dît ku tiştek bi lez ket qelîştoka dîwêr. Demeke dirêj sola min di destê min de bû û ez li benda wî tiştî rawestam. Di wê navberê de jî, ji bo ku ez bê tirs û fikarê bikaribim razêm, min di serê xwe de plana ku ezê çawa û bi çi awayî bikaribim wî benderuhî bikujim, çêdikir. Ez demeke dirêj li benda mam, lê ew derneket. Ez weha westiyabûm, ku êdî nikarîbûm li ser lingan rawestiyama. Min sola di destê xwe de danî û bêî ku lampê vemirînim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir.⁴

¹**qaşo** supposedly; **derve** outside; **avahî** *f* edifice, construction; **xuya kirin** to seem, to appear; **gorî** for, as for; **Rojhilata Navîn** the Middle East; **paqijî** *f* cleanliness; **anîn aliyekî** to put aside; **hêwan** *f* porch; **xerab** bad; **ji ber ku** because; **biyanî** foreign; **xwedî** possessor, owner; **şagirt** *m* apprentice, boy; **bixwe** personally; **mijûl bûn bi...re** to take care of.

²**mêrik** fellow; **oda** *f* room; **nivîn** *m* bed; **ra-zan (zê)** to sleep; **nîşan dîn** to show; **galon** gallon; **mazot** *f* kerosine; **sobe** *f* stove; **da-dîn** to light.

³**Swêd** Sweden; **sar** cold; **şev** *f* night; **bihar** *f* spring; **ken** *m* smile; **şev başî dan** to say good night; **derketin** to leave, to emerge.

⁴**dem** *f* moment; **welê** thus; **bédeng** silent; **rû-niştin** to sit down; **çavên xwe li hundirê ... gerandin** to have a look around the inside of; **ser-şuştin** to wash the hair; **bi tenê** only; **her çiqas** no matter how much; **pakbûn** cleanliness; **bi dilê ... bûn** to be to one's liking; **kinc** *m* clothes; **ji xwe kirin** to take off; **lampe** *f* lamp,

KURMANJI KURDISH

Bi xişxiş û çîzçîzeke din, min dît ku kêzîkek mezin (min tu caran kêzîkên wilo mezin nedîtîbû) ji qelîşteka dîwêr derket û bi dîwêr ve rapelikî. Erê, bawer bikin min kêzîkek wilo qet nedîtîbû. Herdu çavên wê sor, wek du pizotên êgir bûn. Pozê wê reş û deqeke spî lê bû. Serê wê biçûk bû, mîna serê mûriyekê; lingên wê baş nedihatî xuyakirin, lê ji çaran zêdetir bûn. Gava diçû ber zîkê odê rengê wê kesk dibû, ku xwe berdida jêr rangê wê dihat guhartin, sorereş dibû.¹

Min jî xwe li ser nivînê xwe dirêj kiribû, herdu destên xwe xistibûn bin serê xwe û her li wê kêzîkê temaşe dikir. Te digot qey ew bi min re ketibû qayîşê, ez hêrs dikirim. Carinan bi lez bi dîwêr ve radipelikî, diçû ber zîkê odê, demekê li wir radiwestiya, bi çavên xwe yê sor li min mêze dikir, serê xwe çend caran dihejand û dû re bi lez xwe bedida jêr. Na, divabû ew kêzîk wê şevê bihata kuştin, an na xew li min tunebû. Ez dîsa weke berê bi lez ji nav nivîna pekiyam, min rahişt sola xwe ku biavêjimê, lê kêzîkê çivek da xwe û dîsa ket qelîşteka dîwêr. Ta ku ez li ser lingan bûm ew derneket, lê gava min xwe li ser nivîna dirêj kir, ew dîsa derket û dîsa weke berê bi jêr û jorê dîwêr ve çû û hat. “Ya rebî, ezê çi bikim?” min di dilê xwe de got. Tu nabêjî westandinê zora min biribû û hema ez bi wî awayî bi xew ve çûbûm.²

light; **ve-mirandin** to put out; **hêdî hêdî** slowly; **hema ku** as soon as; **xilmaş** sleepy; **deng** *m* sound; **xişxiş** *f* scratching; **bi hêz** forcibly; **bahlîf** *f* pillow; **bilind kirin** to raise; **guhên xwe miç kirin** to prick up one’s ears; **guhdarî kirin li** to listen to; **îcar** now; **ne bi tenê...her wisan** not only...but also; **çîzçîzik** *f* buzz; **kurmîk** *m* worm; **kêzîk** *m* bug; **zehf** extremely, really; **aciz** helpless, unable to cope; **loma** therefore; **pekiyan** to rise up suddenly; **pê-xistin** to turn on; **çer ku** as soon as; **lez** *f* speed; **qelîşte** *f* crack; **dîwar** (obl *dîwêr*) *m* wall; **sol** *f* show; **li bendî** (or *benda*) waiting for; **ra-westan** to get up; **navber** *f* distance; **bê tirs û fikarê** without fear or worry; **pîlan** *f* plan; **çawan** how; **bi çi awayî** by what means; **benderuh** *m* creature; **kuştin (kuj)** to kill; **pîlan çêkirin** to make a plan; **êdî** (+ neg.) no longer; **li ser lingan** on one’s feet; **danîn** (= *da-anîn*) to put down; **bêyî ku** without; **xwe dirêj kirin** to stretch out.

¹**tu caran** never; **wilo** so; **ra-pelikîn** to crawl; **bawer kirin** to believe; **qe** at all, ever; **sor** red; **pizot** *m* brand, torch; **agir** (obl *êgir*) *m* fire; **poz** *m* nose; **reş** black; **deq** *f* spot; **spî** white; **mîna** like (prep.); **mûrî** *f* ant; **ling** *m* leg; **zêdetir** more; **çawa ku** when; **zîkê odê** ceiling; **kesk** green; **xwe ber-dan jêr** to put oneself under; **sorereş** reddish black.

²**temaşe kirin li** to look at, watch; **qayîş** *f* rivalry, competition; **hêrs kirin** to

READINGS

Min xewnek ecêb di xew de didît. Di şerekî nenas de, hevalên min hemû şehîd ketibûn. Ez jî birîndar bûbûm û di nava xwînê de vedigevizîm. Bi wê birîna xwe ya xedar, bi rik û hêrseke ecêb min xwe ji ber dijmin dida alî û ez bi çiyê ve radipelikîm. Ji bo ku xwe nedim dest û şopê ji ser xwe winda bikim min xwe davêt şikeftê. Şikeft teng û tarî bû. Di wê şikefta teng û tarî de, ji nişkê ve mareki stûr û bi quloç êrîş tanî min. Demeke dirêj min û mêr li ber hev dida. Geh wî li min dixist ez bi çend gavan bi paş de dipengizandim, geh min lê dixist ew bi çend gavan bi şûn de dişand.¹

Dawî dawî min bi hêz destek lê xist û ez bi êşeke giran ji xew şiyar bûm. Gava ez rabûm, ez di xwêdanê de mabûm. Her du çongên min dihejyan û xureke ecêb laşê min girtibû. Min kir û nekir çavê min yê çepê venebû. Gava ku min di destê xwe danî ser, min hîs kir ku wek hêkekê werimiye û tiştê pêve zeliqiye. Min ew tişt bi neynûkan da alî û bi çavê rastê wa baş lê nihêrî; min dît ku kêzika min e.²

Ez hingê têgihiştim ku min di xew de destê xwe li ser çavê xwe xistiye û ji berdêla kuştina mêr, min kêzik kuştîye.

Ji wê rojê pê ve ez neçûm hotêlê û heya bi hefteyekê bi zor werimandina

enrage; **carinan** sometimes; **ra-pelikîn** to creep; **hejandin** to shake; **dûv** *m* tail; **an na** or else; **wek berê** as before; **ra-hiştin** to pick up; **avêtin (avêj)** to throw; **çiv dan xwe** to zigzag; **cardin** once more; **ya rebî** O Lord!; **zor** *f* strength; **zor birin** to sap the strength; **hema** right away; **bi xew ve çûn** to go to sleep.

¹**xewn-dîtin** to have a dream; **ecêb** strange; **xem** *f* worry, anxiety; **şer** *f* war, battle; **nenas** unknown; **heval** *m* friend; **hemû** all; **şehîd ketin** to fall as a martyr; **birîndar** wounded; **xwîn** *f* blood; **ve-gevizîn** to wallow; **birîn** *f* wound; **xedar** terrible; **rik** *f* anger; **xwe dan alî ji ber** to hurl oneself against; **dijmin** enemy; **rapelikîn** to crawl; **xwe dan dest** to let oneself be captured; **şop** *f* track, trail; **şopê ji ser xwe winda kirin** to throw a pursuer off track; **şikeft** *f* cave; **teng** narrow; **tarî** dark; **ji nişkê ve** suddenly; **mar** (obl *mêr*) *m* snake; **stûr** thick; **quloç** *m* league; **êrîş anîn** to attack; **li ber hev dan** to tangle; **geh...geh** now...again; **xistin li** to hit; **gav** *m* step; **bi paş de** back; **pengizandin** to make jump; **şûnde** backwards; **şandin** to send.

²**dawî dawî** finally; **êş** *f* pain; **giran** heavy; **ji xew şiyar bûn** to wake up; **xwêdan** *f* sweating; **çong** *f* knee; **hejyan** to quake; **xur** *f* itch; **laş** *m* body; **min kir û nekir** no matter what I did; **hîs kirin** to feel; **hêk** *f* egg; **werimîn** to swell; **zeliqîn bi...ve** to be stuck to; **neynûk** *f* fingernail; **nihêrîn li** to look at.

KURMANJI KURDISH

çavê min daket.¹

Lê navê kêzikê ji min re bû mereq. Min ji kîjan xelkê Qamişlokê, gundiyan der û dora Qamişlokê, kurdên Şam û Helebê pirsî û kêzik ji wan re terfî kir, her gotin:

— Xeyo, weleh em nizanin.²

Li Mala Rewşen Bedir-Xan

Kurdistan Press, 1987

Piştî rêwîtiyeke dirêj, ez berdestê êvarê, li Baniyê, ji otobusê peya bûm. Baniyê bajarekî xweş e, bi a min yek ji bajarên Sûriyê yê herî xweş e. Bajar li kêleka deryayê hatiye avakirin. Bi awira pêşî piraniya bajarvaniyan dewlemend dixuyin. Dibe ku jî mirov dewlemendiya wan di lixwekirin û otomobîlên wan de dibîne. Herçiqaq rûniştvanên bajêr ereb jî bin, dîsan mirov peyayên bi çefî û egal û jinên sernuxumandî kêm dibîne. Li vî bajarê Sûriyê yê nûjen, xanimeke kurd dima. Keça Salih Begê, dotmam û kevaniya Celadet Begê... Kaxeza navnîşana vê Xatûna han di destê min de bû û yê ku ez pêrgî wan dibûm, min navnîşana wê ji wan dipirsî. Gotineke pêşiyên me heye, dibêje “Mirov bi pirsê dihere Xursê”. Ez jî bi pirsê gihîştim ber avahiyekê, hebeki li ber deriyê avahiyê rawestiyam û min hêdî bi heyecan li derî da. Ya ku ji min re derî vekir berdestka wê bû. Jinekê bi tirkîyeke osmanî, lê bi devoka çerkezana bixêrhatinî da min, çenteyê min ji destê min girt û ez birim odeya rûniştinê, ba Rewşen Xanimê. Rewşen Xanimê jî bi mêvanperweriyeke kurdî û bi rûyekî bi ken bixêrhatinî da min û ez bi cih kirim.³

¹ji **berdêla** instead of; **heya bi** until; **hefte** *f* week; **werimandin** *f* swelling; **da-
ketin** to subside.

²**navê kêzikê ji min re bû mereq** ‘I was curious about the name of the bug’; **kîjan** whichever, no matter which; **xelk** *m* people; **der û dor** *f* environs; **Heleb** *f* Aleppo; **terfî kirin** to describe; **xeyo** (Arabic *khayyo*) a typically Syrian form of address, ‘fellow, friend’; **weleh** by God!

³**rêwîti** *f* journey; **berdestê** toward; **bi a** in the opinion of; **kêlek** *f* edge; **awir** *f* glance; **bi awira pêşî** at first glance; **piranî** *f* majority; **bajarvanî** citizen; **dewle-
mend** wealthy; **xuyîn** to appear, seem; **li xwe kirin** to dress; **rûniştvan** inhabitant; **çefî** *f* kafiyya, Arab headdress; **egal** the rope that holds the kafiyya on the head; **ser-**

READINGS

Ez jî bi dilşahî rûniştim. Piştî kurtesohbetekê min çavên xwe li resimên li dîwêr gerandin. Resimên ku pêşî li ber çavên min ketin, resimê hersê biran; Sureya, Celadet û Kamûran Bedir-Xan bûn.¹

Piştî şîva êvarê min ji Rewşen Xanimê pirsî:

—*Gelo tu ê bikaribî bi niyeta kurtehevpeyvînekê xwe bidî naskirin?*²

—Ez keça Salih Bedir-Xan û jina Celadet Alî Bedir-Xan im, got û jê pê ve tu tişt negot.

Ji xwe bes e jî. Kurdên ku navên Salih û Celadet Bedir-Xan nebihîstibin pir kêr in. An jî kurdên xwende û bîrewer yên ku haya wan ji Celadet û xebatên wî tunebin, çî bigire nîn in.³

—*Ê baş e, xebat û xwendina Rewşen Xanimê bi xwe çî ye û çî bû?*

—Weke kar, min mamostetîya zimanê erebî dikir û ez demekê jî midûrê dibistanê bûm. Erebiya min ji kurdî û turkiya min çêtir bû û çêtir e jî. Ji ber vê yekê xebatên min yên rewşenbîrî jî bêtir bi zimanê erebî dibû. Min bêtir bi erebî dinivîsand û ji zimanên din werdigerande erebi. Min pirtûkên jî bi navê “Hin Rûpel Ji Edebiyata Kurdî” bi erebî, berpêşî xwendevanên ereb kiriye. Min carna jî hin bend di *Hawarê* de belav dikirin.⁴

Gava ew bi kurdî dipeyvî wê hin zehmetî dikişand, ew carna di nav re bi min re bi tirkî dipeyvî; bi tirkîyeke pir xweş û bê kêmasî...⁵

nuxumandin (= *nixumandin*) to cover the head; **dotmam** cousin; **kevanî** wife; **kaxez** *f* paper; **navnîşan** *f* address; **pêrgî ... bûn** to meet; **Xurs** Khurasan; **avahî** *f* building; **hebekî** for a while; **li derê dan** to knock on a door; **berdestik** servant; **tirkî** Turkish; **osmanî** Ottoman; **devok** *f* accent; **çerkez** Circassian; **bixêrhatinî dan** to welcome; **çente** *f* suitcase; **odeya rûniştinê** sitting room; **mêvanperwerî** *f* hospitality; **bi cih kirin** to have s.o. sit down.

¹**dilşahî** *f* pleasure; **kurtesohbet** *f* chat; **resim** *m* picture.

²**şîv** *f* dinner; **gelo** I wonder if; **niyet** *f* intention; **kurtehevpeyvîn** *f* short interview; **xwe dan naskirin** to introduce oneself.

³**xwende** literate; **bîrewer** intellectual; **an jî** or rather; **hay (f) ji** knowledge of; **çî bigire nîn in** ‘are practically nil.’

⁴**mamostetî** *f* teaching; **midûr** principal; **çêtir** better; **ji ber vê yekê** for that reason; **rewşenbîrî** intellectual; **wer-gerandin** to translate; **rûpel** *m* page; **berpêşî kirin** to offer; **bend** *f* article.

⁵**zehmet (f) kişandin** to have trouble; **bê kêmasî** flawless.

KURMANJI KURDISH

—Niha jî ez vê pirtûka han werdigerînim erebî. (Pirtûkek li ser Sultan Evdilhemîd bû).

—*Ji bo çi ev pirtûk û ne yeke din?*

—Weşanxaneyekê ev ji min xwestiye, bêtir vê bala wan kişandiyê. Tu ya rastî bixwazî, bi wergerandina vê pirtûkê çend quruş pere jî digihîjin destên min.¹

Bivê nevē sohbeta me carna diçû dema rehmetî Celadet Beg û kovara Hawarê.

—*Yadê, tu dikarî ji kerema xwe re bi kurtî behsa dema Hawarê bikî? Hawar li ku u çawan derdiket, yê zîrek ku tê de kar dikirin kî bûn?*²

—Çapxaneya Hawarê li mal bû. Yek ji mijûliyên rehmetî yê sereke derxistina Hawarê bû. Min jî alîkariya wî dikir. Piştî demekê, gava ez hînî rêzkirin û ambelajê bû, kar hêsantir bû. Hingî Osman Sebrî û Qedrîcan jî li ba me diman, herdu jî pir jêhatî bûn. Dû re Îbrahîm hebû, ew bi rastî jî rewşenbîr bû. Osman Sebrî çar mehan li cem me mabû, hîn jî min nizanîbû ku ew Osman Sebrî ye. Wan Osman Sebrî, bi Hecî Husên bi min dabûne naskirin.³

—*Hin kes dibêjin ku kovara Hawarê bi alîkariya fransîzan derdiket, ma rast e?*

—Na, ne rast e. Hawar ne bi alîkariya fransîzan, lê bi destûra wan derdiket. Ne bi tenê Hawar, her wisa Roja Nû jî bi destûra wan derdiket.⁴

—*Gelo ku îro fransîz li vir bûna, wê rewşa kurdan çawan bûya?*

—Wê rewşa kurdan her wilo bûya. Fransîz jî kolonyalîst in û yê ku em îro di bin destên wan jî de ne kolonyalîst in.

—*Ma rast e ku armanca Celadet Beg avakirina Kurdistaneke monarşî*

¹**weşanxane** *f* publishing house; **bêir** more; **bal** (*f*) **kişandin** to attract the attention; **quruş** piastre; **pere** money.

²**bivê nevē** like it or not; **rehmetî** the late; **yadê** “mother,” an affectionate term of address for an elderly woman; **kerem** *f* generosity; **zîrek** hard-working; **kî** who?

³**rêz-kirin** to sort; **ambelaj** *f* packaging; **hêsan** easy; **li ba** in the house of, with; **jêhatî** diligent; **li cem** with; **X bi Y bi Z dan naskirin** to introduce X to Z as Y.

⁴**destûr** *f* permission.

READINGS

*bû?*¹

—Kî vê bibêjin ew bêbextiya li rehetî dikan. Wî tu caran tiştêkî wilo ne gotiye, ne jî daxwaz kiriye. Wî her digot, divê Kurdistan bi destê hemû kurdan bête ava kirin. Çi karker, çi gundî, çi mele, çi axa û beg hemû xwe-diyê Kurdistanê ne. Armanca rehetî Kurdistanek demokratîk û yekbûyî bû. Ji xwe Kurdistan yek e. A niha jî hin xort dibêjin em ji Kurdistana Tirkiyê, hin dibêjin em ji Kurdistana Îranê, hin dibêjin em ji Kurdistana Iraqê û hin jî dibêjin em ji Kurdistana Sûriyê ne. Bi a min ev ne rast e, şaş e. Kurdistan yek e û sînorên ku li Kurdistanê hatine kişandin ji derveyî îrada kurdan hatiye kişandin. Ew sînorên emperyalîzmê ne.²

—*Ew Celadetê ku îro ji aliyê hemû kurdan ve tete hezkirin, gelo ji Rewşen Xanimê re çawan bû?*

—Ew ne bi tenê mêrê min, lê ew her tiştê min bû. Ew bavê min, birayê min, hevalê min, mamostayê min bû. Ez jî yek ji wan kurda me ku îro kêmasiya tunebûna wî dikişînim.

—*Windabûna vî peyayê bi rûmet çi tesîr li jiyana te kir, ev trajedî çawan çê bû?*

—Mirana wî ez mehû kirim, dinya bi ser min de hilşand. Mesûliyetêke siyasî, civakî û aborî di stûyê min de hişt. Ji xwe dawîhatina jiyana wî ya bi trajedî jî, ji bo başkirin û hebekî bipêşdexistina aboriya xwe bû. Lê nebû, ew kar bû sedema mirina wî.³

—*Çi bû ya ku bû sedema mirina wî?*

—Tacirî, pembo... Em gelekî destteng bûbûn. Ji ber vê yekê rehetî rabû zeviyên hevalekî xwe bi nivî çand, kire pembo. Ji ber kêmbûna avê, wî dest bi kolandina bîrekê kir u navê bîra xwe jî kire “Bîra Qederê”. Ew di wê bîra xwe wer bû û mir. Wî bîra xwe bi destê xwe kola.⁴

Piştî van gotinan Rewşen Xanimê demekê bêdeng ma, kûr kûr fikirî û

¹**armanc** *f* aim, goal; **ava-kirin** to establish; **monarşî** monarchical.

²**bêbextî** *f* disloyalty; **daxwaz kirin** to desire; **şaş** mistaken; **îrade** *f* will.

³**bi rûmet** honored; **tesîr** *f* effect; **mehû kirin** to wipe out; **mesûliyet** *f* responsibility;

⁴**tacirî** *f* commerce; **pembo** *m* cotton; **destteng** poor; **bi nivî** in equal shares; **çandin** to plant; **kolandin** to dig; **wer bûn di** to fall into; **kolan** to dig.

KURMANJI KURDISH

cigarek vêxist. Wilo xuya bû ku wê hê jî ew bûyer ji bîr nekiribû. Min jî nexwest ez zêde bi dû sedemên ku çima “wî bîra xwe bi destên xwe kola” bikevim, min gotin dagerande ser tiştêkî din:¹

—Çi ji xortên kurd yên li Ewrûpayê dikeve serê te? Ew dikarin çi bikin?

—Ger ew bibin yek, ew dikarin her tiştî bikin. Yekîti, divê hûn yekîtiyekê di nava xwe de çêbikin. A niha bi dehan kovar û rojname derdikevin, çira? Ma ger hûn werin ba hev û sê-çar kovar û rojnameyên bi kalîte derxin, ne çêtir e?

Heya ku ez li ba wê bûm, wê ji min re got, got û got. Destê min ji vê mirova gotinxweş, zarşêrîn, zana û rewşenbîr nedibû. Di mêvandarîyê kurt de wê ez hînî pir tiştan kirim, dîrokek ji min re got...²

Sedsaliya Celadet Alî Bedir-Xan

Nûdem, No. 8, 1993

Di 26'ê nîsana 1893'an de, yanî berî niha bi sed salî mizgînî digihîje Emîn Alî Bedir-Xan, ku jê re lawikek çêbûye. Emîn Alî Beg bi vê mizgînî û nûçeya han kêfxweş û dilşa dibe, pêlên evîna dilê wî ya li hemberî jina wî ya çerkez xurt û gur dibin û navê vî zarokê nûçêbûyî dike Celadet, Celadetê biçûk, zarok û neviyê Bedir-Xaniyan, ji dinyayê bêhay, ji sirgun û zehmetiyên jiyane bêxeber mezin dibe; zarokê esmer, xwînşêrîn, bîaqil û qedirgir jê derdikeve. Rewşa vî zarokî malbatê kêfxweş dike, bîaqilî û giraniya wî dilê bavê wî Emîn Alî Beg fireh dike, hêvî û bawerîyê xurt dide malbat û merivên wî. Bavê wî yê xwende û dinyadîtî, ji bo ku lawê wî yê çeleng li Stenbolê di nava çerxa asîmîlasyonê de asîmîle nebe, ji kultur û zimanê xwe, ji stran û çîrokên xwe yên kurdî bi dûr nekeve û mîna kurdekî xwenas bigihê, ew ji welatê xwe, ji kevnebjarekî kultur û medeniyetê, ji Cizîra Botan, dengbêj û stranbêjên kurd tîne Stenbolê û Celadatê biçûk û jîr bi stran û çîrokên kurdî, bi hest û hîsên kurdî mezin dike. Celadet car caran naveroka

¹**kûr kûr fikirîn** to be lost in thought; **keşîn be dû** to go after; **gotin da-gerandin** to change the subject.

²**yekîti** *f* unity; **bi kalîte** quality (adj); **destê min ji ... nedibû** ‘I couldn’t get enough of’; **gotinxweş** well-spoken; **zarşêrîn** eloquent; **zana** learned; **mêvandarî** *f* visit; **dîrok** *f* history.

READINGS

stran û çîrokên xwe ji hevalên xwe yê çerkez, ermen, yunan û tirk re dibêje, bi wî temenê xwe yê biçûk kultura xwe bi wan dide naskirin, bal û meyla wan dikişîne ser kultur û zimanê xwe.¹

Celadet di xortaniya xwe de hewesa xwe berdide ser eskeriyê, dixwaze di dibistaneke eskerî de bibe xwedî rutbe û nîşanan û di ordiya Osmanî de têkeve cepheyên. Celadetê ku wê paşê xwe bi hemû hêza xwe ve biavêje meydana kultur û ziman û bibe humanîstekî bêhempa, ji bo çî eskerî bala wî dikişîne û ji bo çî ew dixwaze têkeve dibistana herbiyê, dê u bawî bi xwe jî pê nizanin. Heta tê gotin ku ew biryara wî bê dilê dê û bavê wî bûye. Lê wî biryara xwe dabû, wî ê bixwenda. Wî biryara xwe bi cih anî, kete dibistana herbiyê, dibistana xwe bi serfirazî qedand û bû zabitekî jîr û jêhatî. Celadetê Zabit di dema şerê cîhanê ê yekemîn de, di ordiya Osmanî de dikeve cephe û ji sînoren Tirkîya îro bi dîr dikeve, dihere Qefqasyayê û li Baku û Tebrîzê dimîne. Lê ordiya wan zêde li ber rûsan xwe nagire û ew împaratoriya ku ji Qefqasyayê bigire heta welatên Balkan bi sedsalan hukumdarî kiribu, hêdî hêdî ji hev de dikeve, ordiyên wê cih bi cih dişikên û ew împaratoriya ku bi sedsalan jiyana xwe domandibû, êdî dimire. Hem împaratoriya Osmaniyan dimire, hem jî tu nemabû ku Tirkîyeya îro jî ji navê rabûya. Lê di bin serokatîya Mustafa Kemal û bi alîkarî û piştgiriya kurdan, şerê bi gotina tirkî “xelasiyê” tê dayin u welat ji bin destê bi gotina tirkî “dagirkeran” derdikeve, piştî kongreyên Erzerom û Sîwasê bingehê Cumhûriyeta îro têtê avêtin û ew roj ev roj e îdeolojiya avakirê cumhûriyetê Mustafa Kemal “Kemalizm” dibe mîna vîrusekê û dikeve laş û mêjiyên bawermendê vê îdeolojiyê. Digel ku ew heftê sal in di ser avakirina Cumhûriyetê re derbas bûye jî, hê jî vê nexweşiya han re tu derman nehatiye dîtin, serê bijîşk û opera-

¹**sedsalî** *f* centennial; **nîsan** *f* April; **yanî** i.e.; **mizgîn** *f* good news; **lawik** baby boy; **çê-bûn** to be born; **nûçe** *f* news; **kêfxweş** happy; **dilşa** glad; **li hemberî** toward; **çerkez** Circassian; **gur** powerful; **nevî** grandson; **bêhay ji** unaware of; **sirgun** exile; **zehrmetî** *f* trouble; **bêxeber ji** oblivious to; **esmer** dark-skinned; **xwînsêrîn** delightful; **biaqil** intelligent; **qedirgir** estimable; **giranî** *f* gravity; **dil fireh kirin** to delight; **xwende** literate; **dinyadîtî** experienced; **law** son; **çeleng** handsome; **Stenbol** *f* Istanbul; **çerx** *f* circle; **asîmilasyon** *f* assimilation; **asîmile** assimilated; **kultur** culture; **stran** *f* song; **çîrok** *f* story; **xwenas** self-aware; **kevnebjâr** *m* ancient city; **medeniye** *f* civilization; **dengbêj** singer; **stranbêj** professional singer; **jîr** talented; **hest** *f* feeling; **hîs** *f* emotion; **navero** *f* contents; **çerkez** Circassian; **ermen** Armenian; **yunan** Greek; **temen** *m* age; **bal û meyl** (*f*) **kişandin** to draw the attention.

KURMANJI KURDISH

torên ku xwestine vê vîrusê bikujin, an çareyekê ji vê nexweşiyê re bibînin, hatiye jêkirin u ev heftê sal in ku gelê kurd ji derdê vê nexweşiya han dinale.¹

Celadet Beg û beşek ji malbata xwe li dijî neheqiyên sîstemê derdikevin û dixwazin ji bo kurdan, ji bo nasnav û welatê wan têkoşînê bidin. Cum-hûriyeta ciwan nikarîbû ev debar bikira, bi rê û metodên nemirovane çûn ser vê malbata bermayên mîrekên Cizîra Botan û gelek ji wan êşandin, kuştin, ji welêt bi dûr xistin, sirgûnî welatên xerîbiyê kirin. Di nava yên sirgûnbûyî de Celadet Bedir-Xan û malbata xwe jî hebûn. Stenkarî û sirgûna kambax ev malbata esilzade û zexim ji hev de dixist, berê wan bi welatên xerîbiyê vedikir. Bavê Celadet Emîn Ali Beg û birayê wî yê mezin Sureya Beg xwe diavêjin welatê xwediyê medeniyetên kevnar Misrê, Celadet û kekê xwe Kamûran Beg jî berê xwe didine Almanayê. Ev mirovên bi disiplîn û xwedî berpirsyar li Almanayê nabin hêsîrên jiyana sirgûnê û tîk naçin, lê bi jîrî dest bi xwendina unîversîteyê dikin, di dersên xwe de gelekî bi serketî dibin û zû xwe dixin çavên mamosteyên xwe û ji bo kurdan dibin mînakên çak û qene. Celadet Beg ji derveyî dersê xwe yê dibistanê jî gelek berhemên cihê cihê dixwîne, li ser tevger, nêrîn û felsefeyê cihê cihê radiweste. Mîna gelek ronakbîrên wê demê ew jî gelekî ji Nietzsche hez dike, cih bi cih di bin tesîra felsefeya wî de dimîne û pirtûka wî ya bi navê “Zerdeşt Wilo Kerem Kir” ji ber serê xwe hilnayne û bi xwe jî dibîne ku ev filosofê Alman yê mezin bê çiqasî di bin tesîra felsefeya pêxember Zerdeşt de dimîne. Piştî wê bi salên dirêj ew ê beşekî biçûk ji pirtûka Nietzsche di *Hawara* xwe de biweşîne û bi wî awayî Nietzsche bi bîr bîne.²

¹**xortanî** *f* youth; **hewes** *f* desire; **eskerî** *f* the military; **rutbe** rank; **nîşan** decoration; **ordû** *f* army; **cephê** front; **bêhampa** unparalleled; **herbiye** *f* war department; **serfirazî** *f* distinction; **zabit** officer; **jîr** hard-working; **jêhatî** assiduous; **Qefqasya** *f* the Caucasus; **rûs** Russian; **împeratorî** *f* empire; **hukumdarî kirin** to rule; **ji navê ra-bûn** to disappear; **piştgirî** *f* support; **xelasî** *f* deliverance; **dayîn = dan**; **şer dan (dayîn)** to fight a war; **şerê bi gotina tirkan “xelasîyê”** the war of what Turks call “liberation”; **dagirker** founder; **Erzerom** Erzerum; **Sîwas** Sivas; **bawermend** believer; **bijîşk** physician; **operator** surgeon; **jê-bûn** to be excised; **nalîn** to lament.

²**li dijî** against; **neheqî** injustice; **sîstem** *f* system; **nasnav** *m* culture; **têkoşîn** *f* struggle; **debar kirin** to manage; **nemirovane** unmanly; **bermaye** *f* remnant; **mîrek** petty ruler; **sirgûn kirin** to exile; **kambax** devastating; **esilzade** aristocratic; **zexim**

READINGS

Lê her hişê wî li ser welatê wî ye, her liv û tevgereke ku li welatê wî çêdibe dilê wî şa dike, hêviya wi xurt û qewîn dike. Gava di sala 1925'an de di bin serokatiya Şêx Seîd de li Kurdistanê serhildan çêdibe, hêviyên Celadet Beg xurt dibin, ji bo biserketina şoreşê tiştê ji destê wî tê ew dike. Lê pir naçe, artêşa tirk bi ser serhildanê de digire, serok û birêvebirên serhildanê digirin, bi rê û metodên nemirovane li nava kuçe û kolanên gund û bajarên Kurdistanê gulebaran dikin. Gund û bajarên jî wêran dikin û heta gorî ku carinan kal û pîrên kurdan niha behs dikin, heçê navê wan bi tîpa “Ş” dest pê dike, ew têne kuştin. Gava ordiya tirk ji Kurdistanê vedikişe, li dû xwe gundên wêran, xaniyên xerabe û di nava şewat û dixanê de zarokên sêwî u stûxwar dihêle. Ev bûyera han tesîreke neyînî li Celadet Beg dike, hêviya wî dişikîne, demekê destê wî li kar û xebata siyasî sist dike...¹

Serhildana Şêx Seîd şikest, ew birayên ku bi tirkan re ji bo xelasiya Tirkiyeyê şerê “xelasiyê” kiribûn, ji aliyê birayên xwe yên tirk û musulman ve hatin gulebarankirin, gundên wan hatin wêrankirin, daristanên wan hatin şewatandin. Ev hemû ji bîra Celadet Beg naçin. Ew bi wan bîranînan radizê, bi wan radibe. Gav û saet ew di bîra wî de ne. Ew li riyekê digere. Li riya xelasî û serbixwebûnê. Li riya felatê... Ew bi wî serê xwe yê tijî fikrên têvel berê xwe dide Libnanê, diçe Bêrûdê. Li Bêrûdê kurd gihane hev. An jî rewşa kambax, stemkarî, jiyana sirgûnê ew anîne ba hev. Wan di nava xwe de komeleyek bi navê “Xoybûnê” ava kirine û ew dixwazin tola xwîna şehîdên xwe wergerin, welatê xwe yê ji dest çûye bi paş de bistînin û ji wê jiyana zehmet ya welatên xerîbiyê rizgar bibin, li ser axa welatê xwe bi azadî û xweşî bijîn. Celadet Beg tavilê xwe digihîne vê komeleyê û dibe

strong; **kevnar** ancient; **Mîsr** *f* Egypt; **kek** elder brother; **Almanya** *f* Germany; **berpirsyar** responsible; **hêsîr** captive; **têk çûn** to fail; **bi serketî** successful; **mînak** example; **çak** good; **û qene** at least; **berhem** *m* literary work; **cihê cihê** various; **tevger** *f* activity; **nêrîn** *f* view; **felsefe** *f* philosophy; **ronakbîr** enlightened; **kerem kirin** to speak; **filosof** philosopher.

¹**liv** *f* movement; **dil şa kirin** to gladden the heart; **qewîn** strong; **serhildan** *f* rebellion; **biserketin** *f* success; **pir naçe** “it doesn’t take long before”; **bi ser serhildanê girtin** to put down a rebellion; **gulebaran kirin** to open fire; **wêran kirin** to lay waste; **heçê** whoever; **tîp** *f* letter; **ve-kişîn** to withdraw; **şewat** *f* conflagration; **dixan** *f* smoke; **sêwî** orphan; **stûxwar** cowed; **li dû xwe hiştin (hêl)** to leave behind oneself; **neyînî** negative; **sist kirin** to weaken.

KURMANJI KURDISH

yek ji endamên wê yê girîng. Hîn wilo sal dibe 1927 û di bin serokatiya Îhsan Nûrî Paşa de, li Agiriyê kurd radîbin ser xwe û dixwazin biyaniyan ji welatê xwe biqewirînin. Ev serhildana ku li çiyayê Agiriyê diqewime bi alîkarî û piştgiriya Xoybûnê dibe. Komeleya Xoybûnê tawilê li hev dicivin; axa, serokeşîr, pêşengên civatê li hev dicivînin û dixwazin serhildanê berfireh bikin. Ew xeberê digihînin serokatiya serhildanê û bi wan didin zanîn ku ew ê ji milê Sûriyê de li tirkên bixin û bi wî awayî serhildanê fireh bikin û bikin berxwedaneke Kurdistanê. Lê tirk bi artêşeke xurt, bi tanq û top û balafiran digirin ser Agiriyê û çî benderuh dikeve ber wan, ew dikujin. Serokê serhildanê Îhsan Nûrî Paşa xwe dide alî, diçe Îranê û piştî bi salan di nava tenêtiyê û bêdengiyê de, bi hesreta welêt çavên xwe digirin û ji vê dinyayê koç dike.¹

Ev şikandina han jî dilê Celadet Beg bêhawe dişikîne, heta tê gotin ku piştî wê bawerîya wî bi siyaseta sist dibe, ew xwe bi hemû hêza xwe davêje meydana kultur, ziman û edebiyata kurdî. Ew dibîne ku piştî şikestina serhildanê û liberxwedanên kurdan, kurd ji aliyê moral ve jî dişikên û ji tirsê karbidestên Cumhûriyeta Tirkiyeyê ew ji ziman û kultura xwe bi dûr dikevin, dibin biyaniyên xwe. Ew têdigihîje ku piştî nifşekî du nifşan dê gelek kurd asîmîle bibin, ji xwe û ji nasnava xwe bi dûr bikevin û dê bi wî awayî navê kurd û Kurdistanê ji ferheng û nexşeyên cîhanê bête maliştin. Ji bo ku ew pêşî li vê yeka han bigire, ew tawilê dest diavêje alfabeya xwe, ya ku wî di salên 1919'an de nivîci hiştibû û wê li ser hîmê alfabe-yên latînî durust û têkûz dike. Ji bo ku ew bikaribe alfabeya xwe di nava kurdan de belav bike, zimanê kurdî yê nivîskî bi wan bide zanîn, ew biryara derxistina kovarekê dide û navê kovara xwe dike HAWAR. Ew hejmara pêşî ya Hawarê di panzdehê gulana 1932'de derdixe. Di pêşgotina hejmara pêşî ya kovarê de,

¹**daristan** *f* forest; **bîranîn** *f* memory; **razân (razê)** to go to sleep; **serbixwebûn** *f* independence; **felat** *f* freedom; **têvel** various; **Bêrûd** *f* Beirut; **komele** *f* society; **xoybûn** *f* selfhood; **tol (f) wer-girtin** to take revenge; **xwîn** *f* blood; **şehîd** martyr; **bi paş de standin (stîn)** to get back; **rizgar bûn ji** to be delivered from; **tawilê** at once; **endam** member; **girîng** important; **hîn** still; **biyanî** foreigner; **qewirandin (qewirîn)** to drive out; **qewimîn** to take place; **li hev civîn** to move together; **berfireh kirin** to expand; **mil** *m* side; **berxwedan** *f* resistance; **tanq** *f* tank; **top** *f* cannon; **çî benderuh** like wild animals; **xwe dan alî** to retreat; **tenêti** *f* isolation; **bêdengî** *f* silence; **hesret** *f* yearning; **dinya** *f* world; **koç kirin** to decamp.

READINGS

di derheqa armanca kovarê de wilo dibêje: “*Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berê her tiştê heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyînê a pêşîn e.*”¹

Ew wî zimanê ku li ber mirinê ye jîndar dike, dixê warê nivîsandinê û bi wê yekê şerta heyîna kurdan a pêşî diyar dike.²

Ji bo ku kovara wî di çarçoveyê teng de nemîne, nebe malê grûp, partî, an jî bi tenê îdeolojiyê, lê belê ew bibe malê hemû kurdan, dengê hemû kurdan, ew dîsan di pêşgotina hejmara pêşî ya Hawarê de weha dibêje: “*Hawar ji niha û pê ve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîtî pê bendewar e, dê mijûl dibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê. Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl dibin. Em jî di warê ziman, hiner û sinhetê de dê bixebitin.*”³

Û ew li ser ya xwe dimîne. Ew mîna ronakbîrê kurd, bi her tiştê ku hemû kurdan eleqeder dike ve mijûl dibe, lê xwe tenê bi nêrînekê, an jî bi îdeolojiyê ve girê nade, heta dawîya jiyana xwe, ew Kurdistanî dimîne. Lê ez bawer dikim gava ew dibêje ku ew ê bi siyasetê ve mijûl nebe, ne ku ew ji rastiya Kurdistanê direve, hebe tune be, ew naxwaze xwe bi rêxistinê ve girê bide. Ger wî bi hemû awayî destê xwe ji siyasetê bikişanda, wî ê hewcedariya ku ew nameyê dirêj ji Mustefa Kemal Atatürk re bişîne, nedîta. Erê, ew di sala 1933’an de, yanî piştî weşandina kovara xwe bi salekê û piştî avakirina Cumhûriyeta Tirkîyê bi deh salan di bin navê “*Ji Reîsî Cumhûrê Tirkîyê Xazî Mustefa Kemal Paşa re Nameyê Vekirî*” nameyê dirêj dişîne. Ew wê nameya xwe bi munasebeta bîranîna deh-

¹**bêhawe** unparalleled; **meydan** *f* field; **liberxwedan** = *berxwedan*; **karbidest** authority; **nifş** generation; **nasnav** *f* culture; **ferheng** *f* dictionary; **nexşe** *f* map; **cîhan** *f* world; **malîştin (mal)** to rub out; **alfabe** *f* alphabet; **durust kirin** to make; **têkûz kirin** to arrange; **nivîskî** written; **gulan** *f* May; **armanc** *f* aim; **heyîn** *f* existence; **şert** *f* condition; **a** = *ya*.

²**li ber** on the verge of; **jîndar kirin** to revivify; **war** *m* arena; **diyar kirin** to make clear.

³**çarçove** *f* framework; **pêşgotin** *f* preface; **ji niha û pê ve** from now on; **kurdanî** *f* Kurdishness; **kurdîtî** *f* Kurdishness; **bendewar bi** connected to; **tinê** (= *tenê*) only; **êxistin (êx)** = *xistin*; **civat** *f* social group; **bila...dibin** ‘it’s all right if they are’; **hiner** *m* art; **sinhet** *f* craft.

KURMANJI KURDISH

saliya Cumhûriyetê û efûya giştî, ku Cumhûriyetê soz dabû, dişîne. Celadet Beg di vê nameya xwe ya dirêj de, ku paşê mîna pirtûkekê çap dibe, bi ilmî rexneyan li Mustafa Kemal digire û wan ji bo sozdayina wan derewîn derdixîne. Herweha ew di nameya xwe de li ser kurdan, li ser nasyonalîzma tirkan radiweste û bi metodên lîngwîstîk mînakan ji zimanê kurdî dide. Ew di wir de dide xuya kirin, ku kurd ne tirk in û ew xwediyên kultureke cihê, zimanekî cihê û miletekî cihê ne.¹

Em vegehin ser Hawarê. Dema ku Celadet Beg dest bi weşandina Hawarê û belavkirina alfabeya xwe dike, hejmara kurdên xwende kêr e, çî bigire tune ye. Lê, çend xortên din ên serwextî, ku ew jî ji ber gelek sedeman mec-bûr mabûn, ku welatê xwe terk bikin û koçî binxetê bikin, digihên Celadet Beg û bi alîkarî û teşwîqên Celadet ew dibin xwediyên navên mîna Qedrîcan, Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Cegerxwîn...

Gava min di hevpeyvîneke bi Osman Sebrî re, pirs ku wî “kengî dest bi nivîsandinê kiriye” kiribû, wî gotibû ku wî bi xêra Celadet Beg dest bi nivîsandina kurdî kiribû û ku ne ji Celadet Beg bûya, wî nizanîbû ku zimanê kurdî zimanê nivîsandinê ye an na. Herweha Nûredînê xort jî deyndarê Celadet Bedir-Xan e. Tê gotin ku her tim Celadet Beg Nûredînê xort dipesinand û ji bo teşwîqkirina nivîsandinê ew beramberî Anton Çexov dikir.²

Çexov bi xwe jî di dema xwe de xort dipesinandin, ew teşwîqê nivîsandinê dikirin û gelek caran bi wan dida zanîn ku ew ê bi nivîsandina berde-wam bibin nivîskarên mezin û navdar. Mirov wê nefsbîçûkahî û ruhiyeta teşwîqê di Celadet Bedir-Xan de jî xweş dibîne. Ji bilî navên mîna Qedrîcan, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza û Cegerxwîn; ger zarokê, şivanekî an jî xwendevanekî jê re nameyek bişanda, wî tavilê ew name di Hawarê de di-

¹**eleqeder kirin** to concern; **Kurdistanî** Kurdistanian, proponent of a united Kurdistan; **rêxistin** *f* organization; **hewcedarî** *f* necessity, need; **reîsî cumhûrê** president of the republic; **xazî** ghazi; **munasebet** *f* occasion; **bîranîn** *f* remembrance; **efûya giştî** general amnesty; **soz dan** to promise; **rexne** *f* criticism; **sozdayin** *f* promise; **derewîn** false; **der-xistin** to take to task; **mînak** *m* example; **cihê** different, separate; **milet** *m* nation.

²**serwext** knowledgeable; **hevpeyvîn** *f* conversation; **pirs** (*f*) **kirin** to ask a question; **bi xêra** thanks to; **ne ji ... bûya** were it not for; **deyndar** indebted; **her tim** always; **pesinandin** to praise; **teşwîqkirin** *f* encouragement; **beramberî ... kirin** to compare to; **Anton Çexov** Anton Chekhov.

READINGS

weşand, pesnê wan dida û ew jî mîna nivîskarên Hawarê dinavandin.¹

Em dibînin, ji roja ku Celadet biryara xwe daye ku ew ê bi ziman û kultura kurdî dakeve, ew pê dadikeve, bi xebat û fedekariyên xwe yên şexsî ji me re bingehê zimanê me yê ku biyaniyê nivîsandinê bû dihêle.²

Wek me li jor jî qal kiribû, gava Celadet Beg dest bi weşandina kovara xwe dike, hejmara kurdên xwende kême, ji xwe hejmara kurdên ku bikaribin bi kurdî bixwîne tune ye. Lê ew yeka han wî bêhêvî nake. Tunebûna xwendevanan wî dîlşikestî nake û destê wî li karê wî sist nake. Wî xwe bi xwe digot: “Ger xwendevanên kurdî tunebin sedemê wê hene.” Sedemên wê xuyabûn. Kurdistan serbixwe nebûbû, erdên Kurdistanê yên rizgarkirî tunebûn, zimanê kurdî nebûbû zimanê nivîsandin û perwerdiyê. Rastiya welêt û rastiya miletê wî ji wî ve xuya bû. Loma wî pir bi sebir, lê bi enerjîyeke bêhawe dixwest ku zimanê kurdî têxe warê nivîsandinê û bi wê yekê kurdan bike xwedî nasnav û şexsiyete.³

Di sala 1987’an de gava ez li mala xanima wî Rewşen Bedir-Xan bûbûm mêvan û min pirsra ku Celadet Beg çawan Hawar derdixist, jê kiribû, wê ev bersiva han dabû min: “Şev û roj li rehetî tune bûn. Gav û saet kaxezin di dest de bûn, dixwend, rast dikir, diçirand, dîsan ji nû ve dinivîsand. Hawara wî mîna zarokeke wî bû. Her ku hejmareke nû ya kovarê derdiket, ew mîna zarokekê dilşa dibû. Lê hemû bar di stûyê wî de bû. Ew gelekê pê re diwestiya. Di mehên destpêkê de ez nikaribûm jê re bibûma alîkar, lê paşê gava ez hînî rêzkirin û ambelajê bûm, min karê wî hebekî hêsan kir.”⁴

Ez baş bi tîraja Hawarê nizanim, lê tiştê ku Rewşen Xanimê ji min re behs kir, wê tîraja wê ne ewçend bilind be, wê li dor çend sed libî be.

¹**berdewam** constant; **nefsbiçûkahî** *f* modesty; **ruhiyet** *f* spirit; **şivan** shepherd; **pesin** *m* praise; **navandin** to name, call.

²**fedekarî** *f* self-sacrifice; **şexsî** personal; **bingeh** (*m*) **hiştin** (**hêl**) to lay a foundation; **biyaniyê** a stranger to.

³**li jor** above; **qal kirin** to say; **bêhêvî kirin** to make despair; **dîlşikestî kirin** to discourage; **rizgarkirî** liberated; **perwerdî** *f* education; **rastî** *f* truth; **bi sebir** patiently; **bêhawe** extraordinary; **tê-xistî warê** to establish as an area of; **şexsiyet** *f* personality.

⁴**mêvan** guest; **gav û saet** at all times; **kaxez** *f* paper; **rast kirin** to correct; **çirandin** to tear up; **stû** *m* neck; **hînî ... bûn** to learn; **rêz kirin** to arrange; **ambelaj** *f* packaging; **hebekî** a little bit.

KURMANJI KURDISH

Piraniya wê li nava kurdên binxetê, yanî kurdên Sûriyê dihate belav kirin, çend lib digihîştin Tirkîyeyê, çend lib digihîştin Iraqê û ez ne şaş bim çend lib jî digihîştin Îranê. Lê ew çend libên ku digihîştin wan welatan jî li hemû hezkirên zimanê kurdî belav dibûn. Ji ber vê yekê ye ku em di kovarê de li gelek navên kurdên başûr rast tên. Yanî kovar di nava kurdên her welatî de bûbû pireya hevdunasînê. Di kovarê de mirov ji bilî kurmancî li zaravayê soranî jî, lê bi alfabeya latînî rast tê. Wilo xuya dibe ku di wê demê de bi fermî destûra zimanê kurdî li wan welatan hatibûya dayin û hejmara kovar û rojnameyên kurdî zêdetir bûya, em ê îro ji problema alfabeyên erebî û latînî xelas bûbûna û wê mîna ku di Hawarê de jî belav bûbû, hem kurmanciya jêr, hem jî kurmanciya jor bi alfabeya latînî bihata nivîsandin û wê ferqiyeta herdu zaravayên kurdî yên mezin hêdî hêdî hindiktir bibûya. Wek tê zanîn, Hawar li welatekî ku alfabeya erebî dihate bikaranîn, bi alfabeya latînî derdiket. Em wê tesîra Hawarê û xwediye wê Mîr Celadet Alî Bedir-Xan îro jî dibînin. Îro di nava kurdên me yên Sûriyê de yên ku kurdî bi alfabeya erebî dinivîsînin, çî bigire tune ye. Digel xwendina wan bi erebî ye, digel ku ew di dibistanan de hînî alfabe û nivîsandina erebî dibin jî, dîsan ew xwe hînî alfabeya zimanê xwe ya latînî dikin u îro bi sedan nivîskar, bi çendan kovar û pirtûkên kurdî ji aliyê kurdên me yên Sûriyê ve têne derxistin. Ev yeka han bivê nevē jî tradisyona Celadet Bedir-Xan û bi xêra kovara wî Hawarê dibe.¹

Û tiştê ku Celadet Bedir-Xan jê ditirsiya, bi serê kurdê Tirkîyeyê ve hatiye. Piştî şikandina serîhildan û berxwedanên kurdan, tirk bi metodin ji mirovatiyê dûr çûne ser kurdan, ew êşandin, girtin, bi dar ve kirin, zimanê wan li wan qedexe kirin û dema ku Celadet Beg kovara xwe li Şamê derdixist, ji bo her gotineke kurdî li Tirkîyeyê cezayê peran dihate dayin, ji cezayê peran zêdetir, pirê caran cezayên bi salan heps dihate dayin. Piştî nivîşkî, kurd di ber çerxa polîtîkaya asîmîlasyonê ya tirkan de heliyan, ji zimanê xwe bi dûr ketin. Ger car caran di hin cihan de çirûskin pêketibin jî,

¹tîraj *f* print run; **behs kirin** to discuss; **lib** *m* copy; **binxet** *f* south of the border, i.e. Syria; **şaş bûn** to be surprised; **rast hatin li** to come across; **hevdu-nasîn** to know each other; **ji bilî** aside from; **fermî** formal; **destûra ziman** grammar; **jêr** lower; **jor** upper; **ferqiyet** *f* distinction; **çî bigire** practically.

READINGS

dewlet bi xurtî çûye ser wan, bi girtin, lêdan û îşkencê dengê wan birîne.¹

Em dibînin ku ew tesîra han ji ruhiyeta Kurdên Tirkiyeyê derneketiye, şoreşger û têkoşerê kurd, ku di ber Kurdîstana pîroz de serê xwe didin, ji bo bidestxistina zimane kurdî bi salan di zîndanên de radizên, lê ew bi xwe hewl nadin ku bi zimane xwe binivîsînin, bi zimanê xwe bixwînin, bi zimanê xwe bifikirin. Ez carinan ji xwe re difikirim, ku em kurd tenê mehekê tirkî protesto bikin (di vir de mexseda min ne ew e ku divê em li dijî tirkî bin, ez bawer im tirkên bi rastî dilxwazên kurdan jî wê li dijî biryareke wilo dernekevin) kovar û rojnameyê xwe bi kurdî derxin, kovar û rojnameyê bi tirkî nekirin, li dikan û çayxanên xwe bi kurdî bipeyivin, li mehkemeyan bi kurdî îfadeyên xwe bidin, yanî bi kurtayî di her warê jiyane de bi kurdî bipeyivin û bi kurdî binivîsînin. Erê, tenê mehekê. Ez bawer im bi cihanîna biryareke wilo jî wê ne ewçend zehmet be. Hingî em ê bibînin ku wê çawan cih li dewletê teng bibe, dinyaya ku pîrsa me bi terorîzmê ve girê dide, wê çawan li bin guhên hev bikeve. Gava ez van çend rêzan dinivîsînim, ez di bin tesîra tevgera Mahatma Gandî de dinivîsînim. Gandî ji xelkê Hindîstanê daxwaz kir, ku ew kincên îngilîzan li xwe nekin, tiştên wan nekirin. Û xelkê wilo kir. Bi wê biryara hindîyan gelek fabrîkayên îngilîzan çûne îflasê, darbeyeke mezin ya ekonomîk li îngilîzan ket û biryareke wilo bû sedema dawîhatina împaratoriya Birîtanya ya li Hindîstanê.²

Lê îngilîzan zimanê hindîyan qedexa nekiribûn. Ger îngilîzan ziman û nasnava hindîyan qedexa bikirana, mirov texmîn dike, ku dê Gandî li hemberî bûyereke wilo, xelkê hindî vexwenda protestokirina zimanê îngilîzî.³

Bi a min biryareke wilo ji bo me çekeke mezin e. Bi biryareke wilo hem em ê bikaribin hebûna xwe bidine îspatkirin, hem em ê bikaribin hebûna zimanê xwe bidine îspatkirin, hem em ê mehkeme û daîreyên resmî yê tir-

¹tirsiyan ji to be afraid of; mirovatî f manliness, chivalry; qedexe kirin to ban; ceza m penalty; peran heavy; heps f imprisonment; nivş generation; çerx f grindstone; polîtîka f policy; heliyan to melt away; çirûsk f spark; pê-keşin to catch (fire); lê-dan to beat; îşkence f torture; deng (m) birîn to silence.

²şoreşger revolutionary; têkoşer combatant; zîndan prison; hewl dan to struggle; protesto kirin to boycott; mexsed f intention; dikan f shop; mehkeme f court; îfade f testimony; rêz f line; çûne îflas to go broke; darbe f blow; dawî-hatîn to come to an end; împaratorî f empire.

³texmîn kirin to guess; li hemberî in opposition to; ve-xwendin to call for.

KURMANJI KURDISH

kan mecbûrî wergeêran bikin, hem em ê tîraja kovar û rojnameyên tirkan li Kurdistanê û li Tirkiyeyê bixînin, hem jî em ê dawîanîna polîtîkayeke ku heftê sal in li ser înkariya milletê me hatiye avakirin, bînin.¹

NÛREDÎN ZAZA

[Dr. Nûredîn Zaza, navê wî yê rast Yûsuf e. Ew di 1919'an de li Madenê (Paxir-maden) hatiye dinê û roja 7'ê Çiriya Pêşî sala 1988'an, saet di 6.30 de li nexweşxaneyêke Lozanê, ji ber nexweşîna qanserê çavên xwe ji dinya jîndar girtine. Piştî dilovaniya vî rewşenbîrê hêja, bi daxwaziya malbata wî û bi beşdarbûna gelek heval û hogirên wî yên perwer, roja 11'an, eynî meh, laşê wî bi merasîmeke şîndar birine û sipartine Goristana Şehîdan ya li Lozanê.²

Nivîskarê bi nav û deng Dr. Nûredîn Zaza, zaroktiya xwe li Kurdistana Bakûr bihurandiye. Ew, piştî rûxandina agirê Şoreşa kurd ya bi serokatiya Şêx Seîd, bi kekê xwe Dr. Nefiz re çûye Binxetê (Sûrî). Hêj di çaxê xortaniya xwe de, wî ciyê xwe li nav tevgerên welatparêz girtiye û ji bo doza azadiya welêt şixuliye. Herweha wî gelek nivîs di kovara *Hawar* û *Ronahî* de jî weşandine.³

Xurşîd

Xurşîd dewlementirê gund bû. Xortekî bi bejn û bal, çeleng û giran bû. Rojekê li ber melayê gund rawestiya û gotê:

—Kurekî min çêbû; jê re navekî şîrîn ji te dixwazim.

Mela hinekî ma, paşê serê xwe rakir û got:

—Bila navê wî Cemşîd be!

—Wek navê min e, û di gund de navekî bi tenê ye, ji xwe min jî ev

¹**çek** *f* weapon; **îspat-kirin** to prove; **daîre** *f* bureau; **resmî** official; **mecbûrî ... kirin** to force to have; **wergêr** translator; **dawî-anîn** to put an end to; **înkarî** *f* denial.

²**Çiriya Pêşî** October; **nexweşxane** *f* hospital; **Lozan** Lausanne; **nexweşîn** *f* disease; **qanser** *f* cancer; **çavên xwe girtin ji** to close one's eyes to; **dinya jîndar** the world of the living; **dilovanî** *f* affection; **hêja** worthy; **perwer** close (friend); **eynî** the same; **laş** *m* corpse; **merasîm** *f* ceremony; **şîndar** mourning; **sipartîn** to entrust; **goristan** *f* cemetery; **şehîd** martyr.

³**nivîskar** writer; **bi nav û deng** renowned; **rûxandin** *f* destruction; **agir** *m* fire; **kek** elder brother; **hêj** already; **çax** *m* time; **welatparêz** patriotic; **doz** *f* cause; **azadî** liberty.

READINGS

dixwest.¹

—Here bi arikariya Xwedê kurê te ji bo te û ji bo millet baş be.

Xurşîd, piştî ko spasê xwe ji melê re pêşkeş kirin, derket û bi dilgeşî çû mal.²

Piştî şanzde salan rojekê Xurşîd dîsa çû cem mela, wek berê xurt û xweşik bû. Mela jê pirsî:

—Dîsan çî ye, mirza Xurşîd?

—Îsal kurê min Cemşîd xwendina xwe bir serî û di nav hevalên xwe de ê pêşîn derket. Min dive îro jê re mewlûdekê bidim xwendin. Ez hêvî dikim tu îşev xwe biêşînî bêî mala me û bi dengê xwe ê şîrîn vê mewlûdê ji me re bixwînî.

—Cemşîd hêja ye, ezê jê re mewlûdekê bi kurdî bixwînim.³

Heşt salên din borîn. Xurşîd dîsa rojekê bi çend mirovan ve li pêş mela rawesta. Mela lê nêrî û got:

—Tu her roj xurtir dibî, di rûyê te de nîşanên xortaniyê û jiyînê dixwiyên. Ev jî çî ye?

—Bê derd im seyda, çima pîr bibim?

—Min divê tu her we bî. Lê bêje dîsa çî ye?

—Min ji kurê xwe re keça camêrekî xwestiye, dewlemend e, pir pere xwest. Lê kurê min yek e û li ber dilê min biha ye. Ji kerema xwe mehra wan bibire.

Mela mehîr birî û ew pîroz kirin.⁴

¹dewlemen rich; **bi bejn û bal** tall; **çeleng** good-looking; **giran** grave, serious; **bila...be** let it be; **ji xwe min jî ev dixwest** 'it's just what I wanted.'

²**arîkarî** (= *alîkarî*) *f* help; **spas** *m* gratitude; **pêşkeş kirin** to offer; **dilgeşî** *f* happiness.

³**îsal** this year; **serî birin** to complete; **mewlûd** *f* a poem celebrating the birth of the Prophet, traditionally recited at festive occasions; **hêvî kirin** to hope; **xwe êşandin** to trouble oneself; **hêja** worthy.

⁴**borîn** to pass (of time); **xuyan** (*xwiyê*) to appear; **min divê** it is necessary for me, I trust (+ subj.); **we = weha** thus; **camêr** gentleman; **biha bûn** to be valuable; **mehr**

KURMANJI KURDISH

Piştî çend heftan Xurşîd û Cemşîd li ser keştike piçûk di golekê da diçûn bajêr, ji bo kirîna cilên bûk û zavê. Ava golê bê pêl bû, di meha gulanê de bûn. Doralîyên golê bi kulîlk û hêşinayiyê xemilandî bûn. Xurşîd li kurê xwe dinêrî û xwe bextyartirê dinê dizanî. Cemşîd wek di xewnekê de bû. Bi zendên xwe ên xurt, destikên keştiyê zû dilivandin û keştî li ser avê dişemitand. Lê carna xwe ji bîr dikir, eqlê wî diçû cihên din.

Ji nişkê ve destikeke keştiyê ket avê. Cemşîd zû vegeerî ser û destê xwe dirêjî wê kir. Di wê gavê da destê wî ê din jî, ji keştiyê şemitî û xwe ne girt, ket avê.¹

Lê Cemşîd melevanî ne dizanî. Bi carekê di avê de winda bû. Derket û kir hawar. Bavê wî dest avêt ê, lê ne gihayê. Cemşîd li ber çavên bavê xwe çû bin avê û nema bi ser ket.

Xurşîd bi çavên xwe bawer ne dibû û li benda derketina kurê xwe dima. Lê ji çend piqpiqokên avê pê ve tişteke xuya ne kir.

Xurşîd sê roj û sê şevan di wî cihê da ma. Roja sisiyan laşê kurê xwe ê nepixî da pišta xwe û bir mal, sibetirê ew veşart.²

Piştî salekê bi şev li deriyê melê dan.

Derî vebû. Melê li pêş xwe mirovekî dirêj, kal, porsipî u piştixwar dît. Berê ew nas ne kir. Paşê melê kûr nêrî û got:³

—Ma tu ne Xurşîd î, vê nivê şevê te xêr e?

—Belê, ez im, hatime tişteki bi navê kurê xwe Cemşîd bidim te, ji bo

(f) **birîn** to conclude a marriage contract; **pîroz kirin** to congratulate.

¹**keştî** *f* boat; **gol** *f* lake; **bûk** bride; **zava** (obl *zavê*) groom; **pêl** wave; **gulan** May; **doralî** circumference; **kulîlk** *f* wild flower; **hêşinayî** *f* greenery; **xemilandî** adorned; **bextyar** happy; **zend** *m* forearm; **destik** *m* oar; **livandin** to row; **şemitandin** to make slide; **eql** *m* mind; **ji nişkê ve** all of a sudden; **gav** *f* moment; **şemitîn** to slip.

²**melevanî** *f* swimming; **hawar** (*f*) **kirin** to cry for help; **nema** not again; **bi ser ketin** to come up; **man di benda** to wait for; **piqpiqok** bubble; **laş** *m* body; **nepixî** swollen; **sibetirê** the next morning; **ve-şartin** to bury.

³**li derî dan** to knock on a door; **kal** old, aged; **porsipî** white-haired; **piştixwar** hunched-over; **berê** at first; **nas kirin** to recognize; **kûr nêrîn** to look closely.

READINGS

xwendina zarokên gund ên belengaz.

Xurşîd rabû, kîsek pere danî ser masê. Mela got:

—Ev pere pir in pir.

—Belê, îro min nîvê zeviyên xwe firotin. Cemşîd dixwest bi destê xwe ji milletê xwe re qencyên mezin bike, lê Xwedê ne hişt. Niha ez deynê wî didim.¹

Melê destê wî girt û bi dengekî nerm gotê:

—Cemşîd kurekî baş bû. Xwedê rehma xwe lê bike. Lê dinêrim tu pir li ber dike. Ew tişt li min jî qewimî. Were, emê hejkirina xwe bidin zaroyên gund û ji wan, xortên xwenda, xurt û hêja bînin pê.

Xurşîd li ser gotina melê hinekî pêjin piştê serê xwe rakir û li melê nêrî. Di çavên wî da ronahiyeke dijwar hebû. Xurşîd dile xwe da bû zaroyên gund.²

Xurşîd malê xwe, mela zanîna xwe dabûn millet. Piştî şanzde salan di gund da daweta çil xortên hêja, xwenda û milletperwer çêdibû û Xurşîd tê de bi serê sergovendê girtibû.³

Gulê

Gundî di mêvanxana Reşo de rûniştî bûn û daxaftin. Dijmin ji gund bi tenê qonaxakê dûr bû, nixta gundê Şadiyan di nêzik de wê biketa axa bav û kalan.

Herkes diponijî, li çarekê digeriya.⁴

¹**belengaz** poverty-stricken; **ra-bûn** to stand up; **kîs** *m* bag; **pere** *m* money; **danîn** (= *da-anîn*) to set down; **zevî** *f* field; **firotin (firos)** to sell; **millet** *m* nation, people; **qenci** *f* charitable act; **deyn** (*m*) **dan** to pay a debt.

²**nerm** soft, gentle; **rehm** (*f*) **kirin li** to have mercy on; **(li) ber kefin** to feel sad; **qewimîn** to happen; **hejkirin** (= *hezkirin*) *f* wish, desire; **zaro** child; **xwenda** literate; **anîn pê** to produce; **pêj(i)n** *f* feeling; **piştê** then; **ronahî** *f* brightness; **dijwar** hard.

³**mal** *m* property; **dawet** *f* festive occasion (here, graduation ceremony); **milletperwer** nationalist(ic); **bi serê sergovendê girtin** to lead a Kurdish dance line.

⁴**mêvanxane** *f* reception room; **axaftin** to speak; **qonax** *f* one day's distance; **nixt** *f* edge; **di nêzik de** soon; **bav û kal** forefather; **ponijîn** to be engrossed in thought;

KURMANJI KURDISH

Ezman girtî bû; bandevêkê ji reşiya şevê re hîn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê çiyar, Qoçoyê Pola, bi heşt mirovên xwe ve ket hundir. Cilên wan şil bûn; av di tîfingên wan re dihate xwar. Gundiyar gîşa da ber qîran: “Polayê kurd, sergevazê çiyayên Kurdistanê, fermo!”¹

Lê Qoço rûnenişt; di nîvê odê da ma û wek serdarekî bi dengêkî xurt û gur gote wan: “Gundîno! Ev panzde sal in ko ez gunehan dikim. Xelkê dikujim. Xerabiyê dikim. Stranên min di van rêlên rojnedîtî de hatin gotin, lê ji dihî vir da ji devê tu kesî dernakevin. Belkî ji bo me hemiyar, ev şev, li ser axa welêt şeva me a dawiyê be. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe min sond xwariye ko dijmin ji welêt derêxim.”²

Sorahiya rivîna agirê êzingan di tîfîkê de li dîwaran dihejiyan. Pola li dora xwe dinêrî. Çavên wê diçirîsîn. Çil gundî tev de rabûn û gotin: “Em jî sond dixwin, em jî bi te re ne, pilingê kurd!”³

Di wê gavê de, ji nişkê ve derî vebû, jinikeke zirav, narîn û şîrîn, wek pelekî dara bîşengê li ber bayî ket hundir û got: “Ez jî bi te re me; ez jî mêrê pola!”

Gundiyar gîşan bi dengêkî weke ken kir qîr: “Gula qehbik! Gula bê namus!”⁴

Gulê ji gund bû. Berî çend salan bavê wê bi zor ew da bû yekî. Gulê rojekê mêrê xwe kuştî bû, ketibû pê Qoço û li serê çiyar pê re digeriya. Gundiyar bi çavekî nebaş lê dinêrîn, her gav jê re dijûn dikirin û deriyên

çar *f* remedy.

¹**ezman girtî bû** ‘the sky was overcast’; **bandev** *f* summit; **reşî** *f* blackness; **hîn bêtir** even more; **şidet** violence; **qiral** king; **şil** wet; **qîran** shout; **sergevaz** (*sergevez*) pride; **fermo** (impt.) please (come in).

²**serdar** commander; **xurt û gur** strong; **gunehan kirin** to sin; **xerabî** *f* harm; **rêl** *f* forest; **rojnedîtî** that has never seen the light of day; **sond** (*f*) **xwarin** to swear an oath; **avêtina gunehên** expiation for sins; **der-êxistin** (= *der-xistin*) to drive out.

³**sorahî** *f* redness; **rivîn** *f* flame; **êzing** *m* firewood; **tîfîk** *f* bellows; **hejiyan** to tremble; **çirîsîn** to sparkle; **tev de** altogether; **piling** tiger.

⁴**zirav** slender; **narîn** delicate; **şîrîn** pretty; **pel** *m* leaf; **dar** *f* tree; **bîşeng** *f* weeping willow; **mêr** man; **pola** *m* steel; **gîşan** all; **ken** laughter; **qîr kirin** to shout; **qehbik** *f* harlot; **bênamus** dishonorable.

READINGS

xwe her gav tê digirtin. Ji tirsê Qoço ne bûya belkî ew dikuştin. Lê, ne tehqîra gundiyan, ne jî tajanga Qoço ji Gulê re ev re nedida berdan. Gava Qoço ew dida ber tajanga, Gulê digotê: “Li min xe, pilingê min! Li min xe! heya destê te biweste! Tu jîna min î! Ez goriya te me. Bê te ez nabim!”

Di çiyân de bi Qoço re ger, di şikeftan de raketin, di berfê de qufulîn, jê re bextyariyeke mezin bû.¹

Wê şevê Gulê dîsa digirî, lê îcar ne ji êşa tajanga Qoço ya ko wek marekî xwe li bejna wê a zirav dipêçand. Xew, qet ne diket çavên wê. Dijmin dê biketa welêt... Rojên geşî ji bo wan ne diman. Her tişt dibû xeyal. Dengê topên dijmin gelek nîzik dihatin bihîstin... Çiyayên Qoço ên serbest diketin destê dijmin... Jina gund a pîs li ser vî halî bi girîn difikirî. Li çara xelasbûnê digeriya. Divî bû ko gundê xwe, welatê xwe, çiyayê xwe û serbestiya pilingê xwe “Pola” ji dijmin biparêze. Ji nişkê ve rabû. Tiştêk hatibû bîra wê. Xencereke bi şiv girt. Ji şikeftê derket. Riya aliyê dijmin girt û winda bû.²

Qoço, bi çil gundiyan xort û mêrxas ve li pêş dijmin kemîn girti bûn. Hingûra şevê bû. Li ser çiyayê bilind, nîvres heyveke sor bi dilekî şikestî hêdî hêdî hildihat. Dengê topan hati bû birîn. Pola çavê xwe li ser çiyayên xwe, li ser warên xwe geran û bi keser li wan nêrî.³

Wî sond xwarî bû; gunehên xwe yê panzde salan wê bi destê xwe rakirina, ne hişt ko dijmin derbazî tixûbên welêt bibe...

Di dilê wî ê pola de agirê serbestiyê pêketi bû. Wî tu caran wek wê şevê

¹bi zor by force; dan yekî to marry off to somebody; ketin pê to fall in with; bi çavekî nebaş nêrîn li to have a low opinion of; ji...re dijûn kirin to curse at; tehqîr f deprecation; tajang f lash, whip; gorî f sacrifice; şikeft f cave; qufulîn to feel very cold; bextyarî f happiness.

²girîn to weep; bej(i)n f body; pêçandin li to coil around; geşî f joy; xeyal fantasy, dream; top f cannon; serbest free, open; pîs slutty; parastîn (parêz) to defend; xencer f dagger; şiv f handle; riya aliyê ... girtin to turn one's face toward; winda bûn to disappear.

³kemîn girtin to lie in ambush; heyv f moon; war m camping ground; keser f sorrow.

KURMANJI KURDISH

hej kuştin û hilanîna tola xwe ne kiri bû.¹

Demekê, Gulê hat bîra wî. Wî hej vê jinekê dikir. Li dora xwe nêrî; lê Gula xwe ya ko wek sihekê jê ne dibû ne dît:

Di wê gavê de nêrevanekî wan got: “Bala xwe bidin! Ji aliyê dijmin yek tê.”

Siha ko xweya dikir bê tirs û telaş dihat. Dengekî şikên wan rakirin: “Ev Gula qehbik e!”

Gundiyekî din got: “Qehbikê em xistin fexê!”

“Tifingê berdê Pola! Ew rêberiya dijmin dike!”²

Qoço rûyê xwe tirş kiri bû; birhên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinêrî. Wî jî gotinên gundiyan rast didîtin:

Gulê li cem dijmin çi dikir? Ne xwe cihê wan şanî dijmin kiri bû... qehbîfî kiri bû!?

Qoço di bin ronahiya heyva sor re tifinga xwe dirêjî Gulê kir û got:

—Ha ji te re, Gulê! Berî dijmin berika pêşîn para te be...³

Berikê wek qîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrişim raxiste erdê.

Pişt re Qoço rabû ser xwe û ji gundiyan re got: “Zû bin, hevalno! Emê nixta dijmin bigrin!”

Çûn. Lê dijmin bê li berxwedan revîn. Kurd ketin asêgehê; her der vala bû. Bi tenê di odekê de tiştê ecêb dîtin.

Serê zabitê dijmin ji laşê wî hati bû birîn û mezêl bi xwîn bû. Li ser nivînê xencereke bi xwîn diçirîsî.⁴

¹**derbazî ... bûn** to cross; **tixûb** *m* frontier; **pê-ketîn** to be kindled; **tol** (*f*) **hil-anîn** to take revenge.

²**sih** (= *sî*) *f* shadow; **nêrevan** scout; **bala xwe dan** to pay attention; **xweya** (= *xuya*) **kirin** to emerge; **telaş** commotion; **şik** *f* doubt; **xistin fexê** to put in a trap; **rêberî kirin** to lead.

³**rûyê xwe tirş kirin** to scowl; **birh** *m* eyebrow; **gijgijîn** to be knit (brow); **şanî ... kirin** to show to; **qehbîfî kirin** to prostitute oneself; **berik** *f* bullet; **par** *f* lot.

⁴**tarî** *f* darkness; **çirandin** to tear; **armanca** *f* target; **çarşev** *f* sheet; **hevrişim** *m* silk; **ra-xistin** to spread; **erd** *f* ground; **hevalno** (vocative pl.) friends; **nixta ... girtin** to cut off; **bê li** without; **berxwedan** *f* resistance; **revîn** to run away; **asêgeh** *f*

READINGS

Qoço xencer rakir; wî ev xencer dabû Gulê. Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porên Gulê ên zer pêl dida.

Qoço kulmikên xwe gez kirin û wî pilingê ko çiya dihejandin ji bo cara pêşîn girî û gote gundiyan: “Wê bi min gunehê paşîn da kirin, ji Gula qehbik re me qehbîti kir!”¹

Bi dengêkê têrêş, têrpoşmanî û têrbirîn gotina xwe a paşîn kir: “Gulê! Te deynê xwe da, te gunehên xwe rakirin! Niho dora min e, Gulê! Gula min a zer!”

Bi xencera xwîndar wek bayekî ji odê derket, berê xwe da dijmin û nema xweya kir.²

ZEYNELABÎDÎN ZINAR

[Jiyana min gelekî bi şequdeq bihuriye. Tenê dê bi kurtî bibêjim: Ez di Sibata 1953’an de, li Hedhekê hatime dinê. Ew gund girêdayê bi Qubînê (Beşîrî) ve ye. Di wê demê de, bavê min li wir meletî dikir. Pêşî, min xwendina olî li cem bavê xwe xwendiyê, heta temenê min gihaye deh-dozde salan. Îcar piştê ez derketime feqîtiyê û li hin medreseyên Kurdistanê geriyame, li xwendina neh wî serf, şerîet, tefsîr, hedîs û hwd. domandime.³

Lê demek hat, êdî ew xwendin li Kurdistanê pir sist bû. Îcar piraniya kurdan berê xwe dane xwendina nû. Wê hingê ez di 24’ê Hezîrana 1968’an de li Pîranê (Dicle)

fortification; **vala** empty; **zabit** (obl *zêbit*) officer; **laş** *m* corpse; **mezêl** *f* room; **bi xwîn** bloody; **nivîn** *m* bed; **çirisîn** to glitter.

¹**kulm** *f* fist; **guvaştî** clenched; **gurz** *m* hank (of hair); **pêl dan** to wave; **kulmik** *f* fist; **gez kirin** to bite; **hejandin** to cause to tremble.

²**têrêş** full of pain; **têrpoşmanî** full of regret; **têrbirîn** full of wounds; **deyn** (*m*) **dan** to pay a debt; **gunehên xwe ra-kirin** to cancel one’s sins; **niho** (= *niha*) now; **dor** *f* turn; **xwîndar** bloody; **nema** never again; **xweya = xuya**.

³Note that Zeynelabîdîn Zinar’s dialect does not always maintain the ergative construction in past transitive verbs; **şequdeq** “hard knocks”; **bihurîn** to be spent; **Sibat** *f* February; **Beşîrî** Beşîri, a town east of Batman; **meletî kirin** to be a professional mulla; **olî** religious; **dozde** (= *dwanzde*) twelve; **feqîti** *f* higher religious studies; **medrese** Islamic school; **neh wî serf** Arabic grammar; **şerîet** Islamic law; **tefsîr** Koranic commentary; **hedîs** *hadith*, the sayings of the Prophet Muhammad; **hwd.** (abbreviation for *her wekî din*) etc.

KURMANJI KURDISH

ketim imtihana dibistanê û dîploma wergirtim. Di eynî salê de jî, min li “Îmam-Hatîp” a Diyarbekirê domand. Lê piştî yazdehên Adara 1971, bi hatina cunta faşîst a diduyan re, ez jê hatim avêtin. Û min li dibistana navîn a petrolê (Batman) domand. Ez di 08.11.1973’an de çûm eskeriyê. Lê piştî şeş meh û 14 rojan, ji aliyê Nexweşxana Gümüşsuyu ya leşkerî ve, bi rapora “Pûçkirina ji Eskeriyê” jê hatim derxistin.¹

Di wan salên bihurîn de, min hin meletî kir û li şûna bavê xwe jî gelek car dikiirim. Piştê ez di 25.07.1974’an de, li Belediya Êlihê (Batman) bûm memûr û heta 1983’an, çî di Belediyê de çî jî di Maliya Batmanê de, hin wezîfeyên girîng ên “Berpîrsyariya Aborî” wergirtim. Herweha min ji sala 1976 heta 1979–80, lîseyaya şevê ya Batmanê jî xwend.²

Piştî 12’ê Êlûla 1980, ku cunta sisiyan a faşîst li Tirkîyê hate ser hikim hetanî 1984’an, ez heşt caran hatim girtin. Tenê di sê girtinan de, ez 178 rojan îşkence bûm. Di yekê Adara 1984’an de jî bi biryara Dadgeha Leşkerî ya li Diyarbekir, Nimre-1, cezayê pênc salan girtîgeh û 20 mehî jî cihêlkirin wergirtim.³

Bi rastî piştî hewqas îşkenceyên bi sosret jî ku li min hatibûne kirin ez bi mana li welêt razî bûm. Lê dijmin semaxa saxhiştina min, mîna ya gelek kurdan, nedikir û li pey min ketibû çaqoberkê. Îcar ez ji ber wê yekê neçar mam û di dawîya 1984’an de ji Kurdistanê revîm, hatim li Swêdê bi cih bûm.]⁴

Bavê Nazê

Bi adetî, yên ko hindik dizanin gelekî dipeyivin û yên ko gelek dizanin hindik dipeyivin. —Ruso⁵

¹**piranî** *f* majority; **wê hingê** at that time; **Hezîran** *f* June; **Dicle** Dicle, a town north of Diyarbakır; **imtihan** *f* examination; **dibistan** *f* high school; **Îmam-Hatîp** imam-hatip, a Turkish religious training college; **Adar** *f* March; **cunta** junta; **faşîst** fascist; **avêtin** to expel; **navîn** central; **petrol** *f* petroleum; **eskerî** *f* the military; **leşkerî** military; **rapor** *f* report; **pûçkirin** *f* refusal; **der-xistin** to throw out.

²**li şûna ... kirin** to act in place of; **belediye** *f* municipality; **memûr** government official; **maliye** *f* tax office; **wezîfe** *f* duty; **berpîrsyarî** *f* responsibility; **aborî** economic; **wer-girtin** to take up (employment); **lîsê** high school.

³**Êlûl** *f* September; **hatine ser hikim** to come to power; **îşkence bûn** to be tortured; **dadgeh** *f* court; **ceza (m) wer-girtin** to receive a sentence; **girtîgeh** *f* prison; **cihêlkirin** surveillance.

⁴**bi sosret** unusual; **razî bûn li** to be content with; **semax (f) kirin** to bear; **saxhiştin** to let go in good health; **li pey ... ketin çaqoberkê** to hound; **neçar man** to have no alternative; **bi cih bûn** to take up residence.

⁵**naz** *f* coquettishness; **bi adetî** usually; **heke** if; **Ruso** Rousseau.

READINGS

*Heke mirov ev herdu tişt danîne ber hev dibîne ko tiştên
ko pê dizane, li gore tiştên ko pê nizane, gelek hindik
e. —Fontnêl¹*

Nayê bîra min kengî min xwe naskir, lê xweş tê bîra min xew nediket çavên min, heya diya min çîrokek ji min re negota. Bi riya çîrokan ez hogîrî odê bûm. Ev oda ku bi şev kesên mezin bi gurdarî kirina stiran û çîrokan şevbêrkên xwe tê de dibuhurandin.²

Lê mixabin rûniştina li wir ji me zarokan re qedexe bû. Dîsa jî her û her me hewlê dida derbas bin hundirê odê. Û her car xulamê axê bi guhên me digirt, em diqewirandin. Lê ku dihat û Xwedê li hev tanî, bi fen û fitan em derbasî hundir dibûn. Ciyên me jî şûna şekalan bûn. Lê dema em diman ji derveyî odê (ew jî gelekî pir bûn) em radipelikîn penceran, da ku em çîrok û çivanokan bibihîzin. Le camê nedihîşt deng bê me. Loma ji rûhê me, qasî ku ji xulamê axê diçû, hewqas jî ji camê diçû.³

Di vir de, divê ez rastiyê bêjim; heger em deynin ber carên heval û hogirê xwe, ez gelekî kêman li ber pencerê dimam. Ji ber ku bavê min qedrê wî li gund hebû yek carna ji min re dihiştin ku ez şevbêrkê li nav mezinan bikim. Tevî ku di odê de ez di nav şekalan de û nêzîkî ciyê xulam rûdiniştim jî her û her ez kêfxweş bûm. Li gor vê bextiyariya min çiqasî heval û hogirên min ji min diqehirîn. Û çavên wan bar ne dibûn!... Lê min ev tişt di ber guhên xwe re ber dida û xwe di cîhana çîrok û destana de ji bîr dikir.⁴

Heger mezin bi ode bûn, em zarok ne kêman wan bûn. Oda me garsîna

¹li **gore** in comparison with; **Fontnêl** Bernard le Bouyer de Fontenelle (1657–1757), French mathematician.

²**heya** (= **heta**) ... **ne** until; **dê** (const. *diya*) mother; **bi riya** in the view of; **gurdarî kirin** to pay rapt attention; **stiran** *f* song; **şevbêrkên xwe buhurandin** to spend one's evenings.

³**mixabin** unfortunately; **qedexe ji...re** forbidden to; **her û her** always; **hewl** (*f*) **dan** to make an effort; **xulam** manservant; **axa** (obl *axê*) agha, chieftain; **bi guh girtin** to grab by the ears; **qewirandin** to drag away; **bi fen u fitan** by hook or crook; **şekal** *f* shoe; **derve** outside; **ra-pelikîn** to creep; **pencere** *f* window; **da ku** in order that; **çivanok** *f* fairytale; **bibihîzin** = *bibihîsin*; **cam** *f* glass; **rûh** *m* spirit; **qasî ku** as much as; **hewqas** that much.

⁴**qed(i)r** *m* power; **tevî ku** although; **hogir** friend; **qehirîn ji** to get angry with; **çavên wan bar ne dibûn** 'they couldn't stand to see it'; **cîhan** *f* world; **destan** tale.

KURMANJI KURDISH

nava gund û teyan û zolilkên dora wê bûn. Heger çîrokvanê mezinan nêzîki axê rûdinişt, lê ez çîrokvanê zarokan di nav wan de, ez di ciyê xweş u baş, bi şahnazî û payetî rûdiniştim. Lewra min xwe bi zanîbûna çîrokan di ser hevalê xwe re digirt. Di nav wan de hawayê dengbêjên mezinan dikir, xwe bi vî alî û wî alî de dihejand, dikuxuyam da ku deng zelal bibe û min çîrokên ku di odê de bihîstibûn ji wan re digot. Carna jî min hin çîrok ji cem xwe çêdikirin. Bi hawakî ku min hinek ji vê çîrokê, hinek ji ya din digirt û bi hev perçîn dikir. Lê hevalên şareza “dizîti”ya min nasdikirin û digotin: “Te ev ji wê çîrokê û ev jî ji yan han biriye.” Bi kurtî, qulopaziya min nedîçû serî.¹

Û rojekê ji rojan, dawiya havînê tiştêkî ku hîç ne li ber bala min bû bi min re bihurî. Bavê min ji min re got:

—Divê tu herî bajêr, ji bo ku tu têkevî mektebê.

Min navê bajêr bihîsti bu, çimkî mala birê min ê mezin li wir bû. Û bêyî ku ez zanibim çima, lê tim û tim navê bajêr li cem min bi navê nanê firnê, şekir û helawê hatibû girêdan.²

Lê bêxwediya mektebê çî ye?

Tu dibê qey bavê min di dilê min de bû, dema peyivî:

—Kurê min, mekteb mîna odê ye, lê tenê ji bo zaroka ye. Di vir de ji çîrokê odan xweştir dibêjin.

Ji kêfa, min xwe negirt, bi bazdan ez derketim nav gund û ban ban kir:³

—Ezê herim bajêr... Ezê herim mektebê.

Û di nava xwe de min digot “Lê bêtirs ezê çîroka bibihîzim.”

Di demek kurt de hevalan hemûyan xebera çûna min a bajêr bihîstin. Wan jî doza çûna mektebê ji dê û bavên xwe kirin. Lê doza wan bi cî nehat,

¹heger if; garsîn f village square; teyan large bathhouse basin; zolilk bloom; çîrokvan storyteller; şahnazî f pride; payetî f honor; dengbêj singer; kuxuyan = kuxîn to cough; zelal clear; bi hev perçîn kirin to rivet together; şareza proficient; dizîti f secret; qulopazî f patchwork; çûn serî to succeed.

²havîn f summer; li ber bala ... bûn to be on one's mind; mekteb f elementary school; çimkî because; bira (constr. birê) brother; bêyî ku without; çima why; tim û tim ever and always; nan m bread; firne f bakery; şekir m sugar; helaw f halvah.

³baz-dan to dance; ban ban kirin to shout.

READINGS

lewra ji zû de qedera wan bi şivantiyê û gavantiyê ve hatibû girêdan. Bi qiriktalî giriyan. Ma gelo çi çek di destên zarokan de heye ji xeynî rondikan!¹

Demek dirêj neçû, min berê xwe da bajêr û cara yekem ji xuşka xwe ya biçûk û diya xwe bi dûr ketim. Ê min dev ji heval û hogirên xwe yên ku bi xemgînî min bi rê kirin, berda.²

Di bajêr de hamû tişt li ber çavên min bi nuhîtî xuya dikir. Trimbêl, avayî û heya hesên vir ne mîna yê gund bûn. Da ku ez xwe biyanî di nav zarokên vir de nibînim, min ew didan ber hevalên gund, min digot: “Ev mîna Felemez e, evê han wek Husnîko ye û ev bira jî mîna Cenbelîko ye. Ê ev...?” Zarok wiha li bajêr pîr bûn, mîna gêrikan. Ez jî hejmar diketim û li ber çavên min zarokên nenas di şûna dostên min de radiwestiyan. Di vir de hîn bêtir dilê min bi ser gund û malê ve bû û min bêriya wan dikir.³

Dawiya dawî ew roj hat, ku birê min ê mezin ez birim dibistanê. Erê! Dibistana ku ji bo wê ez li vir im. Di sikakên bajêr de me gelek fitil û çiv dan xwe heya em gihîştin avayiyek mezin mîna oda axê. Birê min destê xwe bi alî wê ve kir û got:

—Ev mekteb e.

Hîn em negihîştin, ku derbasî hundirê wê bin, şagirtên dibistanê mîna kulmozê di me derbûn. Erê, ez jî wek wan bi birdilka reş bûm. Lê min xwe didît qijakek sipî di nav qijakan de.

Birayê min derbasî ba mudîr bû û piştî demek ne dirêj li min vegeriya û got:

—Min navê te nivîsand. Ê di vê seffê de tê bixwînî—birê min destê xwe bi alî odake ve kir—û tê bi van zarokên re bî. Di vir de wî destê xwe bi alî komikek zarok kir û bêdeng ez hiştim û derket.⁴

¹**doz** *f* cause, reason; **ji zû de** from early on; **qeder** *f* fate; **şivantî** *f* sheep herding; **gavantî** *f* cow herding; **qiriktalî** *f* bitterness; **çek** *m* weapon; **ji xeynî** other than; **rondik** *f* tear.

²**xuşk** *f* sister; **dev ber-dan ji** to leave; **bi xemgînî** sorrowfully; **bi rê kirin** to see off.

³**nuhîtî** *f* newness; **trimbêl** *f* automobile; **avayî** *f* building; **hes** *f* emotion; **bira** really; **gêrik** ant; **bêrî (f) kirin** to miss.

⁴**sikak** street; **fitil dan xwe** to turn; **çiv dan xwe** to zigzag; **şagirt** pupil; **kulmoz** *f*

KURMANJI KURDISH

Bi rastî heger ez ne çiyayî bûma û ji gotinên xelkê netirsiyama, minê bida pey birê xwe. Lê min bi çiyayîtiya xwe girt, ez mam li ciyê xwe bêdeng. Ê lêxistina zengil riya vegeerê li ber min birî. Bi dengdana zengil deng ji şagirtan biliya û bêpejniyê perdên xwe avêtin ser hewşê. Bi dengdana zengilê duduyan hemûyan bi bazdan berê xwe dan devê deriyê seffê xwe û bi rêz rawestiyayî man. Ez jî ketim nav refê xwe. Pişt re yeko-yeko em derbasî hundir bûn. Li hundir cara yekem min kursî û masê dibistanê dît. Di dilê xwe de min got: “Ê ev jî di oda de tune!”¹

Di seffê de li cîkî vala rûniştim, bê ku ez ji kesî bipirsim. Ji nişka ve merovek bi kincên efendî derbasî hundir bû. Gurînê bi şagirtan ket, ji ber rabûn. Bi gurîna wan ez veciniqîm, lê min xwe girt û ez jî mîna wan bi temene sekinîm. Piştî ku vî merovî çend gotinên xwe peyivî, şagirt rûniştin, ez jî bi wan re... Dûre deng ji seffê biliya. Merovê efendî bi awirên xwe di nav me de geriya, heya li ser min sekinî. Li min nêrî û peyivî. Hemûya berê xwe bi alî min de vekirin. Min cî ji xwe re nedidît, dilê min dihat guvaştin bê ku zanibim ezê çî bikim. Di vê demê de kurikê teniştê min hilmisek li min da û bi zimanê me got:²

—Çima tu bersîva mamoste nadî?

Bi dengê bilind min lê vegeerand:

—Ma efendî çî ji min dixwaze?

Şagirtê li teniştê min û pê re yên din jî bi hêl kenyan. (Diyar bû li ser gotina efendî dikenyan.) Efendî awir di wan veda û hemû man bêdeng. Pişt re şagirtê li teniştê min bû tercuman di nav min û efendî de. Hat diyarkirin

beehive; **der-bûn di** to burst out on; **bi birdilka** (= *bi berdêlk*) in value; **qijak** raven; **ba** presence of; **mudîr** principal; **seff** *f* classroom; **komik** *f* small group; **bê-deng** without a word.

¹**heger** if; **çiyayî** hillbilly; **dan pey** to go after; **çiyayîti** *f* hillbillyness; **zengil** *m* bell; **veger** *f* return; **deng-dan** to sound; **biliyan** to arise (sound); **bêpejni** *f* tranquility; **hewş** *f* courtyard; **dev** *m* entrance; **ref** *m* row; **kursî** *f* chair; **mase** (obl *masê*) *f* table; **ev di ... de tune** ‘this is nothing like ...’

²**cîkî** = *ciyekî*; **kincên efendî** westernized gentleman’s clothes; **gurîn** clamor; **ve-ciniqîn** to be seized by fright; **bi temene** respectfully; **sekinîn** to quieten down; **dûre** then; **awir** (*f*) **sekinîn li ser** for a glance to light on; **hamûya** = *hamûyan*; **berê xwe ve-kirin bi alî ... de** to turn toward; **teniştê** next to; **hilmis** poke.

READINGS

ku mamoste (dûre piştî demekê min naskir ku ji wan kesan re dibêjin mamoste) pirsî nav û temenê min û hin pirsên din dikir.

Min li dibistanê çend saet qedand, ku ji min re bûbûn wek salan. Hîn bêtir min bêriya gund, dê û heval û hogirên xwe kir. Û hîn bêtir rûhê min ji bajêr û xelkên wê çû. Ez bi dilşikestî vegeyriyam malê û min naskir ku bavê min cara yekem ez xapandim. Ez ku gihîştim negihîştim malê, min berê xwe da bavê xwe (hîn ew li bajêr bû) û min jê pirsî:¹

—Kanî stranvan û çîrokvanên te? Û çima ne bi zimanên me dipeyivin?

Bavê min dît ku bi van gotinên han min nigên xwe zêdeyî xwe avêtin, lê tevî wilo ew ji iyarê xwe derneket, bi rûyê min de ne pijiqî. Berovajî, bi dengekî dilovanî, ne wek ê hercarî yê di van halan de bi min re peyivî:²

—Kurê min, hîn tu biçûk î... Demek dirêj wê nere tê hemû tiştî nasbikî. Û çîroka jî wê ji we re bêjin. Lê li ser ziman; divê tu nasbikî ku zimanê me yê malê ye, û ew zimanê din ê mektebê ye—bavê min destê xwe danî ser milê min û berdewam kir—kurê min, baweriya min bi te tê. Maşellah tu bi hiş î di demek ne dirêj de tê wek bilbil bi zimanê hukûmetê bipeyivî.³

Min ji bavê xwe ne pirsî, çima zimanê me yê malê ye û çima yê din yê mektebê ye. Lewra di mala me de gotinên mezinan nedibûn didu û her û her wê bi ya wan bûna.

Roj û meh buhurîn, lê her û her dibistan nebû mîna odê ji xeynî dersa inşî çimkî ew dersa han ji dûrahî çîrok û çîvanok tanî bîra min. Û bi rastî jî vê dersê ji yên din bêtir ez dêşandim. Ne tenê wilo, heya ruhê min ji dibistanê dibir.⁴

Di vê dersê de her şagirtêkî diva bû li ser serpêhatiyek xwe bipeyiviya yan jî çîrokek ji çîrokên ku bihîstibû bigota. Dema dor digihîşt min, min

¹bersîv (*f*) dan to answer; bi hêl kenîyan to laugh out loud; qedandin to complete; dilşikestî *f* disappointment; xapandin to deceive; ku gihîştim negihîştim 'as soon as I arrived.'

²kanî where are?; nigên xwe zêdeyî xwe avêtin to overstep one's bounds; iyar *m* skin; pijiqîn to blow up; berovajî to the contrary; dilovanî *f* affection.

³mil *m* shoulder; berdewam kirin to continue; bawerî *f* belief; maşellah goodness! (said to ward off the evil eye when something is admired or praised); bi hiş intelligent; bilbil nightingale.

⁴dersa inşî composition class; ji dûrahî remotely; êşandin to pain; ruh *m* soul.

KURMANJI KURDISH

dixwest çîroka li ber dilê min şîrîntir kîjane wê bêjim, lê min nikarîbû; lewra devê min diket hev û sermiyanê min ji gotinên zimanê nuh hindik bûn nikarîbû alîkariya min bike ji bo ku ya dilê xwe bêjim. Di şûna ku mamoste alîkariyê bi min re bike, digot:

—Ê li dû wî.

Ax, xwezî wî zanîbûya ez çiqasî bi vê peyvê diêşiyam! Û erê gelek sal bihurîn di jiyana min de lê her û her ew gotina han man kulên giran di dilê min de. Û çiqasî ji bo vê gotinê di xew de qarîn bi min diket, diya min ez ji xew radikirim û digot:¹

—Kurê min, te xêr e, çima tu di xewê de dikî qerebalix! Hebe tune be kabûs li ser dilê te rûniştîbû, çima te dikir qarîn?

Helbet min a rastî ji diya xwe re nedigot û a rast ew bû, diya min, ez ji xew radikirim, gava mamosta digot, “Ê li dû wî.”²

Carna jî diya min ez ji xew radikirim û dipirsî:

—Te xêr be, kurê min, tu di xewa xwe de dikeniyayî?

Diyar bû ku dema mamosta bi zimanê me dipeyivî û dipirsî ez dikeniyam.

—Kî wê çîrokekê ji me re bêje?

Min tiliya xwe bilind dikir û digot:³

—Ezê... ezê...

Mamoste rê dida min û ez bi şarezayî dipeyivîm. Piştî temambûna çîrokê mamoste digot: “Bravo!” berê xwe dida şagirtan, “Jê re li çepika xin!”

Belê, roj û meh çûn, dû re salan jî dan dû wan. Gelek tişt di jiyana min de hatin guhartin, tenê xwezîtiya nivîskariyê bi min re ma.

Erê, sal çûn û ez jî bûm mamostê seffa yekem li gundekî. Ev dersa yekem e. Şagirt ji ber min rabûn û bi temene man rawestiyayî. Mîna hemû mamostayên cîhanê min xwe bi wan da naskirin, yeko yeko navên wan jî pirsî û di defterê de nivîsand. Dema dor gihîşt yekî ji wan, ew ma bêdeng û bersiva

¹**serpêhatî** *f* adventure; **dor** turn; **kîjane** which?; **sermiyan** *m* capital; **di şûna ku** instead of; **li du** behind, backward; **xwezî** would that; **peyv** *f* words; **kul** *f* sorrow; **qarîn** *f* crying bitterly; **ji xew ra-kirin** to rouse from sleep.

²**qerebalix** **kirin** to act up, to flail around; **kabûs** nightmare; **helbet** of course.

³**keniyan** to laugh; **tîlî** *f* finger; **bilind kirin** to raise.

READINGS

pirsa min a li ser navê wî neda. Min lê nêrî û pirsaxwe ducar kir.¹

—Navê te?

Ma bêdeng û serê xwe xist ber xwe, ez bi ber wî de çûm. Lewra baweriya min hat ku ji min fam nake. Ji bo wilo min bi zimanê kurdî—bibuhurin, bi zimanê malê—jê pirsî:

—Navê te çi ye?

Şagirt serê xwe rakir. Çavên wê mişt hêsir bûn, bi dev li ken û lêv ricifî got:

—Na...vê min ... Xoşnav e...

Tevizînok bi laşê min ketin û min xwe dît di Xoşnav de... Ma gelo ewê xwe di hinekên din de bibîne?²

MAHMUT BAKSÎ

[Ez 46 salî me. Bav ji Bilîsê ye, dayik ji Bişîriyê ye. Ez ji sala 1970 vir li Swêd, li Ewrûpa dijîm. Eva hema bû bîst yek sal e ku ez neçûme welêt, yanê kurdîstana Tirkîyê. Ez çûm kurdîstana Iraqê, Îranê û Sûriyê, lê mixabin nikarim biçim kurdîstana Tirkîyê, sedem, qelem e, fikr e, hezkirina welêt e... tirkan ev rê, ev heq ji min stendiye. Bi kurtî jiyana min ev e.]

Çar Aliyê Me Agir E

Di navberê de heşt roj derbas bûn. Melkemot hêdî hêdî xwe nêzî me dikir. Ji vê gavê me çavên melkemotên bi tirs didî. Em ketibûn taya mirinê. Diya min serê me şûşt, kincên paqij li me kir. Piştê du rojên din emê winda bibûna. Me bi çavan ji gundiyan xatir xwest. Dîtina me û wan mabû roja qiyametê...³

Şevêk, şevêkê havînî pîr dereng, li deriyê me xistin. Ev şev deh rojên me

¹şarezayî expertise; **li çepika xistin ji...re** to applaud for; **xwezîf** *f* desire; **bi temene** respectfully; **defter** *f* register; **ducar kirin** to repeat.

²**fam kirin** to understand; **bibuhurin** 'excuse me'; **mişt hêsir** full of tears; **lêv** lip; **ricifî** to tremble; **tevizînok** numb feeling.

³**melkemot** angel of death; **ta** *f* fever; **paqij** clean; **xatir xwestin** to bid farewell; **roja qiyametê** day of resurrection.

KURMANJI KURDISH

qediyabû. Dadê kincên xwe li xwe kir û çû bi alî derî ve. Hinek sekinî, li me mêze kir. Tiliya xwe avête çengelê û derî vekir. Em ji tirsê dilerizîn. Me apê xwe Temo zû nas kir. Tivinga Apo di destê wî de diçilwilî. Nifirîn û agir ji rûyê Apo dibariya. Çavên Apo tijî xezep û kîn bû, çarmergî li erdê rûnişt, tivinga xwe danî ser çokên xwe, qutiya cixarê ji berîka xwe derkir. Apo nefes ser nefesê li cixarê dida. Destê wî yê bi cixare dilerizî. Tilîkên Apo ser lêvên wî nedisekinîn. Deng jê dernediket. Apo çîroka dadê seh kiribû.¹

Beriya sê mehan bavê min ji hepsa Diyarbêkrê firar kiribû. Babo meh-kûmê îdamê bû. Cunta faşîst serê bavo dexwest. Ji bona wan, bavo merivekî pirr girîng bû. Çaralî lê digeriyan. Lê bavo xwe ji lepên wan xilas kiribû û derbasê Binxetê bûbû. Zabitê Tirkan deh roj muhlet dabû diya min. Dadê gerek di nav van deh rojan de bavo teslîm bikira. Nexwe di ciyê bavo dê dadê bigirtana. Girtina dadê dibû derbeke mezin ji me re. Ji bo vê yekê apê min dixwest ku em ji gund derkevin û biçin ba bavo.²

Piştê cixarê apo rabû ser xwe û ji min re got:

—Em ê îşev ji vir herin. Esker ha hatin, ha hatin. Em nikarin zar û zêçên xwe, namûsa xwe di bin lingên eskeran de bihêlin.³

Dadê di destekî sivik tiştên ku ji me re pêwîst bûn da hev. Di nav çend deqan de dadê sê boxçe girê da. Livîn, sindoq, firaq û tiştên giran li cihê xwe man.⁴

Em ji malê derketin. Şev tarî bû. Çav çavan nedidît. Giraniya şevê wek perdeki reş kişiyabû ser me. Haya tu kesî ji me tune bû. Stêrk di tarîtiyê de

¹**dereng** late; **qediyân** to come to an end; **dadê** momma; **mêza kirin** to look; **çengel** *m* hook; **lerizîn** to tremble; **apo** (const. *apê*) uncle; **tiving** *f* gun; **çilwilîn** to gleam; **nifirîn** *f* malediction; **tijî** full; **xezep** *f* rage; **çarmergî** cross-legged; **çok** *f* knee; **qutî** *f* box; **cixare** cigarette; **berîk** *f* pocket; **nefes dan** to puff; **tilîk** *f* finger; **seh kirin** to understand intuitively.

²**babo** daddy; **heps** *f* prison; **firar kirin** to escape; **mehkûm** sentenced; **îdam** *f* execution; **lep** *m* paw; **xilas kirin** to be saved; **muhlet** *f* grace period; **gerek** (+ past conditional) was supposed to; **teslîm kirin** to turn in; **nexwe** otherwise; **derb** *f* blow.

³**ha hatin** they were coming; **zar û zêç** household; **namûs** *f* womenfolk; **ling** *f* foot; **hiştin (hêl)** to leave.

⁴**sivik** light; **dan hev** to put together; **deqe** *f* minute; **boxçe** *f* bundle; **livîn** *m* bed; **sindoq** *f* box; **firaq** *m* dishes; **giran** heavy.

READINGS

îndî geş bûbûn, diçirîsîn. Carna yek ji wan difiriya û ciyê xwe diguhart. Me ji wan re digot stêrkên bi dûv. Pîrika min digot, stêrk zarokên ezman in. Ew jî dimirin, dikenin, şa dibin û dizewicin.¹

Belê, em di bin perda tarî de dimeşyan. Ne haya mirovan, ne jî haya stêrkan ji me hebû. Stêrk di kêf û sefa xwe de bûn. Destê eskerên tirkan nedigihîşte wan. Tîrsa wan jî tu kesî, ji tu quwetî tune bû. Min xwaziya xwe bi wan tanî.²

Em berjêrê newalê bûn. Newal devê xwe wek dêwekî vekiribû. Carna em kaş dibûn, diterpilîn, diketin. Giya, sitirî, kevir li ber çavên me dibûn wek lawuran, wek cinan. Ji me tirê ku me di jiyana xwe de vê newalê nedibû. Lê rûyê tarîtiyê sar e, nexweş e. Di tarîtiyê de qeza û bela tim dikarin bên serê yekî. Mezinên me beredayî negotibûn, pişta xwe nedin mirovên tarî. Yanî mirovên durû, bêbest û zalim...³

Em li dû hev rêz bûbûn. Apo ketibû peşî. Ji nişka ve hestek çirîsî. Em veceniqîn û me xwe avête erdê. Apo bi hesta xwe bersiva wan da û ji me re got:

—Metirsin. Heval in. Ewê alîkariya me bikin û wê bi me re werin.⁴

Çar kes bûn. Bi çek û rext bûn. Yek ji wan Bêrîvanê da pişta xwe. Ên din bi destên birayê min girtin û em meşyan.

Destê min û ê birayê min Azad di nav destê ev de bû. Em ji newalê derbas bûbûn û me dabû qûntara çiyê. A rastî me nizanibû, em bi ku da diçin. Apo ji me re tişteke negotibû. Min bi dengê nizam ji Azad re got:⁵

—Bîra te tê Azad? Te dît bavo carna digot, ezê hefteyek bikevim binê erdê.

Azad kenîya û bersiva min da:

¹**tarî** dark; **giranî** *f* heaviness; **perde** *f* curtain; **hay** *f* awareness; **stêrk** *f* star; **firiyan** to fly away; **dûv** *m* tail; **zewicîn** to get married.

²**meşyan** to walk; **kêf û sefa** pleasure; **xweziya xwe anîn bi** to put one's hope in.

³**berjêrê** down (prep.); **newal** *f* valley; **dêw** demon; **kaş bûn** to fall backwards; **terpilîn** to roll; **giya** plants; **sitirî** *m* thorn; **kevir** *m* stone; **lawur** wild animal; **cin** genie; **tarîfî** *f* darkness; **sar** cold; **qeza û bela** misfortune, calamity; **tim** always; **durû** hypocritical; **bêbest** uncontrollable; **zalim** tyrannical.

⁴**heste** *f* lighter; **çirîsîn** to flicker; **ve-ceniqîn** to be startled.

⁵**rext** *m* cartridge belt; **qûntar** *f* foot of a mountain; **nizam** low.

KURMANJI KURDISH

—Çawa nayê bîra min, Hêlîn. Ji me ku bavo bi rastî diket binê erdê. Ez nizanim vî navî çima bi kar tînin. Em jî îşev ketine binê erdê, wek bavo. Ma ne wusa ye?

Belê, rast e, min got. Tiştên ku bi dizî tîn çêkirin, dibin tiştên binê erdê. Ger ku binê erdê tunebûya, kes nikaribû, kes nikaribû di ber ordiya Tirkan bida. Dê bila di vê tarîtiyê de werin. Wele newêrin ji qula xwe derkevin.¹

Apo û hevalên din bi peyva min û Azad kenyan. Dengê me çûbû wan. Apê min destê xwe danî ser piştê min û got:

—Aferîn ji we re. Ji vêga ve hûn pirr tişt hîn bûne. Îşê ordiya tirkan zor e. Bi milyonan zarokên me şiyar dibin û wê tola me bistînin. Dawiya çiyar, newalan nedihat. Êş ketibûn lingên me. Di me de taqet nemabû. Berê ku dinya gewr bibe, em ber derê şikeftê sekinîn. Berqa zerînê ketibû rûyê ezmên. Roj hêdf hêdf serê xwe bilind dikir û çiyar dixist bin hikma xwe. Apê min û du kes çûn nava şikeftê. Devê şikeftê di giya, qamiş u qirşan de mabû. Em li serê çiyakî pirr bilind bûn. Rojê xwe nêzê me diketina rojê, rûyê me geş kir. Daran sî da, kevir beriqîn. Tabîet ji xew şiyar bû. Dengê zarokên tabîetê dahl û deviyar, newalan, qulan, şikeftan tijî kir...²

Piştê qontrolê em ketin zikê şikeftê. Apê min elektrîka desta pê xist. Hevalan ji derve hinek qirş anîn, di torbên wan de her tişt hebû. Nan, penîr, şekir, çay. Apo çaydanê danî ser agir. Em li dora tifkê kom bûn, nava şikeftê honik bû. Zarokên me ketibûn xewê. Haya wan ji dinyayê tunebû. Belkî jî, di xewna xwe de bavo didîtin. Dadê, şûşên çayê danî ber me û penîr hûr kir. Çay dem digirt. Ji birçîna ûze-ûza zikê me bû. Piştê hewqas rêveçûnê, zikê me dest bi îsyane kiribû. Dadê, şûşan tijî kir. Me bi zilikan çayên xwe li hev dan, ji nişka ve apê min li piştê xwe zivirî û elektrîkê da kûraniya şikeftê. Şewqa elektrîkê zikê şikeftê qul kir; tarîti qelişî, paş de çû. Marekî gewr wek stûnekî devê xwe vekiribû û pifîni dikir. Li ber marê dûpişkekî reş û xurt dûvê xwe dabû ser piştê xwe û dilebitî. Herdu rawir wek neyarên hezarsalî êrîşê hev dikirin. Çekên xwe yê bi jahr û tehlûke

¹bi dizî in secret; **ordu** *f* army; **bila** (optative particle); **wêrîn** to dare; **qul** *f* hole.

²aferîn **ji...re** good for; **ji vêga re** now; **îş** *f* job; **şiyar bûn** to wake up; **taqet** endurance; **gewr** whitish; **berq** *f* lightning; **zer** yellow; **qamiş** reed; **qirş** stick; **nêz** near; **geş** happy; **sî dan** to cast a shadow; **beriqîn** to glisten; **tabîet** *f* nature; **dahl** *f* grove; **devî** *f* bush.

READINGS

nîşanê hev didan. Nefreta wan mezin bû. Ne hebûna me, ne jî şewqa elektrîkê bala wan dikişand. Qerarê xwe dabûn. Ê yek ji wan bimra. Herhal şikeft têra du rawuran nedikir. Mar radibû hicûmê, xwaroviçko dibû, di nav toz û telazê de dima. Dûpişk bi sivikbûna xwe nediket faqa mare, xwe baş diparast. Em ji tirsal bibûn. Ji me tirê ku hawîrdora me tevde mar û dûpişk in. Apê min berê tivingê dabû wan, tilika wî li ser tetikê bû.¹

Şerê wan dirêj ajot. Dawî mar dûpişk qefiland û wê xiste qunceki asê. Zimanê xwe yê çetel derxist, devê xwe vekir ku dûpişkê gez ke, dûpişk ji nedîve xwe li dîwarê şikeftê xist û xwe avêt ser piştê marê. Serê marê sist bû. Mar ricifî, gevizî, perpitî. Mar xwest bi rê keve. Lê nebû... Dûpişk ser piştê wê xwe bêdeng kiribû û lê mêze dikir. Neyarekî ji xwe mestir û zexmtir kuştibû. Şikeftê êdî jê re mabû.²

Apê min da xencera xwe û bi alî wan de çû. Diya min bi şalê Apo girt û kişand. Qêrîniya wê zikê şikeftê tijî kir.³

— Em ji vir herin, diya min got. Ez pîr ditirsim. Mar û dupişkên vê şikeftê xelas nabin. Ez naxwazim ez û zarokên xwe bibin xwarina mar û dûpişkan.

Apê min Temo kenîya û got:

— Tu dîn bûyî, keçê? Ma ji bo me tu derên bê tehlîke, bê tirs hene? Tehlîka me bi me re ye. Li bîra xwe nebe, em mahkûmê hikûmatê ne. Em gurên serê çiya ne. Ji bo me mar û dûpişk ji eskeran çêtir in. Mar û dûpişk

¹qontrol *f* check; elektrîka desta flashlight; pê xistin to switch on; torbe sack; penîr *m* cheese; çaydan *f* teapot; tîfik *f* hearth; kom bûn to gather; honik cool; ketin xewê to fall asleep; şûşe *f* glass; hûr kirin to crumble; dem girtin to steep; birçîn *f* hunger; ûzeûz *f* rumble; îşyan *f* rebellion; zilik straw; li hev dan to stir; zivîrîn to turn around; şewqa elektrîkê flashlight; qul kirin to pierce; qelişîn to be split; gewr whitish; pifinî kirin to hiss; dûpişk (*f*) scorpion; lebitîn to move about; rawir wild animal; neyar enemy; hezarsalî age-old; êrîş (*m*) kirin to attack; jahr *f* venom; tehlûke danger; nefret *f* hatred; bimra (= bimira) would die; têra ... kirin to hold; hicûm *f* attack; xwaroviçko coiled up; toz û telaz *f* dust; ketin faqa to fall beneath; lal speechless; hawîrdor *f* environment; tilik *f* finger; tetik trigger.

²dirêj ajotin to last long; qefilandin to tire; xistine qunceki asê to corner; çetel *m* fork; kez kirin to bite; ji nedî ve suddenly; ricifîn to tremble; gevizîn to writhe; perpitîn to convulse; mestir (= mezîr) bigger; zexm huge.

³şal *m* trousers; qêrîn *f* scream.

KURMANJI KURDISH

zaf zaf ne ji me çend kesan dikaribin bikujin. Lê esker ger bi me bihesin, yek ji me sax namîne...¹

Apo şûşa xwe teze kir. Serê xwe danî ser destê çepê û dom kir:

—Ma hewqas jî dibe. Agir bi mala min nekeve... Tiştên Xwedê pîrr ecêb in, tu li vî tiştî mêze ke. Dinya tev dijmîne mar û dûpişka ne, ew jî dijminên hev in... Baş e, firqa navbera wan û kurdan çi ye gelo? Ma em jî eynî tişt nakin. Herçar dewletên kolonyalist û nîjadperest dixwazin me ji cîhanê rakin. Ev ne bes e, încâ em jî hevdu dikujin, xelas dikin... Herhal em û maran-dûpişkan pismamê hev in... Kîn û xezeba me li hev çûne...²

Piştê peyva Apo em raketin. Lê ji tîrsa xew nediket çavên min. Çavekî min girtî, ê din vekirî bû. Dadê digot ku, gava rawir hev dikujin, xwediyên wan tîr û termên xwe dibin. Çavê min tim li kûrahiya şikeftê bû...

Em bi dengê helîkopteran rabûn. Ew mar û dûpişkan bi per bûn. Apo xwe li ber devê şikeftê dirêj kiribû û bi dûrebînê li wan mêze dikir. Li gora rewşê ya me ê şer bikira, an jî emê biketana zikê şikeftê û kûr biçûna...³

Roj li ber xatirxwastinê bû, gelî bi gelî, çiya bi çiya rê distand û mehlûl dibû. Quweta wê êdî nedigihîşte çiyayên bilind û sertûj. Çiya hindik hindik, perçe perçe çavê rojê digirtin û xwe ji germa wê azad dikirin.⁴

Roj çû ava. Bakî honik derket. Em hê di şikeftê de bûn. Apo li ber devê şikeftê sekinîbû û li ezmên mêze dikir. Şewqa hîvê devê şikeftê tijî zîv kiribû. Min di jiyana xwe de heya îro tişteki wusa delal, xweşik û rind nedîbû. Di zikê şikeftê de seyra hîvê bê emsal bû. Hebûna hîvê dilê min şa kir. Xem û kulên min, kesera dilê min, di nav hîvê de winda bû. Di bin hîva zîvînê de, çiyayê serê xwe dabûn hevdu û diçirîsîn.⁵

¹**dîn bûn** to go mad; **tu** (+ affirmative verb) any; **gur** wolf; **zaf zaf ne ji me çend kesan** 'not many more than a few of us'; **hesîn bi** to perceive; **sax man** to remain alive.

²**teze kirin** to refresh; **fîrq** *f* difference; **navbera** between; **gelo** I wonder; **kolonyalist** colonialist; **nîjadperest** racist; **bes** enough; **încâ** in that case; **pismam** cousin; **kîn** *f* enmity; **xezeb** *f* rage.

³**ra-keîtin** to sleep; **term** *m* corpse; **kûrahî** *f* depth; **per** *f* side; **dûrebîn** *f* binoculars.

⁴**xatir-xwastin** to bid farewell; **gelî** *m* gorge; **rê standin** to take one's way; **mehlûl bûn** to dissolve; **sertûj** towering; **xwe azad kirin** to free oneself.

⁵**çûn ava** to set; **bakî** = *bayekî*; **hê** still; **şewq** *f* light; **hîv** (= *heyv*) *f* the moon; **zîv**

READINGS

Me haziriya rêwitiyê dikir. Em êdî ne bê dost û yar bûn. Hîv hatibû hewara me. Lê em bi rê neketin. Hîv çiya bi çiya baz dida û diçû. Çiya jî rengê hîvê derdiketin û reş dibûn. Apo carina li me mêze dikir û digot:¹

—Hîv haziriya xwe dika, li ber razanê ye.

Peyva Apo serê min tevlihev kir. Çima gelo? Çi gunê hîvê heye? Bo çî em jî şikeftê dernakevin û naçin?²

Min jî Apo pirsî:

—Apo, em çima naçin?

Apo li min zivirî û bersiv da:

—Hêlîn, keça Apo, ez dizanim tu çî difikirî, lê ez ji te ra çawa bêjim, ma gelo ên ku ji hîvê hez nekin hene? Hîva delal, rind, xweşik, hîv ronahiya dila, sembola evînê ye... Lê çî feyde, Hêlîn... Hikûmeta Tirkan vê hîva delal jî kiriye dijmin û berdaye me. Ew bûye casûsê hikûmetê û me taqîb dike. Di bin ronahiya wê de em nikarin jî şikeftê derên. Ewê esker me bibînin. Dijmin jî me ronahiyê sitandiye û tarîfî bûye dostê me.

Peyva Apo zû kete serê min. Apo rast digot. Hawîrdora me tijî esker û qereqol bû. Esker tim li welatparêzên kurdan digeriyan. Tarîfî dijminê eskeran, dostê me bû, tarîfî me xelas dikir, wana dixwar...³

Ez pirr caran fikirîme, mirov dikare jî diya xwe, bav û birayên xwe bixeyîde, nefret bike. Lê tu caran neketibû bîra min ku ezê rojekê jî hîvê jî nefret bikim. Hîv şahîdê zarokbûna min bû. Li gund çaxê em li ser bana radiketin, min tim lê mêze dikir. Ez aşiqê wê bûm. Min derdê dilê xwe jê re digot û di xew de diçûm. Ez çî bikim, jiyan xerîb e, jiyan zalim e... Ezê hê pirr tişta derbas kim.⁴

m silver; **delal** lovely; **rind** beautiful; **seyr** *f* view; **bê emsal** without equal; **şa kirin** to gladden; **keser** *f* sadness.

¹**hazirî kirin** to make preparations; **rêwitî** *f* journey; **baz dan** to jump.

²**razan** *f* sleep; **tevlîhev kirin** to confuse; **gune** (= *guneh*) *m* fault.

³**casûs** spy; **taqîb kirin** to pursue; **qereqol** police station; **welatparêz** patriot; **xwarin** to devour.

⁴**xeyîdîn ji** to angry with; **nefret kirin ji** to hate; **şahîd** witness; **ban** *m* roof; **aşiqê ... bûn** to be in love with; **xerîb** terrible; **zalim** unjust.

KURMANJI KURDISH

HESENÊ METÊ

*Labîrenta Cinan*¹

—Berdin ha, berdîn! Berdîn, naxir diçe ha!...²

Piştî du sê bawîşkên sibê, mamoste Kevanot bi vî dengê gavanê gund ji nivînan radibe, ber bi pencerê diçe, li dîmena gund dinêre. Nêrgis ji zû ve şiyar bûye, li ser kaniya hewşa dibistanê avê dikişîne û ew jî carina li bergeha vî gundê nû temaşe dike, gundiyan ku dewarên xwe rastî naxirê dikin qîrewîra wan û heywanan li nav hev dikeve, çend keç û bûkên gundî li ser kaniya kêleka dibistanê li hev sekinîne, gavan li berwarê goristana gund dewarên hatî li hev dicivîne û her bi wî dengê xwe î bilind diqîre:³

—Berdin ha, berdîn naxir diçe!

Mamoste Kevanot pencera lojmanê vedike, bayekî payîza pêşîn li ruyê wî dixê û dilxweşiyê bêpîvan di xwe de hîs dike, bi gavên mamosteyekî bextiyar ber bi derê eywanê diçe, şekalên xwe bi ser lingên xwe ve dike, bi bertena pîjamê xwe der dikeve hewşa dibistanê, li ser kaniya dibistanê li dîmena gund, gundî, goristana hember dinêre, mîna ku destpêka jiyaneke bextiyar ji nuha ve bi wî ve xuya bibe, ber bi Nêrgisê dipîşire, li ser rîya kaniya gund, li axpîna tenîştê û di rîya rezan de gundî li hewşa dibistanê dizivirin, dinêrin, ji peyayên gundî hinek ji dûr ve silavê li wî hildidin û bi vî awayî xêrhatinê lê dikin, du jinên gundî dane ser rîya dibistanê û tîn, nêzîktir dibin, tev xwarinên sibê heta ber derê lojmanê tîn, mamoste Kevanot çav li wan dikeve û bi matmayîn dibêje:⁴

—Ev çi ye?... bi Xwedê ev tevgera we naxoş e. Ma qey mala me jî mal e û me jî xwarin û vexwarin heye. Me hamû tiştên xwe bi xwe re hanîne...

—Bila, xoce, bila, dibêjin, xêr û xweşiyê li hatina wan dibarînin û bi van

¹Hesenê Metê, *Labîrenta Cinan* (Istanbul: Avesta, 2000), pp. 23–28.

²**berdîn ha** ‘hey, let [the animals] out’ (the village herdsman is telling the villagers to let their cattle out); **naxir** *f* herd.

³**bawîşk** *f* yawn; **gavan** *m* cowherd; **dîmen** *f* view, sight; **Nêrgis** Kevanot’s wife; **bergeh** *f* view, vista; **berwar** *m* slope; **qîrewîr** *f* cry, shout; **goristan** *f* graveyard.

⁴**lojman** *f* lodging; **bêpîvan** immeasurable; **berten** *f* trousers; **pişir-** to ruminate; **axpîne** *f* field; **matmayîn** *f* astonishment.

READINGS

gotinên xwe re çav li jina wî dikevin, mamoste Kevanot derbasî hêla hundur dibe, hersê jin li hev disekin, li hev dipirsin, xêr û xweşiyê li hev dikin, dû re ew xwarinên sibê di dest Nêrgisê de dimînin û jinên gundî dûrdikevin.¹

Taşê di lojmanê de tê xwarin, mamoste Kevanot xwe tevgirêdide, derdikeve hewşa dibistanê, ro bi sê çar qaman bilind bûye, ji ser sipîndarên kêleka dibistanê, li paş wan sipîndaran ji ser darên Mekanê Mala Dînan, ji dar û kevirên hawurdor dengê çûçikan bilind dibin, ji zeviyên dûr cirecira dengê bihukan tê bihîstinê, ji bilî çend zarokên ku li ber dîwarên hewşên malên gund dilîzin kesek bi ber çavan nakeve, herkes mijûlê karûbarê xwe î payîzê ye.²

Di vê navberê de li paş malên gund, kalekî riyê wî sipî û dirêj daye ser riya dibistanê û ber bi jor tê, her ku ber bi dibistanê tê û nêzîktir dibe, bêtir jî diyar dibe ku kalekî salmezin e, lê di rêveçûnê de ewqasî nade xuyakirin, mîna ku ne ji bo alîkariyê lê tenê ji bo nîşana pîrbûnê gopalekî kevin î xweşik di dest pîremer de ye, hîn ji dûr ve bi dengê salmezinekî silaveke xêrhatinê li mamoste Kevanot dike û nêzîktir dibe, mamoste Kevanot ji hewşa dibistanê derdikeve, diçe destê wî digire û xweşhaliya xwe dibêje, herdu jî li wir li hêla der li ber dîwarê hewşa dibistanê rûdinin, beriya ku bi hev re têkevin galegalan an jî ji bo ku têkevin galegalan mamoste Kevanot bi tevgereke giramgîr berê xwe bi pîremêr de dike û dibê:³

—Navê te bi xêr, sofî?

Pîremêr cî li xwe xweş dike, bi çavekî dostane li mamoste Kevanot dinêre û bêyî ku çavên xwe jê bikute, dibêje:

—Xwedê te bihêle!... navê min Sêvdîn e, Sêvdînê Selîm... ji min re dibêjin, sofî Sêvdîn.

—Navê min jî Kevanot e, sofî.

—Sîtara Xwedê li ser te be!... tu ji kîjan eşîrê î, xoce?

Kevanot bi giramî û bi zanebûna mamosteyekî dibêje:

—Eşîra me ne maye, sofî. Di jiyana bajarvaniyê de pîvanên wusa wenda

¹**barandin** *v.t.* to rain down; **hêl** *f* direction.

²**taş** *m* breakfast; **qam** *f* stature (measurement for the height of the sun); **sipîndar** *f* poplar; **çûçik** *f* bird; **cirecir** *f* talk; **bihuk** insect; **karûbar** *m* work, business.

³**kalek** *m* old man; **salmezin** aged; **galegal** *f* conversation; **giramgîr** respectful; **dibê = dibêje**.

KURMANJI KURDISH

bûne êdî.

Mîna ku sofî Sêvdîn dilê xwe jî bi rewşa îroyîn bişewitîne bi keservedan di ber xwe de dibê:

—Her ku diçe dunya piçûk dibe û civak jî dibe weke nokên tahtê. Dilovaniya dem û dewranê ne maye êdî!¹

Ji bo kêfxweşiya sofî Sêvdîn, mamoste Kevanot dengê xwe jî hinekî bilind dike û dibê:

—Maşallah te gelek sal derbas kirine, sofî.

Sofî bi rûkeniyêke şêrîn lê dinêre, destê xwe î vala davêje riyê xwe î mîna hirî, çavên xwe bi hev de dikute û:

—Êê... dibêje, ez jî kêr ne jiyame. Xwedê baştir dizane... lê bi qasî ku ez dizanim... li vê dunyayê min jî xwe bi qasî sed û bîst salan kevin kiriye...

Mamoste Kevanot:

—Maşallah!... Xwedê jiya te dirêjtir bike, sofî!... dibêje û di dilê xwe de didomîne: “Sed û bîst sal jî ne hindik e.”

Sofî Sêvdîn destê xwe dide ser çogên mamoste Kevanot, ditepîne û dibê:²

—Xwedê te bihêle!... Xwedê jiya te ji ya min dirêjtir bike!

—Maşallah!... tu hîn jî li ser xwe î, sofî.

—Ê... Xwedê bi ya xwe dike. Hertişt di destê wî de ye, dibêje û mîna ku sofî Sêvdîn van gotinên xwe jî bipeyitîne, vê carê destê xwe ber bi goristana hember radike û bi keservedan didomîne: Gelek meriv di pey min re hatin û berî min çûn... çûn û xwe li vê palê ramedandin. Dema bavê min li vir cîwar bû, weke anuha tê bîra min, çend malên Mala Dînan li wê hêla kaniyê, li berwarê vê goristanê hebûn. Miriyê xwe dibirin bi qasî çar werîsan ji malên xwe dîr, di nava daran de dikirine erdê. Ji ser vê kaniyê, heta pişt çiyayê jorîn darên kelberû di nav hev de bûn. Hêla jêrîn jî wusa... nêçirvanekî herî dilêr jî newirî bû bi roj di nav re derbas bibûya. Ev geliyê ha bi daristaneke kûvî hatibû nixumandin. Lê ka?... —herdu destên xwe vedigire

¹sofî Sufî, respectful term for an old man; **sitar** *f* protection; **giramî** *f* respect; **pîvan** *f* criterion; **keservedan** *f* sorrow; **nok** *f* chickpea; **noka tahtê** pebble; **dem û dewran** *m* olden times.

²kêfxweşî *f* comfort; **hirî** *f* wool; **çog = çok**; **tepanandin** *v.t.* to pat.

READINGS

û li dora xwe mêze dike— hemû birîn, kirin erd û hajotin. Bi xêra ruhê pîrozwer re çend dar li vê piştê mane... ne min got, di demên me de dunya mezin û xalî bû. Ciyê herkesî û hertiştî tê de hebû. Meriv dikanîbû bi neviyê neviyê xwe re, li ciyekî, di hewşekî de bijiya. Lê anuha?...¹

Mamoste Kevanot bi çavekî lêkolîner li vî pîremêrî dinêre û dibîne bê çî porê ku bi serê wî ve maye, çî pirça li dora hustuyê wî î qermiçî û çî mûyên li ser zenda wî, giştik jî weke hirîyeke şûstî sipî bûye, mîna ku di qermiçên eniya pîremêr de hunera jiyane, nexşên dîrokê bibîne, di dilê xwe de: “Ser û binê vî gundî, ez ê bikanibim ji vî pîremêrî hîn bibim. Rasterast ferhengek e, ferhengeke dewlemend e” dibêje û bi mereqdarî ji ferhenga dewlemend dipirse:²

—Ma hûn ne ji vî gundî bûn, sofî?

Dema ku pîremêr dibîne guhdarekî dilsoz heye, daxwazeke peyivînê li wî jî radibe ku wan hemû demên xwe yê buhurî rûpel bi rûpel veke, bi xwînegost bike û wan ji nû ve bijî:

—De wê çaxê jî gund tune bû ku... ne min got... Mala Dînan bû. Ew jî bi tevayî çend mal bûn. Dema em ji Serhedan daketin, bavê min çû bû li ser kulavê Sofî Dîno rûniştibû. Sofî Dîno, mezinê wan malan bû. Merivekî saxik û dilpak bû. Tavalê bi bavê min re bû bû destbirak û ne xwestibû ku bavê min bi şûn de derkeve Serhedan.³

Mîna ku tiştê bala mamoste Kevanot bikişîne an jî tiştêkî nû têkeve bîra wî, pîrseke din ji pîremêr dike:

—Ev navê ha... navê Sofî Dîno, kê li wî kiri bû?

Pîremêr herdu destên xwe ber bi jor vedigire û mîna ku bi xwe jî nikani be ji nav derkeve, dibêje:

—Bi Xwedê... di wan deman de em zarok bûn, lê li gor tiştê ku ez dizanim, ev navê ha ne navê wî yê rastîn e. Ji ber tevgerên wî yê nexşîn ji

¹**peyitandin** *v.t.* to prove; **pal** *f* mountainside; **xwe ra-medandin** to lay oneself down; **werîs** *m* rope; **kelberû** wild; **nêçirvan** *m* hunter; **dilêr** intrepid; **wirîn** = **wêrîn**; **kûvî** wild, terrifying.

²**qermiçî** wrinkled; **qermiç** *f* wrinkle; **ser û bin** *m* the “ins and outs,” everything; **bi mereqdarî** with interest, with curiosity.

³**dilsoz** sympathetic; **xwînegost** flesh and blood; **kulav** *m* felt mat; **saxik** honest; **dilpak** pure of heart; **destbirak** blood brother; **serhed** *f* border.

KURMANJI KURDISH

malbata wî hinek rabûn ew bi rengdêra “dînitîyê” navandin û hinekan jî ev rewşa wî weke “sofîtîyê” bi nav kirin. Herweha navê wî jî ma Sofî Dîno. Lê piştî çend nexşên wî, jê tirsîyan, paşîngê li ser vî ruhê pîrozwer ketin dudilîyekê û dû re jî gêhîştin wê baweriyê ku ne merivekî vala ye.

Mereqdarî li mamoste Kevanot tîrtir dibe û dibê:¹

—Sofî, heyran!... li gor nexş û kerametên çawa ev navê ha... ev navê ha li wî kirin?

—Ne min got... di destpêkê de navnotî bi dû ket û digotin: xerîfî ye... Rihma Xwedê li ruhê wî yê pîrozwer be, digotin... de wê çaxê em zarok bûn û me hay ji tiştên weha tune bû... lê digotin, di dawîya jiyana xwe de evîndarê bûka xwe bû bû û ji dû wê venediqetiya. Digotin, wê çaxê kurê wî gelekî şerm kiriye, xwe havêtiye dest û lingên wî ku ew dev ji vî xwiyê xwe berde. Lê ne bûye... ev xwiyê ha ji ser ne çûye. Evîneke asimanî girti bûye ser. Ji ber vê yekê... ji şevan şevreşeke buharê kurê wî ew li hespê kiriye ku bibe Şikefta Zoncikê... meriv nizane ke êdî kurê wî çi fikirîye... lê li gor gotina jina kurê wî, li nêzîkî devê şikeftê du aferîdên seyr hatine pêşîya vî kurê wî û jê re gotine:²

—“Ku tu wî tiştê di dilê xwe de bikî, em ê tiliyên xwe di çavên te re bikin!” Xwedê dizane bê êdî çi di dilê kurê wî de bûya... Wê şevê kurê wî bavê xwe bi şûn de tîne malê û herdu jî dikevin nivînên nexweşiyê. Û di wê şevê de, di wê nexweşiyê de kurê wî radibe vê bûyerê ji jina xwe re kat dike û bi destê sibê re jî dimire. Amentubîllah, karê Xwedê nexşîn e!... Dema şênîyên van çend malan cendekê kurê wî hılanîn, Sofî Dîno di nivînan de bû. Ji xwe heta ku mir jî ji nivînan ranebû. Rasterast sê mehên dawîya jiyana xwe di nivînan de buhurand. Di ber mirinê de... De îcar çi mirin bûye, Xwedêyo!... Mirineke asêwarî! Em wê çaxê zarok bûn... bavê min—rihma Xwedê li hemû miriyan, li wî jî be!—bavê min wê çaxê li paş serê wî bûye. Çêlî mirina wî dikir û digot:³

¹nexşîn miraculous; rengdêr *f* description, quality; nexş miracle; paşîngê later; tîr dense, dark.

²heyran amazing; keramet saintly miracle; navnotî *f* notoriety; xerîfî senile; havêtin = avêtin; xwî *m* habit, disposition; asimanî heavenly; şevreş *f* dark night; aferîde *m* creature; seyr strange.

³ku unless; kat kirin to divulge; amentubîllah “I believe in God,” an exclamation

READINGS

“—Bayekî eyûbî lê rabû bú.” Li gor gotinên ku bavê min digot, Sofî Dîno rabûye kincên xwe çirandiye, xwe deverû havêtiye erdê, mîna Eyûb î pêxember wî jî gotiye:

“—Ez jî kezeba diya xwe şilfûtazî çêbûm û divê ez şilfûtazî jî vegerime wir!” Wek ku min got, dûre jî gelek şirove hatin kirin û gotin: Ev ruhê ha, ruhekî asimanî ye.¹

Reading Selections in Cyrillic-Script Kurmanji

„Зэрдэшт П’ехэмбэр“

Ә’бдылр’ан’ман Дур’ә

P’îa T’әзә, чаршәм 11-е сентйабре сала 1996-а

Бәле, жь к’ома гәле Урал Алт’әйе—„Т’урани“—п’ехэмбәр р’анәбунә. Шаманизм нав ванда һәбуйә, кә әв жи сәрбазити у п’арсәкти у шалузъти, п’утп’әрәсти (тотемизм) буйә. Дәрвеш у п’арсәктие сәхтәк’ар ицат кьрьнә, пе гәл хапандьнә, п’ьртука ви жи т’өнә. Ле дине Ари у Самйан һәқ бунә. П’ьртуке ванә пироз һәбунә, һ’име ван жи сәр т’әвһ’иде (йәкитийа хвәде) бунә.

Ола Зэрдәшт п’ехэмбәр жи ль сәр ви һ’ими (т’әвһиде) буйә, Йәздан (хвәде) Әһрәман хөльқандйә. Шәр’, нәп’аки у тарити дәсте Әһрәман буйә; хер, қәнщи у р’онайи жи дәсте Йәздан буйә. Чава кә ола Муса п’ехэмбәр, Иса у Мәһ’әмәд п’ехэмбәрда жи „хвәде, шәйт’ан у мьлйак’әт (фьриштә) хөльқинә, қәнщи у п’аки дайә дәсте мьлйак’әта, хьраби у нәр’ьнди жи дайә дәсте шәйт’ан.“

Һьм „Т’әврәта“ Муса, һьм жи „Qöрана“ Мәһ’әмәд п’ехэмбәр п’ьр’тыште хвә жь Авәста Зэрдәшт п’ехэмбәр гьртьнә. (Жь хвә дине т’әвһиде у һәқ һеманда вәк һәвһь. Жь һәв иһьам гьртьнә, чьмки сәрканийа ван йәкә).

Ола Зэрдәштда щотк’ари, һ’әйванәтхвәикьрьн у хәбат ибадәтен

tion; **şênî** *pl* people, residents; **asêwarî** untimely; **rihm** *f* mercy; **çêlfî kirin** to talk about.

¹**bayekî eyûbî** Job-like turn; **xwe deverû avêtine erdê** to throw oneself face down on the ground; **kezeb** *f* womb; **şilfûtazî** “buck naked.”

KURMANJI KURDISH

мэзын у гърингын.

„Авэста“ жь сэд бэндайэ (фэслайэ), гэлэк щийада ширэте шотк’ари у Һ’эйванэтхвэйкьрыне дьдэ. Һ’этани гэле к’өрд у фарьз сэр ола Зэрдэшт бунэ. Пышти кё ола исламе пешда Һат э’рэба Иран у К’өрдстан вэргьртын (зэвткьрын), бь зоре, кёштгыне, бьр’ин у қэт’ле дине Зэрдэшт т’алан кьрын, дине исламе ль щие ви данин. Бона ола исламе бь Һ’эзара к’өрд кёштгын, дин зоре бь ван данэ қэбулкьрыне. Т’эне ездийа дэст жь дине Зэрдэшт бэр нэдан. Бэле, мёсёлмана тыште нэбинайи анин сэре ван, Һ’этани Һа жи тиньн сэре ван.

Иро жи эв дэвлэте, кё дьбежын эм мёсёлманьн, бь наве мёсёлмантисе к’өрд кьрынэ к’олэ у бьндэсте хвэ, зёлме тиньн сэре ван, р’астисе эв нэ мёсёлманьн, ле мьнафьр у сэхтэк’арын. Мэһ’эмэд п’ехэмбэр дьбежэ: „К’и кё хвэр’а чь бьхвазэ эве жь бре хвэйэ дьнр’а нэхвазэ, эв нэ мёсёлманэ.“ Дэвлэте, кё наве ван мёсёлманьн, жь хвэр’а азади, сэрхвэбун, дэвлэт у Һ’өкөмэт хвэстын у чекьрын. Ле йэке жь ван к’өрдар’а эв Һэд нэхвэстын у эв нэдане, сэрда жи дьбежын: „Эм мёсёлманьн, бре Һэвьн.“ Р’астисе эв нэ мёсёлманьн у нэ жи бре мэнэ; мьнафьр у дөр’унэ, дьжмынэ гэле к’өрд, азади у сэрхвэбуна винэ, мафе вийэ инсани у демократики т’алан кьрынэ (зоре же стэндьнэ), Һала дьбежын эм мёсёлманьн.

Дэма қэт’ла Һ’элэбщэда щвина ван дэвлэте мёсёлман дэрбаз бу. Йэке жь ван алик’арийа к’өрда нэкьр, наве ван нэани сэр зьмане хвэйи п’ис. Һ’эмуйа алик’арийа Сэддаме т’эрэс у қэшмэр кьрын. Ле вэхта Сэддам дак’өта К’өвэйт’е, бу зьр’тэ-зьр’т у ч’эвкэ-ч’эвка ван мёсёлмане қэшмэр бона нэфт’е.

Гэле к’өрд иди Һ’ышйар у занэйэ. Бь ван т’эрха нахапэ, занэ, кё эв нэ мёсёлманьн, бьр’а дькьн, сэхтэк’ар, қэшмэр у зальмын. Бь наве дин у братийа дин мэ дьхапиньн, дөр’ути у нэп’акисе дькьн.

„К’өрд у К’өрдстан“

Р’ийа Т’ээз, чаршэм 25-е февралэ сала 1998-а

К’өрд (хвэ нав дькьн—к’өрд, көрманщ) жьмэ’тэкэ Асия Пешэ лапэ қэдимийэ. Эт’ногенеза к’өрда у т’ариха сазбуна дэвлэте ван жь к’урайа дэврана те, дьа р’аст жь 3 Һ’эзар салийа бэри қөр’на мэ, вэхта

READINGS

ль Месопатамиае (К'ордстана башур) бажар-дэвлэта Аратае Һатьбу сазкьрыне. У пашвэхтие жи к'орда нэ щарэке бь щур'ед башқэ-башқэ дэвлэта хвэ вэчекьрын, ле бь мэ'ниед башқэ-башқэ дэвлэтед вана батмиш дьбун. Жь вана йа лапэ нав у дэнг дэвлэта к'орда йэ Мидиа-ейэ (қөр'на VII–V бэри дэврана мэ). К'орд Һа Һ'имли ль Т'урк'иае, Иране, Ирақе, Суриае—сэр т'опраха К'ордстана т'арихи у өса жи чэнд вэлэтед майинда дьминьн. К'орд щара пешьн жь дэстпека қөрна XIX Һатнэ сэр т'опраха империа Ур'ьсете. Анэгори эсэред пэймана Гөлстанейэ сала 1813-а у өса жи пэймана Т'урк'менчаейэ сала 1828-а кө синоре ур'ьса-фарьза у ур'ьса-т'ьрк'айэ т'эзэ Һатэ к'ьвшкьрыне, п'арэкэ к'орда, кө жь Һена бэреда сэр ван т'опраха дьма, к'этэ нава т'эшкила дэвлэта Ур'ьсете у бь р'эзэдыли бажарвания Һе қэбул кьр.

К'орд Һ'эсаб дьбьн щьмэ'та Р'оьлэата Незик у Орт'эйэ щи у дьк'эвьн нава к'омэкэ р'аса Һьндавропие. Бьнэщийа к'орда йэ т'арихи Һ'эсаб дьбэ Месопатамиа у нэ'иед К'ордстана иройинэ майин.

Р'уе Һе йэкеда, вэки К'ордстан чэндьк-чэнд щара к'этьйэ бьн дэрба зэвтчийа у Һатьйэ п'арэвэкрьне, Һа к'орд сэр т'опраха чэнд дэвлэта—Т'урк'иае, Суриае, Ирақе, Иране—дьжин. П'арэвэкрьна К'ордстанейэ ахьрие, кө Һатэ чарп'аркьрыне, анэгори пэймана Лозанейэ сала 1923-а қэвьми.

Р'эқэма к'ордайэ т'омэри дьгьижэ вэкэ 40 миллион мэрьва. П'ьр'анийа к'орда Һа жи сэр щи-мьск'энед хвэйэ қэдими дьжин. Р'эқэма вана ль Т'уркиае 20 миллионэ, ль Иране 9 миллион, ль Ирақе 5,5 миллион, ль Суриае 1,5 миллион мэри. Сэр т'опраха Т'фақа Шеврейэ бэре вэкэ миллионэк к'орд дьжин, жь миллионэки Һнэки зедэтьр вэлэтед Авропаеда дьжин.

П'ьр'анийа к'орда бь дине хвэва мөсөллмане сөнинэ, ле эва йэка набэ Һ'им, вэки к'орда Һ'эсабкьн чава бред т'ьрк'айэ дине Эллаь.

К'орд, кө бнэлиед Р'оьлэата Низикэ бьнэщинэ у йэк сеанийа бнэлиед Т'урк'иае зедэтьрын, бь Һэқи чэнд дэьсалийа пьрса сазкьрына дэвлэта хвэ датиньнэ бэр Һ'өкөмэта Т'урк'иае, дэвлэт, дак'отана к'ижане иди чэндьк-чэнд щара сэр т'опраха К'ордстана бакур Һатйэ миасэркьрыне. Мэьа гөлана сала 1992-а ль К'ордстана башур (Ирақ) паши бжартьнед мэщльсе у Һ'өкөмэте дэрьэқа сазкьрына дэвлэта

KURMANJI KURDISH

к'орда-э'рба йә федеративда говәка Ирақеда ыатә э'ламкырьне.

Сәр т'опраха Т'фақа Шеврейә бәре жи гыли дьчә дәрһәқа дасәкь-нандына қәза К'ордстанейә автономда, к'ижан хьлазия салад 20-и бы т'әшкила нән'иед К'әлбәщәре, Лачине, Кубатлие, Зангелане у Щәб-раилейә Азербещана Шевреда һәбу.

Мәхсус готи бьднә к'ыьше, вәки п'ьр'анийа к'орда сәр т'опраха Т'урк'иае у вәлатед щинар компакт дьжин, у чава жоре ыатә готыне, т'ө щара мьләте кемжьмар нинә. Ле һ'өкөмәта Т'урк'иае әва иди 70 сала зедәтырә әве политикае у стратегия йәкмләткырьне дьмәшинә, кә жь алие һ'имдаре дәвләта т'ьрк'а К'әмал Ат'ат'рк'да ыатйә қрар-кырьне. Паши қыр'а әрмәнийә с. 1915-йә ә'йан лы Т'урк'иае нава 74 салада (с.с. 1920–1994) дө милиона зедәтыр к'орд ыатынә кәштыне.

Лозунга „Т'урк'иаеда гәрәке т'әне т'ьрк' бьжин, мьләте майин вәлетда ныкарын һәбьн!“ һ'але эт'нополитикие лы р'егине бәрк' сәрткыр. Стратегия эт'нососиалие, кә һ'өкөмәта Т'урк'иае дьмәшинә, к'ижане ныкари һ'әсаб нәки чава қыр'а к'ордайә нәп'әрдәкыри, ахырие гиһандә қыр'а т'әмамийа мьләтед Т'урк'иаейә майин. Қыр'а вана гыиштйә сәр дәрәща палитика Р'еспублика Т'ур'киаейә р'әсми. Мәсәла ве йәкейә қыр'кырьна к'орда, әрмәнийа, һуна, суриайа, бьл-г'арайә вәһ'ишти, кә алие т'ьрк'ада бы сәдсалийа те миасәркырьне.

Бона анализа проблема к'ордайә эт'ногеополитикие пьрсед щивар-буна қәвате вәлатед мәзын у к'ара ванайә геополитикие нава вә'де орт'а қөр'нед XIX у XX һ'әвшә азөр'укырьнейә. Шәр'к'арийа бенав-бьр'и бы т'әвгәлийа ШАЙ, Ур'ьсете, Франсиае, Алманияе, Британия Мәзын у Т'урк'иае лы Р'оьллате нав чәнд қөр'нада гиһандйә пешда-к'ышандына проблема дәрһәқа хәрита Р'оьллата Незикда у Орт'әйә геополитикиейә т'әзә, пьрс, кә иро гәләки фәрз у актуалә.

Фактора һ'имлийә сәрәкә бона сафикырьна пьрса к'орда, т'ә'лә-бәхтр'а, һ'әтани һа жи нае һ'әсабе чава к'ара Ур'ьсетейә геополити-кие, ле һ'әсаб дьбә чава к'ар у мәрәме Британия Мәзын у ШАЙ. Р'ожа иройин, гәрәке бьднә к'ыьше, т'ә'бийа Федерасиа Ур'ьсете Р'оьллата Незик у Орт'әда дьһия мөсөлманиеда гәләки сьстбуйә.

Сәрбуна пьрса к'ордайә глобал р'уе вәлгәр'андына һ'өкөмәтейә сала 1980-и пешда ыат, кә бу мә'һия гөһастына стратегия у тактика Партия

READINGS

К'аркәрен К'өрдстанейә р'адикал, к'ижан сала 1978-а һатыйә сазкырьне у сәроке к'ижане Ә'бдөлләһ Ошаланә.

Ч'ир'ока дәрһәқа ва готи „тер'оризма к'өрда“, кө т'ьрк' бәла дькын, бу һ'име политикие бона дәстпекырьна конфликта ләшкәрийә сала 1997-а ль нәһ'ийа Ирақейә автономийа к'өрда, жь синоре к'ижане гьва к'өрд „ә'мәлед тер'ористие“ миасәр дькын.

Ле р'асти ләшкәре т'ьрк'а политика тер'оризма дәвләте һындава к'өрдада дьмәшиньн.

Т'ә'бийа вәлатед мәзын һындава агрессия т'ьрк'айә әшкәрдә дьминә нә'фә'мкыри у нә нәзики ақыла. НАТО, кө Т'урк'иае һ'әсаб дькә чава форпоста хвә ль Р'оһьлата Незик, нет у мәрәме we йә дур-дьреж һәнә, бәре ә'вльн пант'юрк'изме сәр ә'рде Т'фақа Шейрейә бәре бьдә балакырьне у пашәр'ожеда we идеологии ведәре һе бьдә қәвһынкырьне. Гьли бәре ә'вльн дәрһәқа Пышкавказе, Асия Орт'ә, өса жи р'егийонед Федерасия Ур'ьсетейә щинарә майинданә.

Лазьмә мәхсус бьднә к'ьвше, вәки ль алие эт'нополитикиеда К'өрдстан бона Ур'ьсете те һ'әсабе чава мәрт'ал, к'ижан we жь эк'спансия пант'урк'изме хвәй дькә.

Ле политика Федерасия Ур'ьсетейә дәр ниве салед 90-йә дөдада дьа зу шә'дәтие дьдә дәрһәқа бәрбьр'ибуна сәрк'арийа Федерасия Ур'ьсетейә палитикиейә нейтрал һындава проблема к'өрдада. Активбуна ә'мәлед органед Ур'ьсетейә шөхөлед дәр ви алида дькарбу „статус к'воа“ һәйи ль политика Р'оһьлата Незикә орт'әмләтие бь р'адикали бьгөһаста.

Бь һ'әсабьлдана фькре жорготи, дьа башә у бь перспективә сазкырьна т'ьфақа орт'әпар'ламентие, чава ль вәлате дәрә дур, өса жи незик, мәрәме к'ижане буйа пыштгырийа һ'әжа к'өрдайә мләтие-азадарие, өса жи т'әшкылкырьна фонда орт'әмләтие бона хвәйкырьна we һ'әже.

Хенжь we, лазьм те һ'әсабе сазкырьна мәрк'әзе, йане жи вәк'илдарийа һ'әжа к'өрдайә мләтиейә р'әсми ль сәр т'опраха Федерасия Ур'ьсете.

—К'ома эк'сперте бона К'өрдстане
ль р'әх комитейа алие пьрсед гео-

KURMANJI KURDISH

политикиеда йа Дума ФУ дэвлэте.

„Автономия Културие у Шие Хэбате“

(ВАРИАНТЭКЭ ЩАБЭКЭ „ПЪРСА К'ӨРДА“ ЛЬ Т'УРК'ИАЕ ЫАЙЭ)

Нава ван шэш мæфед ахъриед се ы'эзар мъашъред к'өрд нэлегал чунэ Италиае. Ынэк бь гөмана майина хэрт'ьми, ынэк жи бь гөмана бьгыжнэ қәвм-псымамед хвэйэ ль Алманиае.

Ль Европае, анэгори избатиед комисаре Т'МЙ пьрсед мъашърайи сэрэкэ, жь ван мъажьра, ед кө хэрибиеда ывийа р'ожа хвэшьн у гөманьн статуса мъажьра бьстиньн, щие пешьн к'өрд дьгрьн. П'арэкэ вана жь бакура Ираденэ, ле п'ара п'ьр'е жь Т'урк'иаенэ, э'рза к'ижане бона бьк'эвэ нава Т'фақа Европае ниве мæа декабре бь мэ'нийа жь к'өрда „т'эмьзкьрна“ Анатолиа башур-р'оьлэте ыатйэ қэр'мандьне.

Т'урк'иаеда дьбежьн, вэки бал вана „пърса к'өрда“ т'өнэ. Т'эне „пърса тер'оризма к'өрда“ ыэйэ. Вэки майин ы'эму тышт анэгори нормед орг'эмлэтиейэ: нава мэхлуқэтийа Т'урк'иаейэ п'ьр'млэтда 12 миллион к'өрд бь э'дьли дьжин, олк'ед ванэ лапэ п'ьр'р'эқэм ль бажаред Измире у Стэмболеда, кө алие сэнайеда пешдачуйнэ, баш дьжин, ле ль Т'урк'иае, мьнр'а Анкараеда дьготьн, эгэр „р'астие конфликта млэтие ыэбуйа, вэлэтда we зуда шэр'е бажарвание бьқэвь-мийа.“

У диса сэрда зедэ дькьн: „Проблем ван щийа дэстпе дьбьн, ль к'ө р'өб'е шорьше жь дэр те стэндьне, жь ван вэлата, ль к'ө лагеред ыазькьрна тэр'ористед жь Партия К'аркэрен К'өрдстане (ПК'К') щивар бунэ“.

Бэле, проблема к'өрда ыэйэ!— опонентед ванэ жь сепаратистед бавэр дьбежьн. Т'эрэфдаред ПК'К' избатийа қәвмандьна адара сала 1995-а тиньн, вэхта лэшкэрэки т'ьрк'и бь наве Ы'эсэн Данара жь полка ль бажаре Щолэмерке ыешьри шыкле ван ы'эвт шыванед к'өрд чап кьрьбу у бь қимэте 50-100 ы'эзар лираед т'ьрк'а дьфрот, к'ижан бь дэсти командосед т'ьрк'а ыатьбунэ сэржекьрьне, бьн шыклада жи ньвисибун: „Бьра ыэр кэс ызыаньбэ эм чь тиньнэ сэре куч'ька. Эме ыа жи биньнэ сэре ы'эму к'өрда.“

Анкара к'өрда сэр дө п'ара п'ар дькэ—п'арэк ед интеграсиакьринэ,

READINGS

п'арэк жи ед тер'ористьн. Щодаихаз жи сэр we фькрена, wэки һэйэ К'ордстан.— „Wэлате цьмэ'та чьлмилионейэ зеранди у п'епэскьри“. Бона гэлэка, кó к'аши нава ве конфликте бунэ, чава те к'эвше, нэбарьшбун буйэ пьрса һ'өрмэтейэ сэрэкэ, кó оптимизме надэ. Бь гьлики тупикэ. Йане жи дьбэ „мэщалэкэ майин“ һэйэ?

Гэло диwana мэрк'эзие we бькарибэ автономиа административ-териториал бьдэ к'орда? Нькарэ. Чьмки, бэре э'wльн, эве гóмана сепаратизме бькэ дьле сэрэкед млэгед майинэ кемр'эqэм. Йа дóда, эве бьбэ qэwмандьнэкэ т'арихи—йане чийэ мэрэм бь шэр' һатэ дэстанине, демэк тер'ор—мэщала башэ. Йа сьсйа, кó йа сэрэкэйэ, эве бьбэ мэ'нийа п'арэ-п'арэбуна Р'еспублика Т'урк'иае, к'ижане бьбэ р'еаксия зьнщири—бь щур'е конфликтед орт'э-эт'никие у орт'эр'егииналие ль wэлет.

Гэло диwana мэрк'эзие we бькарьбэ конфликта т'эви к'орда пе структураед зоре—лэшкэр у командоса—бьтэмьринэ? Нахер. Шэр' ль башур-р'оьлэте эва иди 13 салэ пешда дьчэ, анэгори һьнек избатие 26 һ'эзар мэри һатьнэ кóштьне, 2500 гóнд wеран бунэ, жь нэһ'иед шэр' wэкэ миллион мьашьр фьрари бажаред мэзын бунэ. Шэр' бэрк' дьмэшэ, ле незики wэкьрна грефутке жи набэ.

Мэсэлэк. Хьлазияа декабре, чава агентиа Р'ейтере э'лам кьрйэ, лэшкэред т'ьрк' паши зэ'икьрна хóрэк бнэлиед гóнде qэза Диарбэк'ре Бенин кьрнэ нава һ'эсаре. Гэла афисерэки жи бь ултимативи готйэ: „Һуне т'эви зар'ед хwэ бьрчина бьмьрн. Һун йан гэрэке жь вьра бь цэ'ньмын кэр'ьн, йане жи Һун гэрэке бь готьна мэ хwэ хwэйкьн“. Бь ве йэкева лэшкэр дьхwазэ мэщала базаед хwэй кьрна ПК'К' бьдэ бьр'ине, к'омед к'ижанайэ силь'ь кьри бь тактика шэр'е партизание у тер'оре бунэ qэwатэкэ т'ам бона лэшкэре Т'урк'иаейэ р'егульйар.

Шэр'е нэтэмьрида хуна һэрдó алиед дьжмын дьк'ьшэ, зрарэкэ мэзын дьгьижэ бнэлиед э'дьли. К'орд мэщбурьн жь зóлма һэрр'ожэ бьр'эвьн у р'эвбэз, мьашьри у хэриби дьбэ п'ара ван у зар'ед ван. Коалисиаед партиае һ'óкóмэтеда бэр һэв тенэ гóһастьне, һ'óкóмэтед т'эзэ тенэ т'эшкилкьрне, ле проблема к'орда ль нэһ'иед wэлетэ башур-р'оьлэте диса дьминэ чава проблемэкэ „кэвн“ у „нэшэбьри“. Гэма мьашьрийа к'орда бэрбь Авропае жь вьра те, нэнььер'и полис ван wаргада р'ейда дькьн, ль к'ó һьнэк бона бь „qачахи“ дэрбазкьрна

KURMANJI KURDISH

мъашьра бэрбь Авропае п'эра чедькьн.

Бь т'еоретики дькарын дэст жь сафикьрына пьрсейэ сильь'кьри бьк'шиньн у дэст бь қәйдәкьрына пьрсейэ политикие бькьн. Ле бь практики иро мәцала ве йәке т'өнә, бона ве йәке лап кем лазьмә, вәки сәрк'аред дәрәщәбльд дэст жь қөльхе бьк'ьшиньн, дәсте к'ижана нава ван 13 салада сәр ч'әке буйә. Нә генералитета т'ьрк'а, нә жи лидеред к'омед сильь'кьри, анәгори логика мәрвевд бь ч'әк, нькарын ве фькрер'а қайил бьн, веки вана дәшта шәр'да данә дәр.

Жь хәбәр дана мьнә т'эви политикзана ль Анкарае эз һатмә сәр ве фькре, вәки вьра р'ола фәрз „фактора вә'дәйә“. Чава щергә вәлатед майиндайә, ль к'ө бона сафикьрына һ'өщәтед идеологие, йане жи сәдър'андьна конфликта чава һасегәһ шашиед нәвсейә бәре у бабахйа политикзанайә нәқәнщ те орте. Ль Т'урк'иае проблема к'орда һынге ве қәйдәр'оже дәрк'әвә, гава бь т'әбийәти сьлсьләт бенә гөһастьне.

Һәла һатьна лидеред формасиа т'эзә жи дькарә бәс нибә бона дитьна формула барьшбуна бажарвание—әгәр һәма ирода дәрһәқа ве йәкеда нәфькьрын, чька чава култура к'ордайә хвәхвәтие хвәйкьн, чава әхтийариед ванә вәкәһәв хвәйкьн, ле өса жи „мобилийа сосиалие“—мәцала дәвләмәнд буне, һазьркьрына қөльхчийа, „к'әгына нава диwane“ бехофкьн.

Идея автономиа културие дәвса дайина автономиа территориал—хвәсәрәкваникьрыне бона щиед жийина к'ордайә компакт Т'урк'иаеда чәгьн те р'ьк'ьнкьрыне. Дора ве идеәе һәла һе машоқ кем дышьвьн. Ве йәке т'әне һьндава сәрк'арәки пар'ламента Т'урк'иае—дәвсгьртие сәрәквәзир у вәзире к'арә дәри бәре Мурат Карайалчьнда дькарын нәбежьн, к'ижани һ'әтани сала 1995-а сәрк'ари Партия сосиал-демократиейә щьмә'тие дькьр.

—Мә һәла һе сала 1973-а програма партия хвәда сазкьрына система һынкьрына к'орда бь змане де, хәбәр данед бь змане к'орди пе р'адио е т'елевизионе, т'әшкылкьрына идаред бь профила културр'онкае тер'а дитьбу, —Мурат Карайалчьн дьбежә.— Готи мәщале бьднә к'орда, вәки әв хвәхвәтиа културие хвәйкьн у изне бьднә вана органед диwane у щийида вәк'илед хвә бьбжерьн. Ви чахи пешданина пешьн инк'ар кьрын. Пешданина дөда ль һәв һат п'ьр'и—һьндьки миасәркьн.

READINGS

Wəхта эз лорд-сэрэке Анкарае бум жь 1993-а шевра бажерда жь 56 депутата wəkə 20-и к'өрд бун.

У пар'ламента млэтиеда р'эqəма к'өрдед бь мандата депутатие чава палитике щер'банди, кō бь ордена ь'окōмəта Франсиаейə легиона сианэтева ьатийə р'əwакьрьне, да к'ьвше жь п'ара сэлəфед бона к'өрда тер'адити зидəтьр бу.

— Ль базаред Стəмболе у Измиреда, кō нə бажаред к'өрданə, ле к'өрд wанда гэлəкьн, навбəйна к'омед этникиеда проблем т'өнэнə. Ль wьр к'өрд т'ам ьатьнə интеграсиакьрьне. Тыштəки майинə Анатолиа башур-р'оььлате. Ле wьра жи нава wə'дəда мəщал ьəйə щōхōл п'акбə, чава мəсəла сьвдəра орт'а Т'урк'иае у Иранеданə, кō ийула сала 1994-а ьатə wəкьрьне, к'ижане мəщал да 400 щиед хəбате бенə сазкьрьне, — Мурат Карайарчьн гьли дькə.

Демəк „пьрса К'өрдстанe“, йане жи „пьрса тер'оризма к'өрда“— чава wi алие сəнгэр'е дьбежьн, чава жи ьəбə йа сафибунейə. Кризиса Өлстере, кō жь ве кризисе нə кемтьрə у к'идəре ьм полтикиа туж ьəйə, ьм фанатизма дин у ьм жи нəбарьшбуна нəвса ьəйə хōлəсə гьшиштə ьена ьатьна р'еалиста. Иро əwana щара пешьн дьщə'диньн qəна бежьн: „Дəма хатьре тə—силь“.

— Владимир Михеев, „Известийа“

Анкара, Москва

АВETИС АЬАРОНЬАН (1866–1948)

[Сəрк'арəки Партия дашнакайи ə'йанə. Сала 1917-а əw сəдре Шевра Əрмəнистанейə Млэтие буйə, ле с. 1919-а сəдре пар'ламента Р'Ə буйə. Гəвр'а-хəбəрданед Константинополисе (с. 1918-а) у конференса П'аризейə ə'дьялаеда əw сəроке делегасиа Əрмəнистане буйə. Пəймана Севреийə ə'дьялае (с. 1920-а) əwi qол кьрийə у т'əвгəле конференсед Лондоне (с. 1921-е) у Лозане (с. 1922–1923-а) буйə. А. Аьароньан хōдане гэлəк шьер у нвисара wəкьрийə. Сəрьатикə wi „Р'зго-Сеп'о“, кō дəрьəqа ə'мре к'өрдаданə, щара ə'wльн бь змане к'өрди те нəшьркьрьне.]

KURMANJI KURDISH

Р'зго-Сеп'о

*Р'згане Р'эцэви жь армэни т'эрицмэ кьр,¹
жь „Р'йа Т'эзэ”, 30-е сентйабре с. 1999*

Мина иро те бира мын, эз көркэки бьч'ук бум, пенщ-шэш сали. Р'ожэкэ баьаре, жь ч'йаед мэ к'өрдэк ьатэ гөнде мэ. Вэкэ ч'йаки бу, бльнд у бь ьэдэм, эждэьэ, зэнде дьреж, п'есирвэкьри у сингп'ьрч, деме зэрин у ч'э'вэ к'ур у ьурэ нэр'эь'эт, чава тэйр—поз мэзын у фьнщ фьрэ. Э'баки риси зэр ле бу, көлаве шьвантие намьле бу, чарьх ньгада, сэри шэ'р'-к'олоз бу, мерэки бистөпенщ—си сали бу, наве ви Р'зго.

Ьат у орт'а гөндда сэкьни. Шьван бу ььлбэт—сэр көлаве шьвантиейи намьлева блура к'өрди дардакьри бу, у дэстда чомахэки нькьлкер' у мэзын, бь дэрбэкэ к'ижанева дькарьбу пышта йэки бышкенанда. Р'зго мерэки ьа бу.

Орт'а гөндда сэкни у пьрс кьр, чька гөнд мот'аще гавен нинэ гэло. Һэма öса пьрси, гьлие хвэ нава ьэведа гот, к'и дьхвазэ бьра сэкэ.

Шьван лазьм нибу, гаван лазьм бу, у гар'ана гөнд спартнэ ви. У ава Р'зго бу гаване гөнде мэ. Эва йэка тыштэки ьақаси садэ бу, вэки чэнд р'оже дьне Р'зго лап ьатэ биркьрне. Тэе ььгота эв ьэма гөнде мэда ьатьбу дьне у гаванэ.

Сьбе зу, бэри дэрк'этына р'оэ эв нава гөндда ньк дьбу, ьэван пыштева гьредайи, блура хвэ ььлдьда у мьраме дьреж ледьхьст. Һ'этани ь'эйван дькьрэ фьшин у жь т'эвла дьфьльтин, гамеш бь гавед фэсал, деме чопьр' у ч'э'вед мьр'уз, мэдэк фэсал у бь гавед зэхм, ч'елэк ь'эмди хвэ, ногьн сьвьк у нэ'с, бог' ьарэьар у голкед нэ'сэ, позкьнэ бь поч'кед ньканди лэзо-бэзо у т'эмам пэй ьэв у ль р'эх ьэв ьэвдö дэ'в дьдан, ьэв бин дькьрын, стрö у поч'ка хвэ ьэв дьхьстын, к'ом-к'ом дььатын, дькьрынэ фьшэ-фьш, дькьрынэ бор'э-бор', р'ез дьбун у бэр ч'э'вед Р'згойи чопьр'р'а дэрбаз дьбун, қасэке гöь дьданэ дэнге блура ви, у паше т'эви гар'ана гэвр дьбун у дьмэшийан. Р'зго бь ь'эваскари дина хвэ дьда ван, эв нэфэре мала ви бун. Дэнге блуре дьсэқьри.

—Һо, ьо, ьо, ьо.

¹For the Armenian original of this story, see Ա. Ահարոնյան, *Ժողովածոի Երկերի*, vol. 10 (Boston, 1951), “Ռեզգո-Սեփոն,” pp. 317–28.

READINGS

Дэнге Р'згойи зиз ньшкева т'эсэлэ дьбу, у гар'ана гэврэ бе сэрöбьн бэрбь чоле р'ез дьбун. Нава дэқиқэкеда т'оза һ'эзар сьма дьбу тэлп у һэр тышт дьньхманд, у Р'зго жи нава we тэлпеда бэга вэдьбу.

У һэр сьбэ бь ви тэһэри. Евара нава т'оза зэрда öндабууйи, диса дькьрэ һорэ-һор, гар'ан пашда дани, паше мал-мал дьгэр'йа, пе чомахе хвэ дэрия дьхьст, гази дькьр:

— Нан биньн, нан!...

Һэр малэке нанэк дьдане, кө эви дькьрэ һэвене у дэрбази мала майин дьбу.

Эw к'ьрия ви бу.

Һэр р'ож ви тэһэри бу, чава кө р'о дэрдьк'эт у р'о дьчу ава.

Дэ'не шэве Р'зго к'идэрер'а дьгьшишт we дэре жи сэре хвэ датани, р'адьза. Гөрзэ гиһа датани бьн сэре хвэ, көлаве шьвантие давитэ сэр хвэ у сэр ханйа, дора тэндур, һ'эwшада э'змен дьньери, р'адьза.

Ль к'ö р'адьза, нане бэрэвкьри жи ль wьр дьшишт, һэла сэрда жи шöхөле we мале дькьр. Эв бу мэ'ни, wэки Р'зго меванэки һэр малэкейи һ'эзкьри бу. Эw эwлэде гөнд бу, гөнд жи гөнде ви бу. Qазанща ви һэбууйа-т'өнэбууйа, пе пэ'ри нан э'бура хвэ дькьр. Еваре харьнэк, шэбэде жи нане турке пыште бьдане бэси ви бу. К'е бу Р'зго, ч'ьр'а һатьбу, жь к'ö бу, жь к'ижан ч'йа у баниа бу к'эсэки же нэдьпьрси. Р'зго хwэхва жи qэт хэбэр нэдьда. Пьрса һэбун-т'өнэбуна ви гөндда пешда нэдьбат, йан дһа р'аст эw нэ эwлэде мэхлуqэтиe бу, эw эндэмэки һ'эйwен бу, хwэхва жи һ'эйwan бу, безар, у хwэй йазйа нээ'йан.

Бона гөнд т'ариха ви дö хэбэр бун т'эне: К'өрде ч'йа... Мерьв т'ьре, р'ожэке нэwалэкеда ч'ие фьрк дабу, qэйа лэqйабу у Р'згое һэма һа э'сабэ,¹ бь зэнде мэзьн у намьл, көлаве шьвантие намьле, чомах дэстда, к'олоз сэри, блура ль п'есире дардакьри һатьбу дьһйа р'оньк, кө хwэ-хва жи һьзаньбу бона чь.

К'өрде ч'ие бу, жь ч'ие хöльqибу, мэхсус бона хwэйкьрьна гар'ана гөнде мэ.

У Р'зго нэ к'эн бэр лева дьк'эт, нэ һерс, нэ хэйд, нэ эшq. Кэр' у лал

¹*E'sabe* has no meaning that can be found in any dictionary; the Armenian original has “like a dragon” here.

KURMANJI KURDISH

бу чава ч'йа.

Щар-щара бьн смелада дькьрә мьртә-мьрт у тә дьгот қәй бежи пе ч'ә'ва сәрк'арие ль н'әйвен-щьмә'та хвәйә бе зар-зман дькьр.

Дора Р'зго э'мр бь шур'е хвә нол дьбу. Мәрьва шәр'к'ари дькьрын, зәһ'мәт дьк'шандьн, қазанц дькьрын, н'ьз дькьрын, дьхөльцин у дьмьрын. Хәма к'өрде ч'ие нибу. Әви гар'ана хвә дьбьрә чоле, дьһатә гөнд у тәе бьгота т'ө тыштәк нә дьдит, нәдьхваст, дьһийаеда т'ө тыштәки нәдьгәр'йа—хенжь блура хвә, дәнге к'ижане дәрк'әтна р'ожер'а т'әсәлә дьбу у пә'ри нан, кә бәр дәрир'а дьдане.

Т'әне ль дәштед дур, гава ч'еләк йане мәдәк дьза, Р'зго гольк давитә сәр мьле хвә, дьһатә гөнд у бь тәһәрәки дәрә хвәйе һәйвен дьһьст. Бь н'ьзкьрынәкә нәбинайи гольк жь сәр мьла пәйа дькьр, чава зар'а хвә, у бь ч'ә'вед бәхтәвар, дәвса к'ән сьмеле ви дьр'щьфин, әви чәнд гьлие хвә дьгот.

—Йәк бьбә н'әзар, хатун, йәк бьбә н'әзар. У we р'оже, we маледа голька т'әзәбуийи н'әмез дькьр у р'адьза.

Р'зго, гаване гөнде мә һа бу.

—2—

Сьфтә чава п'ьстә-п'ьст, паше чава щавәкә р'асти, гөндда бәлабу, гьва Р'зго дьбә хачп'арез...

Гөндда бу шарә'вар, к'әлфәта бәр диwара кьрнә п'ьстә-п'ьст. Пирка дьготьн, гьва Р'зго хәwnәкә ә'щев дитйә, дьготьн гьва п'ехәмбәр хвәхwa һатйә хәwnа ви, хоф кьрия дьле Р'зго—әw чаванә, wәки тә һақас wәхт к'әда хач'парезайә н'әлал дьхwi у беиман дьмини, гьва Р'зго тьрса дьк'әвә ә'рде у дьхәр'ьқә. Wәхта сәр н'ьше хвәда те, дьбәзә бал к'әшиш, ле лава дькә, ви бькә әрмәние хачп'арез, йан на дьтьрсә қәнще Хwәде we диса бе хәwне. Ынәка жи дьготьн, гьва we шәве Ақуб п'ехәмбәр хвәхwa жь Масисе бәржер буйә у Р'зго бь ч'ә'ве хвә әw каләмере р'уанспи дитйә, кә н'әкә сәр ви кьрийә зу бьбә хачп'арез, йане на әwe һәрдә ч'ә'ва корбә. Ынәка жи дьгот, гьва Р'зго шәвәке ль чоле дурва сәр Арагасе агре п'ехәмбәр дитйә.

Р'зго бь хвә чава һәрт'ьм ав һьлдабу дәве хвә, т'әне чәнд щара дитьбун әw чава жь мала к'әшиш дәрдьк'әвә.

READINGS

Ә'йда Хатуна Фәрхан¹ бу, евара бәри ә'йде дeрeдa щи ст'ар т'өнәбу у дина т'әмама ньқткәке бу—стуна р'асте, ль к'ө мерәки бәжнбьльнд пышта хвә дабуיע сәкьнибу. Р'зго бу...

Йабание бәдбәхт, жь ишьҫе, шыклед мьляк'әта, хәмла т'әхтә, льбасед к'әшиш, к'лама зур бубу у нава ви ь'алида стөхар, хвә қыңцьландьбу сәр һәв, щие хвәда дышәwши, хвә дыда сәр ви ньги йан ньге майин у худана ә'няя хвә т'әмьз дыкьр. Дерeдa һәв дычун-дыһатьн. Пирька хач дәрдыхьст, мера бәр ве ә'щеве бь хоф һәв дыньерин. Ынәка дыкьрнә п'ьстә-п'ьст, зар'ока бь ч'ә'ве к'ән пе т'ьляа к'өрде ч'йа нишан дыдан, кө жь ве хьрынгеле дыа бәр хвә дык'әт, хвә дықыңцьланд, дыщә'данд нәе к'ьвше, әгәр илащ һәбә бәта вәбә у нава ви ь'алида дыа бәрбьч'әв дык'әт у дыбу пек'әни...

...Сьбәтрье, лә'де, ь'әйата дерeдa Р'зго дыкьрнә хачп'арез. Т'әмамыа гөнд ьльшыабу вра—дәрзи бавитана нәдык'әтә ә'рде.

...К'әшиш ав сәре Р'зго кьр, мер'он ә'няя ви хьст, наве ви жи дани Степ'анос.

Р'зго бу әрмәние хачп'арез—Степ'анос.

...Wәхта ә'рәфат хьлаз бу, щьмә'т һеди-һеди бәла бу.

—Тыштәки бадьльәванә, к'өрде ч'йа набә әрмәни, Т'атосе Авропис гот...

—Һь, тә диса дәст пекьр, Авропис—Садо вәгәрьяа сәр—ч'ьр'а набә, к'өрд нә мәрийә, р'өһ'е ви т'өнә?

—Һәйә, һәма к'өрд к'өрдә, әрмәни жи әрмәни... К'өрд ч'ежке гөранә, ч'ә'ве ви ль ч'йа у мешанә...

—Дә әме бьньерьн, ве әрмәники жь тә четьр же дәрк'әвә, Садо гот.

Щьмә'т бәла бу.

—3—

Ә'мре Р'згода т'ө тышт нәһатә гөһастьне.

Р'зго бу Степ'анос—Степ'анос жи бу Сеп'о. Р'зго-Сеп'о мина бәре бәрбанга сьбеда нава гөндда дысәкьни, блуре дыхьст, дәвар бәрәв дыкьр

¹In the original this is the Feast of the Mother of God, August 15th. The translator has substituted a Yazidi female saint, usually called Xatûna Fexre, who is invoked in cases of difficult childbirth.

KURMANJI KURDISH

у бәре хвә дыда чолә, еварә вәдыгәр'ыйа, маләкеда сәре хвә датани, р'адьза. Ә'рәфата, кӧ Р'зго бу хачп'арез һатә биркьрьне, гӧнд диса к'әтә т'әфәк'урийа мал-һ'але хвә.

Сал дәрбаз бун.

У щарәке, еварәкә баһаре, гава нава гӧндда т'ьжә мәри бун, һ'акьм у к'әшиш р'уньшьтбун, қсә дыкьрын, Р'зго-Сеп'о т'әви гар'ана хвә паш-да һат, у нә мина бәре, нава щьмә'та орт'а гӧндда сәкәни.

К'ӧрдәки әхтийар жь ч'ие һатьбу у бәре пәнир анибу нава гӧндда дыфрот.

Сеп'о незьки к'ӧрдә әхтийар бу, хвә да сәр чомәхе хвә у дыреж-дыреж ви һьери.

У нышкева бь дәнгәки зор кьрә қарин.

—Һәй һу, әв тойи, Һ'әсоә дьжмын? Тойи... Хвәдә тӧ анийи пешйа мын, дә'w һәйә әм сафикьн.

Гӧндйа бь ә'щәбмайи дора һәрдӧ дьжмына гьртьн.

К'ӧрдә әхтийар р'абу сәр хвә, хвә да сәр чомәхе хвә у пышта хвә да дивер у фәсала хвә һьери.

—Чь дә'w? әви һ'әмди хвә гот.

—Чь дә'w? Тә бир кьр, Һ'әсо, тә бавә мын кӧшт, бавә мын. Әва дән салә әз пәй тә к'әтымә, мын бәр дайка хвә ад-қрар кьрийә, хуна бавә хвә ә'рдә нәһельм.

—Бәлә, һәқә, мын кӧштйә, каләмер бь һ'әмди хвә щаб да у чомәхе хвә һ'ышк дәсте хвәда гьрт.

—Бәлә, һәқә, әре? Дә вәрә мәйданә, жь бәр дивер дур к'әвә, мина мера вәрә мәйданә, чомәхәк дәсте тәданә, йәк жи дәсте мында, йәк мә гәрәке сәре хвә дайнә.

Сеп'о иди т'ӧнәбу, Р'зго һ'ышйар бубу, к'ӧрдә ч'ие бь һерса хвәйә бәйанива. Әw жь һерса дыләрзы, дыкьрә мьрин, дычу-дыһат; у жь ч'ә'ва агьр дып'әкйа, мина пльнге, кӧ дыхвәзә банздә. У әви кӧлаве пышта хвә кәwки кьр, чомәх бльнд кьр.

—Дә р'абә, вәрә мәйданә, тә бавә мын кӧштйә, мын соз дайә дайка хвә, әм дьжмыне һәвһн.

Р'әнг ль калә чубу, жь дивер дур нәдык'әт у щьмә'те дыһьери.

READINGS

— Өз калым. Тө шаһли.

— Дәрба пешьн йа тэйә, тө лехә. Ыь дьтьрси, к'эвтаре нәмәрд?

У жь ьерса т'эмамайя бәдәна хwәва Р'зго дьләрзы, дьлке ви ледьхьст, дьчу дьһат, чомахе хwә дьбьр тани.

Гөндийа э'щербмайи т'эмаша ви шәр'е беисаф дькьр.

Кәсәки хәбәр нәдыда, т'эмам кәр' бун, т'әне дәнге Р'зго у ь'илкә-ь'илка ви дьһат.

— Һайде, мина э'гита wәрә мәйдане, йәкә тө жь дәсте мьн хьлаз наби.

— Сеп'о, лао, чь тә qәwьмийә? к'әшиш готе.

— Хундаре хуна әде мьнә, баво щан, готи шабе бьдә.

— Сеп'о, көр'е мьн, әw бәр тә нә хундарә.

— Wәй, әви әде мьн көштйә, әде мьн.

— Әw әде Р'зго бу, тө Сеп'ойи, иди Р'зго нини, тө хуне гәрәке нәрежи, тө әрмәние хачп'арези.

Сеп'о р'ьсас бу,¹ ч'ә'вед вийә бь хун бәләнгаз бун.

— Кәко щан, дәсте тә р'адьмусьм. Өз Сеп'омә, баш; әрмәние хачп'арезьм, баш; әв дер шә'дә, п'ехәмбәр шә'дә, әви мерьки баве мьн көштйә. Мьн бәр дйа хwә ад-qrар кьрйә. Дйа мьне горедә ньфьр'а мьн бькә.

— Ньфьр'а к'өрда нәгьийжә әрмәние хачп'арез. Әрмәние хачп'арез гәрәке бьбахшина, инцил өса дьбежә.

— Ле дьжмьне мьн саг'-сьламәт ьәр'ә?

— Бәле, саг'-сьламәт гәрәке бьһелә ьәр'ә.

— П'ехәмбәр чь бьгота?

— П'ехәмбәр жи өса дьбежә, гәрәке бьбахшини дьжмьне хwә, дәсте ви хунеданә, е тә мер'он кьрйә, готи т'әмьз бьмина, саләке-дөда бьжинәжи, дәсте хwә хуна вида нәкә.

— Wәй ль мьн баво, wәй ль мьн баво, Р'зго кьрә искә-иск. Һәр'ә, Һ'әсо, бой хатре П'ехәмбәр, ьәр'ә бой хатре ви әхтийари, ьәр'ә. Кале барә хwә бәрәв кьр у ләз чу.

¹The Armenian text has “stunned” here.

KURMANJI KURDISH

— Һь вә дит? — Т'атосе Авропис гот — к'өрд набә әрмәни.

— Авропис, бәлки тө вәймиш¹ нәби, к'әшиш готе.

— Щики майин р'асти ви бә, we бькөжә. Илапи, әв ч'ежке гөранә. Сәр сәре гөр иншил хвандьн; гөр гот, зу бькьн: пәз жь ч'ие дәрбаз бу — Т'атосе Авропис гот.

— 4 —

Чава һәрщар, һавина we сале диса баг'ед мә бь р'эзава бол бу. Дьз у қачах жи зедә бубун.

Т'ьрк у к'өрдед дьз фәсал мә бьр'ибун. Шәв т'өнәбу, вәки нәк'этана баг'-бостане йәки. Һәр кәси хвә нькарьбу шәве жь т'әсәлйа бостане хвә бькьра, әв жи паши шөхөл-ә'мәле р'ожейи гьран. У паши һәр дьзи-т'аланәки гөнди бәр хвә дьк'әтьн, һерс дьк'әтьн у мәщал дьә'фьрандьн, ле ч'арә нәдьбу. Ар'ане нәщар баг'е хвәйи трие гьйишти т'әне бона we йәке к'оква р'акьр, вәки көр'е ви шәве т'әсәлйа бег' нәкьн у зьраре нәбиньн. Гөнди ащьз у һерск'әти бун. У ван р'ожед ащьзаеда щарәке, һьзаньм чава, П'аносе Совике р'о нава нивро дьзәк гьрт, ани. Жьнәкә к'өрд бу. Ед майин р'әвибун; әв пирьк к'әра хвәва мабу.

Пирькәке гот вәки әве баг'чә т'алан дькьр.

Дьз гьртьбун, анинә нава гөнд. Гөнди бәрәв бун.

Әв һерса т'омәри, кө һ'әвтйа бәрәв бубу, сәр ве к'өлфәта бәдбәхт натә р'етьне. Гөнди сәр һәвр'а дьчун, к'е пер'а дьгьһанд ч'ер' дькьре.

— Гәрәке сәре we бышкеньн.

— Сахә-сах ч'әлкьн.

— Стунева гьредьн, бьра һ'ышкбә.

— Хернәдие! Бавежьнә голе, бьра бьхәньрә.

У щур'е щәза дьгәр'йан.

Пирьк ль р'әх к'әре хвә сәкьнибу у we қалмәқалме дьньһери, тәе бьгота гьли дәрһәқа йазйа веда нибу.

Т'атосе Авропис һат.

¹The meaning of *weymîş* has not been ascertained. In the original the priest says to T'atos, who begins everything he says with the word 'particularly' (which is omitted from the translation), "Curse your 'particularly's'!"

READINGS

—Эв дйа Сеп'о нибэ? Ёь щьмэ'т, иди гун гивйа чьнэ? Гази к'эшиш кьн, бьра we жи бькэ эрмэни, дэвса йэки дё эрмэни хэбьн. Жьна Садое зутьрэке бьмьрэ, эме бьднэ Садо.

У бей қрара т'омэри незик бу у пиьинэк авитэ пире. Газьра ч'э'в данэ ве гава беисаф, хэрчар алыава лехьстьн, пира мэ'рьм нава дэст-п'йада нэдьхатэ к'ьвше.

—Wэй эз көштъм, эз көштъм—пире кьрэ қирин у к'эт. У ньшкева дуринакэ майин т'эсэлэ бу, ор'инэкэ зор.

—У мьн ньзамчие вэ... К'эшиш к'ойэ, к'эшиш? П'ехэмбэре чь бьгота...

Р'зго бу...

Мина зйаки, хвэ орт'а назьрар'а кьр, гьиштэ к'олфэта пир, жь щи р'акьр у хвэ да бэр.

—Дьзэ—жь хэрчар алыа готьн—Сеп'о, дьзэ.

—Сеп'о? Чь Сеп'о? Эз Сеп'омэ, йан Р'зго? Эгэр Р'згомэ, ле хуна баве мьн чава бу? Эгэр Сеп'омэ, эве пира бехвайи ч'ьр'а дькөжьн? Дьзийа ве жь хуна баве мьн четьрэ? Wэй ль мьн баво, wэй ль мьн баво. Хофэк к'этэ дьле назьра.

—П'ехэмбэр к'ойэ, пьрса мьн хэйэ ахьр. Эз Р'згомэ, йан Сеп'о, хуна баве мьн чава бу? Бахшандьн т'эне бона вийэ, п'ехэмбэре чь бьгота, ай эрмэние хачп'арез?

Газьр кэр'-лал пашда вэк'ьшйан. Шэв бу. Р'зго т'эви ве пире нава гөндда т'эне мабу.

У нава к'учед тэ'ри, т'эви пира к'отайи у бриндар дьчу мала к'эшиш.

Пьрса ви хэбу...

К'т'ебед Тэ'зэ

„К'өрдстана Башур Иро“

жь „Р'йа Т'эзэ“ № 2, 25-е февралэ (сьбате) с. 1998-а

Бь ве сэрнвисаре сала 1997-а бажаре Москваеда бь змане ур'ьси бэрэвокэк нэшьр буйэ. Қьнийатед ве бэрэвокеда чапбуйи эw докладьн, кө декабра сала 1996-а симпозиума Москваейэ өлмида хатьнэ хвэндьне. Симпозиум жь алие сектора к'өрдзание йа академия Ур'ьсетейэ

KURMANJI KURDISH

өлма у Мәрк'эза изгәр'иед к'өрдида һатъбу т'әшкилкьрьне. Т'эви хэбата симпозиуме бубун өлмдар—к'өрдзанед э'йан, т'арихзан у экономист—п'ешэкзанед р'егиона Р'оһьлата Незик у өса жи жур'на-лист у палитикзанед к'өрд.

Бәрәвокеда т'эмамыйа аспектед проблема К'өрдстана Ираце тенә азөр'укьрьне. Бәрәвок бь мқала сәроке лабораториа изгәр'иед к'өрди йа института академия Ур'ьсетейә өлмайә р'оһьлатзание, професор М. Лазаревва дәстпе дьбә. Мқала ви, кө те навкьрьне „К'өрдстана башур нава т'арих у палитикаеда" дәрһәқа этапед т'ариха К'өрдстана Ираце-йә сәдсалийә 20-данә, кө бь бәрбьр'ибуна бәрбь қәвмандьнед ироинва те азөр'укьрьне.

Мқала сәроке Мәрк'эза изгәр'иед к'өрди, академик Шәкрое Хөдо дәрһәқа ван вәгөһастьнед политикиеданә, кө паши конфликта дәвтәнга Фарьза салед 1990-1991-е ль К'өрдстана башур қәвьминә.

Професор М. Гасрат'йан мқала хвәйә „Т'урк'иа у қәвмандьнед К'өрдстана башур"-да дәрһәқа ван қәвмандьнед негативда дьнвисә, кө Т'урк'иае данийә пешйә хвә у бь we йәкева һ'өкөми сәр қәвмандьнед ве р'егионе дькә, мәрәме к'ижане к'уркьрьна конфликта орт'а к'өрда-данә.

Мқалед О. Жигалинае у А. Шәриф палитика Иранейә р'әсми анализ дькьн, кө һьндава қәвмандьнед К'өрдстана Иранеда те мәшандьне. Ван мқалада өса жи т'ә'бигьртъна лидеред партиаед көрдед Иране һьндава конфликта орт'а ПК'Д у ЙНК' те нишан дайине.

Р'. Сәбри у А. Баг'иров мқалед хвәда палитика у т'ә'бигьртъна Суриае у вәлатед э'рәбайә майин анализ дькьн, кө һьмбәри К'өрдстана Ираце те мәшандьне.

С. Шаһбазйан мқала хвәда һ'имли сәр конфликта орт'а һөрдө партиаед К'өрдстана башур лапә мөзън—ПК'Д у ЙНК' дьсәкьнә. Ве мқаледа әв бь объективи мә'ниед we конфликте у пәйһатъна вейә негатив дьдә к'ьвше.

Мқала професор Шәрәфе Әшър дәрһәқа we палитика вәлатед Р'оавае у Ур'ьсетеданә, кө салед 90-и ве р'егионеда те мәшандьне у һ'өкөме we палитикае сәр шәр'к'арийә щьмә'та к'өрдайә мләтие-азадарие.

READINGS

Бавэр бьки т'эмамия мқала бь обйэктиви хатьнэ нъвисаре у we йэкэва h'əwask'арьн, wэки хөдане ван бь фьрэти хьм сэрканиед Ур'ьсете у к'өрда, хьм жи сэрканиед wэлатед дэрэкэ данэ хэбате.

Машоqed т'ариха щьмэ'га к'өрда у wэлатед Р'оһьлата Незик бь сайа ве бэрэвоке дькарьн щаба гэлэк пьрса бьстинын.

Reading Selections in Arabic-Script Kurmanji

CELADET ALI BEDIR-XAN (1893–1951)

Hawar (Sal 1, Hejmar 19: Duşemb 17 Nîsan 1933)¹

کرد و کردستان
بچافی بیانیان

Kurd û Kurdistan
Bi Çavê Biyaniyan

Fünf Fortrage über den Islam

(Leipzig: 1912)²

كرد امن، کردستان ولاتی می به. بشی نشی ام
خوه و ولاتی خوه ژ هر کسی، ژ بیانیان بیتر
و چیتر ناس دکن. کتکتین هر گند، عشیر و
بازاری خوه وک هندی بیک شالی خوه
دناسن. د ناف مه ده مروقین ولی ههه، دکارن
زر و زنارین چیا و سرژورک و سرژیرکین بلند
جهین ولاتی خوه ژ بر بزمیرن.

Kurd em in. Kurdistan welatê me ye.
Bivê nevê, em xwe û welatê xwe ji
herkesê, ji biyaniyan bêtir û çêtir nas
dikin. Kitkitên her gund, eşîr û
bajarê xwe wek hundirê bêrika şalê
xwe dinasin. Di nav me de mirovên
welê hene, dikarin zer û zinarên çiya
û serjerek û serjêrekên bilindihên
welatê xwe ji ber bijmêrin.

¹ Jeladet Ali Bedir-Khan's article is reproduced here as it appeared in *Hawar* in both Latin and Arabic scripts. The Latin-script version has been edited only in that in the first year of publication 'q' was used for the modern 'k' and 'k' was used for the modern 'q.' Thereafter modern orthography was adapted. The title of this article in the original is "Qurd û Qurdistan...." For more information on Bedir-Khan, see www.celadet.de.

² Martin Hartmann (1851–1919), *Fünf Vorträge über den Islam* (Leipzig: Otto Wigand, 1912).

KURMANJI KURDISH

دگل فی هندی هن تشتین ولاتی مه ههه کو
 ام خوه بخوه نکارن وان ببین، هیژ بیتر نکارن
 ژ هف دربخین، لسر فبن.

Digel vê hindê hin tiştên welatê
 me hene ko em xwe bi xwe, nikarin
 wan bibînin, hêj bêtir nikarin wan ji
 hev derêxînin, û liser vebin.

هرکس هندی مالا خوه ژ خلکی چیت ناس
 دکه. لی بیانی وکی دکشن ناف مالکی ژ
 خوه بی بیتر قنجی و کیانی بین وی دبین، ژ
 بر کو او ژ بونا دیتن و سحرکری هاتنه و
 تیکته.

Her kes hundirê mala xwe ji xelkê
 çêtir nas dike. Lê biyanî wekê dike-
 vin nav malekê ji xweyîyî bêtir qen-
 cî û kêmaniyên wê dibînin. Ji ber ko
 ew ji bona dîtîna û seh kirinê hatine û
 têketine.

لی ام کو ژ خوه تیده نه و چاقین مه لی هین
 بونه، رند بالا خوه نادن، ل دیوار و بانین خوه
 نانهیرن. بتهیرن ژی نکارن وک خلکی بیانی
 ببین. ژیره چاقین دن دفت. ژ هیلا دن دیتنا
 قنجی و کیانی بین ولات و ملتکی نه تشتکی
 هیسانی یه. ژ وان ره، ژ دیتنا وان ره مروفتن
 زانا و پسپورن کرکن. نمازه پسپورن بیانی، دا
 کو هر تشتی بی آلیکاری و میلباری ببین و
 بیژن.

Lê em ko ji xwe têde ne û çavên
 me lê hîn bûne, rind bala xwe nadin,
 li dîwar û banên xwe nanihêrin. Bi-
 nihêrin jî, nikarin wek xelkê biyanî
 bibînin. Jê re çavinen din divêt.¹ Ji
 hêla din dîtina qencî û kêmaniyên
 welat û miletekî ne tiştêkî hêsanî ye.
 Ji wan re ji dîtina wan re mirovînen
 zana û pisporin gerek in. Nemaze
 pisporinen biyanî, da ko her tiştî bê
 alîkarî û meyardarî bibînin û bibêjin.

گلك مبن ژی هن بیانی ههه کو هاتنه، كتنه
 ناف ولاتی مه، لی تماشا کرنه، کیم وزیده هینی
 زمانی مه بونه و د حتی مه ده کتینن تشساندنه.

Gelek mebin jî hin biyanî hene ko
 hatine, ketine nav welatê me, lê te-
 maşa kirine, kêmaniyên hînî zmanê
 me bûne û di hekê me de kitêbin
 nivisandine.

کتیبین ولی د هر ژمانی آوروپایی ده ههه،
 روسی، المانی، فرانسزی، انگلیزی، تالیانی
 ه.پ...

Kitêbînen welê di her zmanê
 ewrûpayî de hene, rûsî, elmanî, fren-
 sizî, inglîzî, talyanî h.p.

من دل هیه، ژ وان کتیبان برن بکیر ورگرینم
 کُردمانجی بی و د فان ستوان ده بلاف بکم.

Mîn dil heye, ji wan kitêban biri-
 nen bikêr wergerînim kurdmançiyê û
 di van stûnan de belav bikim.

¹ Bedir-Khan often uses the old literary third-person singular ending *-êt* and *-it* for the modern *-ê* and *-e*; thus *divêt* for the modern *divê* and *bit* for the modern *be*.

READINGS

هیه کو او بیانی بین ها جارنان د علیی مه ده ژێ گوت و تھیساندین. ژ خوه پیرانی یا وان د لیبی مه ده گوتنه و میلادارییا مه کرنه. هرچی ژێ بت هر دو تخلیت نفیسار بکیرمه تین. بین کو علیمدارییا مه کرنه—هکه نه غرزکاری یه—کیانی بین مه شانی مه ددن. ام بوان کمانی بین خوه د عدلیین. ب ئین دن کو د لیبی مه ده هاتنه نفیساندن، ملین خوه ئین رند ناس دکن و خوه بخوه قدری خوه دزانن. هکه مرووف بخوه قدری خوه ناگرت نک توکسی بقدر نابت. بلی اف ناڤ د مه د دن.

د ورگردانی ده بریز و تاریخی فه ناچم. هرچی کو دکفن دستی من و بکیری مه تین ازی وان ورگردیم کردمانجی بی و هیدی هیدی بلاڤ بکم.

ازی وان ب آواکی ولی ورگردیم کردمانجی بی کو مانا رند بیتی سخ کرن و قسه هرچند هیه، او چند گرداندی ببت. نه کو پیرسان یکو یکو ورگردیم کردمانجی بی و نشتکی ولی بیم پی کو پرس کردمانجی لی آوا بیانی ببت.

ژ ملی دن، د زمانی مه ده بردیلکا هر پرسی هیژ نه هاتییه دیتن و هشدو دانین، ژ لورا د محجتي ده ازی آوایی هن قسان لیکورا پرسین مه بکیریم، ژ هڤ فقتینم و پیش و پاش بکم. لی ژیره نه کیم نه ژێ زیده دکم. ازی بالا خوه

Heye ko ew biyanîyên ha carinan di eleyhê me da jî got û nivisandî bin. Ji xwe piraniya wan di lêhê me de gotine û meydariya me kirine. Herçi jî bit¹ her du texlît nivîsar bi kêrî me tîn. Yên ko eleyhdariya me kirine—heke ne xerezkarî ye—kêmanîyên me şanî me didin. Em bi wan kêmanîyên xwe diedilînin. Bi ên din ko di lêhê me de hatine nivîsandin, milên xwe ên rind nas dikin û xwe bi xwe qedrê xwe dizanin. Heke mirov bi xwe qedrê xwe nagirit nik tukesî biqedr nabit. Belê ev, nav di me didin.

Di wergerandinê de bi rêz û tarîxê ve naçim. Herçi ko dikevin destê min û bi kêrî me tîn ezê wan wergerînim kurdmançiyê û hêdî hêdî belav bikim.

Ezê wan bi awakî welê wergerînim ko mana rind bête seh kirin û qise herçend heye, ewçend kurdandî bibit, ne ko pirsan yeko yeko wergerînim kurdmançiyê û tiştêkî welê bînim pê ko pirs kurdmançî lê awa biyanî bibit.

Ji milê din, di zmanê me de berdelka her pirsê hêj ne hatiye dîtin û hevedudanîn. Ji lewra di mehcetê de ezê awayê hin qisan li gora pirsên me biguhêrînim, ji hev veqetînim û pêş û paş bikim. Lê jê re ne kêmanîyên me jî zêde dikim. Ezê bala xwe bidim

¹ See note above.

KURMANJI KURDISH

بدم کو قستا شیسە فان و گیانی شیساری وکە
خوہ هەلینم و وکە خوہ بدم زانین.

ko qesta nivîsevan û giyanê nivîsarê
weke xwe hilînim û weke xwe bidim
zanîn.

ازی ب شیسارکە کورت لی هیزا دستپی بکم:
چند خیز ژ مارتن هارتمان.

Ezê bi nivîsareke kurt lê hêja dest
pê bikim: çend xêz ji Marten Hart-
man.

هارتمان زانایهکی آلمانە. د ئاف کردستانی دە
گریایه، هینی زمانی مه بویه. کتیکه وی هیه،
(بوطان)، کتیکه هیژا و کور. هر وکی ژ وی
کتیبی خویا دبه هارتمان لهر تشتی ولاتی مه
هور میزه کریه. من او کتیب ل گرمانیایی دیت
و خوهندبو. لی ایرو نه بن ره یه.

Hartman zanayekî elman e. Di nav
Kurdistanê de geriyaye, hîmî zmanê
me bûye. Kitêbeke wî heye, «Bo-
tan», kitêbeke hêja û kûr. Herwekî ji
wê kitêbê xuya dibe Hartman li her
tiştê welatê me hûr mêze kiriye. Min
ew kitêb li Germanyayê dît û xwendî
bû. Lê îrû ne bi min re ye.

لیگورا بهیستنا من هارتمان موزینا خانی
وردگراند المانی بی، لی عمری وی تیر نه کر.
پاش کو چند روپلین وی ورگراندبون چو
رحمتی.

Li gora bihîstina min Hartman
Memozîna Xanî werdigerand elma-
niyê, lê emrê wî têr nekir. Paş ko
çend rûpelên wê wergerandi bûn çû
rehmetê.

خیزین ژیرین ژ کتیکه ری هاتنه گرتن. ناخی
کتیبی (بینج گوتار لیسر اسلامی) یه. د لیچگی
ده د سالا ۱۹۱۲ ده هاتیه چاپ کرن.

Xêzên jêrîn ji kitêbeke wî hatine
girtin. Navê kitêbê (Pênc gotar liser
islamê) ye. Di Leypiçigê de di sala
1912de hatiye çapkirin.

«روپل ۱۳۵—هکه د قلمروی عثمانیان ده
پیشقه کتنکه مانوی و خورت بیته پی، آفا ها
ژ ئاف وان ملتین مسلمان دی دستپی بکت
کو نه ترکنژادن. اف ملتین ها هرچند لترکان
راسر بین ژی هتا نهو بندستی یا وان کرنه. د
ئاف وان ملستان ده مروف دکارت ارنوود،
عرب و کردان بزمیرت.

«Rûpel 135—Heke di qelemrewê
Osmaniyan de pêşveketineke mane-
wî û xurt bête pê, eva ha ji nav wan
miletên misilman dê dest pê bikit ko
ne tirknijad in. Ev milletên ha her-
çend li tirkan raser bibin jî heta niho
bindestiya wan kirine. Di nav wan
miletan de mirov dikarit Ernewid,
Ereb û Kurdan bijmêrit.

READINGS

روپل ۱۳۷— وکی از دِ ناف ملتین کولِ چاندا اورویایی تینه ورگراندن ناڤی کردان ژی هلددم، دزائم کو پی بکتم پیشبری بریری یکه دژوار.

بلی هشکاهییا عادتین کردان ناسه. ژ آلی پی دن تیتته گوتن کو کُرد ژ زورکرن و نژدی ره میلدارن و ژ آشی و راحتی پی درفن.¹

دگل فی هندی هرچی ریوی یین کو دناف وان ده گریانه ب یکدنگی وسفین وان دانه و گوتنه کو کُرد دناف قانککه هشک ده شانی حساسیتکه کور و زراف ددن. ژ ملی دن ب گُهای یا گلکی شیساران تته زانین کو کُرد د توژ زیرکی یا طبیعی، زویبری و د دایینا حکم و قرارین راست ده ژی نه کیمن.

کُرد دِ نافرا عربی هیچ و لڤوک، د تیکهشتی ده پلنز، شیت و خاسوک و ترکی ترال، دِ رامانی ده تنبل کو بدشواری هینی ژینا جفاتی دبه، تیپی ناڤینه.

کُرد پسمامکی عجمان ئی راستینه. لی آو ب تیکلبونا برکی مزن ژ خوینا ترکان ل خوینا وی و سر باوری یین تصوفی، وک پسمای خوه خراب نه بویه. خوه پاک و زندی هلا نیه.

Rûpel 137—Wekê ez di nav miletên ko li çanda ewrûpayî têne wergerandin navê kurdan jî hildidim, dizanim ko pê bikevim pêşberê berberiyê dijwar.

Belê hişkahiya adetên kurdan nas e. Ji aliyê din têtê gotin ko kurd ji zorkirin û nijdê re meyildar in û ji aşî û rahetiyê direvin.¹

Digel vê hindê herçî rêwiyên ko di nav wan de geriyane bi yekdengî wesfên wan dane û gotine ko kurd di nav qalikeke hişk de şanî hesasiyeteke kûr û zirav didin. Ji milê din bi guvahiya gelekî nivîsaran têtê zanîn ko kurd di tûj zêrekiya tebîî, zûbîrbîrî û di dayîna hikm û qerarên rast de jî ne kê in.

Kurd di navbera erebê hêç û livok, di têgehîştinê de bilez, şîr û xasûk; û tirkê tiral, di ramanê de tenbel ko bi dişwarî hînî jiyîna civatê dibe, tîpê navîn e.

Kurd pismamekî eceman ê rastîn e. Lê ew bi têkilbûna birekî mezin ji xwîna tirkan li xwîna wî û bi baweriyên tesewifî, wek pismamê xwe xerab ne bûye, xwe pak û zindî hilaniye.

¹ خبر وی یه. ما ام بخوه نابیزن: شر ژ بطلایی چیتره. (هاوار)

Xebera wî ye. Ma em bi xwe nabêjin: Şer ji betaliyê çêtir e. (Hawar)

KURMANJI KURDISH

ههکه أف ملتی ها، روژکی، مروقی راستین
پیدا کر ب خورقی و زخمییا خوه و ب فینا کو
خوه ل چاندا دنیایی آ ایرو دی ورگرینه،
دنیایی ثندا عجیبایی دی بهیله.

Heke ev miletê ha, rûjkê, mirovê
rastîn peyda kir bi xurtî û zexmiya
xwe û bi vênâ ko xwe li çanda din-
yayê a îrû dê wergerîne, dinyayê
tevda ecêbmayî dê bihêle.

ژ خوه بی شکه کو ژ بونا زمانی خوه ئی
رنگین و گلکی نگاردار؛ ئو ژ حکمی زمانی
بیانیان پاکهلانی حرفین لاتینی ژی دی قبول
بکت.

Ji xwe bê şik e ko ji bona zmanê
xwe ê rengîn û gelekî nigardar, û ji
hikmê zmanê biyaniyan pakhilanî
herfên latîni jî dê qebûl bikit.»

ههکه بریانی و بریژی بین هارتمان هیژ ثندا نه
چوین ژی سری، افچند هییه کو ام ایرو زمانی
خوه ئی رنگین بحرفین لاتینی دثیسین.
ج. ع. بدرخان

Heke berbînî û berbêjiyên Hart-
man hêj tevda ne çû bin jî serî, ev-
çend heyê ko em îrû zmanê xwe ê
rengîn bi herfên latîni dinivîsîn.
Celadet Ali Bedir-Xan

«Şêx Evdirehmanê Garisî Çû Rehmetê»

«شیخ عقد رحمانی گارسی چو رحمتی»

Hawar (Sal 1, Hejmar 11, Pêncşemb 10 Çiriya-Paşê 1932)

شین...شین...شین...هر در رش نه ما
هشین. دل بکل، جان بکسر، چاف بکرین.

Şîn...şîn...şîn...her der reş, ne ma
heşîn. Dil bi kul, can bi keser, çav bi
girîn.

بانگ دان، شیخ عقد رحمانی گارسی نه ما،
هاتبو خیری، چو رحمتی...

Bang dan, Şêx Evdirehmanê Gari-
sî ne ma, hati bû xêrê, çû rehmetê...

هری شیخ عقد رحمانی گارسی رهنییا چافین
کردستانی، گرمیا دلین کردین قنچ، ب دو
برکین بی بخت، دست ژ مه کشاند و چو. بو
شهیدی دین و ملتی خوه، قربانا آرمانجا خوه.

Herê Şêx Evdirehmanê Garisî,
ruhniya çavên Kurdistanê, germiya
dilên kurdên Qenc, bi du berikên
bêbext, dest ji me kişand û çû. Bû
şehîdê dîn û miletê xwe, qurbana
armanca xwe.

READINGS

هری ب بی بختی هاته کشتن، ژ خوه ویکدن کشتنا وی نین بو. ب میرانی نهدهاته کشتن. ل پی وی کلک گرها بون. او میرین قنچ پیدا نه دبون، نه دهاتن دیتن کو بکفن پیشیا وی، دور لی بگرن، پی ببرزن و وی بگرن.

Herê bi bêbextî hate kuştin. Ji xwe wekîdin kuştina wî nîn bû. Bi mêra-nî ne dihate kuştin. Li pey wî gelek geriha bûn. Ew mêrên Qenc peyda ne dibûn, ne dihatin dîtin ko bikevin pêşiya wî, dor lê bigirin, pê biberizin û wî bikujin.

ژیره، ژ کشتنا وی ره آن بی بختی، آن برککی خیلکی دقبابو. آن نه، وک مروفکی عادی، د ناڤ شینا خوه ده دی بریایا.

Jê re, ji kuştina wî re an bêbextî an berikekî xêlkî diviya bû. An ne, wek mirovekî adetî, di nav nivîna xwe de dê bimiriyaya.

مرنا د ناڤ جهمان، نه مرنا وی بو. حیفا خوه دی ژیره دهات، پی قائل ندبو کو أف میری ب هر تشتی خوه، ب دین، ب زاین، ب دستی خوه قنچ، د ناڤ جهمان ده وک مروفکی عادی ب بای آن ب تایی بیلشینت و د پی ره قاصدی خوه فریکت و امانتی خوه ژیره بستینت. عقد رحمان نه سته لحو.

Mirina di nav cihan, ne mirina wî bû. Heyfa xwedê jî jê re dihat, pê qail ne dibû ko ev mêrê bi her tiştê xwe bi dîn, bi zanîn, bi destê xwe qenc, di nav cihan de wek mirovekî adetî bi bayê an bi tayê biêşnît û di pey re qasidê xwe verêkit û emanetê xwe jê bistînit. Evdirehman ne stelih bû.

ژیره قاتلک ژ ناڤ مالی، گولکی مالی دقبابو کو بی ترس و لرز بکفه بن پاشلاوی، هره دستین وی و ولی وی بده بر تفنگ و خنجری.

Jê re qatilek ji nav malê, golikê malê diviya bû ko bê tirs û lerz bikeve bin paşila wî, here destên wî û welê wî bide ber tîfing û xencerê.

هکه دار خراب دبه کرمی وی ژیره یه. ژ خوه کرمی داری ژ داری مبهت، دار تجار خراب نابت.

Heke dar xirab dibe, kurmê wê jê ye. Ji xwe kurmê darê ji darê mebit dar tuçar xirab nabit.

ولی ژیره بو. دنیا ل شیخی مه بو بو هیشار. روژ چوبو آقا، هقالین وی ژیره دور کتبون، او ب خلامکی خوه فه د نینگگی گندکی ده ل هیقییا قاصدکی دما.

Welê jî bû. Dinya li Şêxê me bû bû hêvar. Roj çû bû ava, hevalên wî jê dûr keti bûn, ew bi xulamekî xwe ve di nîzingî gundekî de li hêviya qasidekî dima.

KURMANJI KURDISH

هنگورا ششی دست ب کتنی کرپو. دما نیژی
ژی هاتبو. د بر وان ره آفک دهرکی. شیخی
دلال خوه قهالت، تشنگا خوه دا خلای خوه
کت پیشی بی، بر ب آفی شه دچو.

Hingûra şevê dest bi ketinê kiri
bû. Dema nimêjê jî hati bû. Di ber
wan re avek diherikî. Şêxê delal xwe
vemalt, tîfînga xwe da xulamê xwe,
ket pêşiyê, ber bi avê ve diçû.

خلای وی، ژ پار را، او دا بر تشنگی. درب
لی کت، شیخ ل خنجرا خوه خبتی و لی
زفری، دریکه دن سینگا وی قل کر.

Xulamê wî, jî par re, ew da ber
tîfîngê. Derb lê ket, şêx li xencera
xwe xebitî û lê zivirî, derbeke din
singa wî qul kir.

خلام، یکی سعرق ب ناخی نجمو، سری
شیخی خوه ب خنجرا وی ژیکر و بر دژمنان.
هری ب خنجرا شیخی خوه، ژ بر کو یا خوه
د سینگا وی ره کرپو.

Xulam, yekî Seirtî bi navê Necmo,
serê şêxê xwe bi xencera wî jêkir û
bir dijminan. Herê bi xencera şêxê
xwe, jî ber ko ya xwe di singa wî re
kiri bû.

نجمو هاته خلات کرن. ام ژی پیره،
هورانیکی رش بو خلاتا مه.

Necmo hate xelat kirin. Em jî pê-
re, hewraniyekî reş bû xelata me.

هری بانگ دان، شیخ عشد رحمان نه ما، ژ
بونا خدمتا ملتی خوه زا بو، ژ بونا وی ژی مر.

Herê bang dan, Şêx Evdîrehman
ne ma, jî bona xidmeta mîletê xwe
za bû, jî bona wê jî mir.

نزامی ازی چاوان بکارم وصف و پسنی بدم.
شیخ عشد رحمان ژ وان مروقان بو کو دی بین
دنیا بی کیم د زکین خوه ده گرانده.

Nizanim ezê çawan bikarim wesf
û pesnê wî bidim. Şêx Evdîrehman jî
wan mirovan bû ko dêyên dinyayê
kêm di zikên xwe de gerandine.

شیخ بو، ملا بو، سیدا بو، میر و میر خاص
بو. شیخ بو، خدان طریقت، مریدین وی لی
وک پیخمبرک دنهیرتن.

Şex bû, mela bû, seyda bû, mêr û
mêrxas bû. Şêx bû, xwedan terîqet,
merîdên wî lê wek pêxemberekî di-
nihêrtin.

ملا و سیدا بو. د مذهبی شافعی بی ده
زاناک زور بو. اسلامیت وکه خوه ناس دکر و
د دا ناسکرن. ژی نه مووک کیم دکر، نه ژی
وک ملایین دن — ژ بونا قشارتتا نه زانیا خوه و
شیلاندا خلکی — لی زیده دکر.

Mela û seyda bû. Di mezhebê şafi-
iyê de zanakî zor bû. Islamiyet weke
xwe nas dikir û dida nas kirin. Jê ne
mûwek kêr dikir, ne jî wek mela-
yên din, jî bona veşartina nezaniya
xwe û şêlandina xelkî, lê zêde dikir.

READINGS

هرچند مروفي آخرتي بو، او چنډ ژي مروفي دنيابي، مروفي نووښي و پيششه کتني بو. ناف د خلکي ددا کو بخوين، هر تشتي هين بن. پراڼيا فقهيڼ وي ب حرفين لاتيني ژي دزاني بون.

Herçend mirovê axiretê bû, ew-çend jî mirovê dinyayê, mirovê nû-winî û pêşveketinê bû. Nav di xelkî dida ko bixwînin, her tiştî hîn bibin. Piraniya feqehên wî bi herfên latînî jî dizanî bûn.

جارکي من ژي پرسى بو، هکه ژ نفيساندا زمانى مه ب حرفين لاتيني ژ آلي شريعتى فه تو مانع هيه. رووى وي ئى دلال و ب نور، ب دڅکنکي زلال بو و لمن فگراند:

Carkê min jê pirsî bû, heke ji nivîsandina zmanê me bi herfên latînî ji aliyê şerîtê ve tu manî heye. Rûwê wî ê delal û binûr, bi devkenekê zelal bû û li min vegevand:

— ما چره هبت؟ خوهدى امر و نهيڼ خوه ژ مه ره نه ب حرف و شگلان، لى ب قصه ي دايه زانين، ژ خوه شگلين حرفين قرآنا پيشين نه ژ شگلين ايرو بون. ژ لورا، ميري من، ته کو خوهنديه و دنيا ديتيه، صح بکه و ژ مه ره حرفين ولى بپيره کو ملتى مه زوکا هيني خوهندى ببت. فتوا ب من ره به.

—Ma çire hebit? Xwedê emr û nehyên xwe ji me re ne bi herf û şiklan, lê bi qiseyê daye zanîn. Ji xwe şiklên herfên qurana pêşîn ne ji şiklên îrû bûn. Ji lewra, mirê min, te ko xwendiyê û dinya dîtîye, seh bike û ji me re herfînen welê bibijêre ko miletê me zûka hînî xwendinê bibit. Fetwa bi min re ye.

من گوت مير و ميرخاص بو. هرچي مسئلا بروارى صح كنه قنج دزانن او شيخي دلال چه ميركى زور بو. ب ده پانزده خلامين خوه فه قضا بروارى راکړيو. وكي خوه ددا برکشرکي، صد زلامين قنج نکاريون چپرا وى راکن.

Min got mêr û mêrxas bû. Herçi mesela Berwarê seh kirine qenc dizanin, ew şêxê delal çi mêrekî zor bû. Bi deh panzdeh xulamên xwe ve qeza Berwarî rakiri bû. Wekê xwe dida ber kevirekî, sed zilamên qenc nikari bûn çepera wî rakin.

برى سى سالان کافا مه دابو چيايڼ هشيرکان، ل خوه نه داني بو سوار ببه، خوه قهالت، دو رختين خوه آقيتن ستووى خوه، تفنگ ب ملي وى فه، ب پنچي و چند سالين خوه، وک خورتکي بيستسالى دابو کاش و شهاران.

Berî sê salan gava me da bû çiyayên Hevêrkan, li xwe ne danî bû suwar bibe, xwe vemalt, du rextên xwe avêtin stowê xwe, tîfing bi milê wî ve, bi pêncih û çend salên xwe, wek xortekî bîstsalî da bû kaş û şeharan.

KURMANJI KURDISH

پیاپین سست پی خرت دبون. خلك پی
 دسکین. شیخ عقد رحمان کتبیك، کتبیكه
 مزن و بی پیشان بو. لی صد حیف و محبان،
 لبر نسخه بکه دن نه هاته شیساندن.

Liser Kurdistanê te herçi jî bi-
 xwesta nik wî peyda dibûn. Dîroka
 eşîran, mêjvemayên mîletê kurdan...
 Di nav Kurdistanê de zehf geriha bû.
 Nemaze halê welatê Botan ecêb
 dizanî bû. Dikarî bû bibêje ser û binê
 her berê Botan ji çi rengî ne. Ser
 hakim û mîrekên Botan çîrokinen
 nebihîstî dizanî bûn.

بلی شیخی من تو مروشکی هولی بوئی، لی
 ایرو تو چویی و دستین مه ژ ته بونه.. نزام
 حیفا من ژکی ره بیت. ژ ته ره آن ژ مه ره؟
 تو چویی رحمتی، ام هشتن دناف درد و شینی
 ده.

Xelk dê bibêjin: Şêx Evdîrehman
 çû, kelaşê wî di çolê de ma. Herê
 mala xwe guhast, bê tîrb û gorn, bê
 rêç û şop, warkor çû...

No, kurdino, nekurdino! yarino,
 neyarino! dostino, dijminino! Evdi-
 rehman bi tîrb û gorn û xwedan war
 çû.

Lê veşartina wî jî wek mirin û
 kuştina wî ne bi awakî adetî, lê bi
 awakî dîn, bi awakî welê bû ko heta
 niho nenas û neçêkirî...

READINGS

Belê, şêxê min, min ji te re kefenekî welê bijart ko hêj tu kelaş pê ne hatiye pêçandin, min ji te re tirbeke welê koland ko hîn tu mirî ne ketinê.

بلی، شیخی من، من ژ توره کفنکی ولی بژارت کو هیژ تو کلاش پی نه هاتیه بیچاندن، من ژ ته ره تریکه ولی کولاند کو هین تو مری نه کنتی.

Min kefenê te kir: sor, sipî û kesk û zer, ala te, û min tu veşartî nav rûpelên Hawarê û li serê wî kêla te daçikand.

من کفنی ته کر: سور، سپی و کسک و زر، آلا ته، و من تو فشارتی ناف روپلین هاواری و ل سری وی کیلا ته داچکاند.

Tirba te tirbeke welê ye ko ne kêla wê bi brûskên ezmanî dişike, ne cax û dîwarên wî bi ba û bagerê hildiweşe, ne axa wê bi baran û lehiyê qul dibe û ji hev dikeve.

تربا ته تریکه ولی به کو نه کیلا وی ب بروسکین ازمانی دشکه، نه جاع و دیوارین وی ب با و باگری هلدقشه، نه آخا وی ب باران و لهیی قیل دبه و ژ هف دکفه.

Tirba te kitêbek e, ko nifşên miletê me deste-desta bikin û her nifş ji nifşê din re heta paşiyê, hinda rûja qiyametê, ji hevdu re dê bispêrin.

تربا ته کتیبکه، کو نشین ملتی مه دسته دستا بکن و هر نفس ژ نشی دن ره حتا پاشی بی، هندا روژا قیامتی، ژ هشدیره دی بسپرن.

Ev tirba te a abadîn e. Min eva ha ji bona te bijart û koland. Lê te tirbeke din jî heye ko tu bi xwe bê hemdê xwe û bê hemdê min hatî û ketî navê. Ew jî dilê min, dilê min ê jar û biderd e. Lê bi hevîn û hej kirina te ewçend xurt e ko bikare laşê min û kelaşê te heya paşiya emrê min hilgire, û me her du heta hingî bi xwedî bike...

اف تربا ته آ آبادینه. من افاها ژ بونا ته بژارت و کولاند. لی ته تریکه دن ژی هیه کو تو بخوه بی حمدی خوه و بی حمدی من هاتی و کتی ناخی. او ژی دلی من، دلی من ئی ژار و بدرده. لی ب هشین و هژکرنا ته او چند خرته کو بکاره لاشی من و کلاشی ته حیا پاشییا عمری من هلگره، و مه هر دو حتا هنگی ب خوه دی بکه...

Şêxê min bi pêncih û çend salên xwe ve wek zarokekî ko di paşila dêya xwe de dimirit, bê ax, bê nalîn û zarîn, bê teq-û-req û teşxele, bê deng û pêjn, bi rê ketî û çûyî.

شیخی من ب پنجه و چندسالین خوه فه، وک زاروکهکی کو د پاشلا دیا خوه ده دمتر، بی آخ، بی نالین و زارین، بی تق و رق و تشغله، بی دنگ و پیژن، ب ری کتی و چویی.

KURMANJI KURDISH

بلی تو دچووی و بته نه دحسیان، بیر
 نه دبیرن. ژ خوه بته بحسیانا کنگی او دستی
 بی بخت و بی شرم لته رادبو؟

Belê tu diçûyî û bi te ne dihesiyan,
 bîr ne dibirin. Ji xwe bi te bihesiya-
 na, kengê ew destê bêbextê ê bêşerm
 li te radibû?

بگری کردستانی، بگری، بگری بوتان
 بگری، بگرین گارسی بگرین، بگری گوزگهی
 بگری.

Bigirî Kurdistanê bigirî, bigirî
 Botan bigirî, bigirîn Garisî bigirîn,
 bigirî Gozgehê bigirî.

کچ و بوکین کردستانی، گلیین خوه کر
 بکن، خوه لی لسرین خوه بکن، رشا خوه
 گریدن، شین، شین بکن و ب آخ و زارینی
 بگرین. تو ژ میرو بگری! بکفه پیشیا حمیان
 بگری و بنال.

Keç û bûkên Kurdistanê, guliyên
 xwe kur bikin, xwelî li serên xwe
 bikin, reşa xwe girêdin, şîn...şîn
 bikin, bi ax û zarîne bigirîn. Tu jî,
 mîro, bigirî, bikeve pêşiya hemiyan,
 bigirî û binal.

شیخ عقد رحمان ژ کیسی همیان چو، لی
 نمازه ژ کیسی ته چو. بینه بیرا خوه وکی ب
 شیخی خوه ره رودنشقی چاوان لته فدکری،
 کسان چاقین وی ب هژ و هقینی تو همبیز
 دکری.

Şêx Evdirehman ji kîsê hemiyan
 çû, lê nemaze ji kîsê te çû. Bîne bîra
 xwe, wekê bi şêxê xwe re rudiniştî
 çawan li te fedkirî, kusan çavên wî
 bi hej û hevîne tu himbêz dikirî...

ای آخا کردستانی، ولاتی بوتان، عشیرا
 گارسان، هالانان د خوه بدن، پسنی خوه
 بدن فورتان و زرتان بکن و بیژن: عقد
 رحمان ژ آخ و توزا من هاتبو پی...

Ey axa Kurdistanê, welatê Botan,
 eşîra Garisan, halanan di xwe bidin,
 pesnê xwe bidin, fortan û zirtan
 bikin û bêjin: Evdirehman ji ax û
 toza min hati bû pê...

عقد رحمان ژ هشیناهیا چیاین من بلگه
 گرتبو...

Evdirehman ji heşînahiya çiyayên
 min belgih girti bû...

عقد رحمان د بن کونین من ده رابوو...

Evdirehman di bin konên min da
 rabû bû...

READINGS

Tu jî, Hawarê, pesnê xwe bide û
bêje: Tirba Şêx Evrيرهman di min
da ye; min ew veşartiye nav rûpelên
xwe, kêla wî daçikandiye raserî xwe.
تو ژى، هاوارى، پستى خوه بده و ببیژه:
تربا شیخ عقد رحمان د من دایه؛ من او
فشارتیه ناف روپلین خوه، کیلا وی
داچکاندیه راسرى خوه.

Ey erd, ji min bidexise ko min ew
şehîdê dîn û millet ji te re ne hişt û ne
kir para te...
ای اُرد، ژ من بدخسه کو من او شهیدی
دین و ملت ژ ته ره نههشت و نهکر پارا ته...

Şîn...şîn...şîn...her der reş, ne ma
heşîn. Dil bikul, can bikeser, çav
bigirîn.
شین...شین...شین...هر در رش، نهما
هشین. دل بکل، جان بکسر، چاف بگرین.

Bang dan, Şêx Evdirehman Garisî
ne ma, hati bû xêrê, çû rehmetê.
Celadet Ali Bedir-Xan
بانگ دان، شیخ عقد رحمان گارسى نهما،
هاتبو خیری، چو رحمتی.
جلادت عالی بدرخان

گورى ته‌کانه

Gurê Tekane

په‌رویز جهمانی

Perwîz Cihanî

(سروه ۳۰، به‌فرانبار ۱۳۶۷: ۷۳-۷۰)

Bihar û havîn û payîz li dû hev ra
hatin û derbas bûn. Danê xweşîyê çî
xweş bihorî. Xweşî û geşî, ronahî û
germa bihorîn û reşî û heşî û sir û
seqem* pê ra giheştin*. Xweşî çî zû,
bi lez û bez direve! Û reşî û nexweşî
çî girane! Nalîve û nabîzive, giranî-
yê dike û pêtgiran û gêrte û bêhn-
çîkîn û leşbizdîn e.
بهار و هافین و پایزل دوو هه‌ف‌پرا هاتن و
ده‌رباس بوون. دانى خو‌ه‌شى‌ى چ خو‌ه‌ش
به‌ورى. خو‌ه‌شى و گه‌شى، رو‌نایى و گه‌رما
به‌ورى و ره‌شى و هه‌شى و سه‌روسه‌رما پیلرا
گه‌هه‌شتن. خو‌ه‌شى چ زووب له‌زو‌به‌ز ده‌فه!
و ره‌شى و نه‌خو‌ه‌شى چ گرانه! نالقه و نابزفه،
گرانى دکه و پیت‌گران و گيرته و بیهن چکین و
له‌ش‌بزدینه.

KURMANJI KURDISH

گول و چيچه کين بهاري ل بهر تاڤا هافيئي
 حشک بوون و بايي پاييزي ژي کراسن وان
 رهفاند و بهرڤا زڤستاني ژي نه و کهڤه ن کرن.
 داني زڤستاني دگهل باکورڤا ربهندان ل
 سهه بيهنا جهاني بوو ميشان. رهن و کرپوه و
 شه پي، دهست دانه ههڤ و تهڤ هيرش برنه
 سهه ته پي چيپاييد بلند و هه ره ژور. چل و
 چيپا ل سروسه قهه م و مژ و طهه م و دوومان و
 فرتوني دا ئوندا بوونه.

عهور بيناني ههلقه يهک گول و چيچه کي
 زوزانا که تيهه گه رده نا وانا و سهه ري وان ناف
 عهورادا دهه که تنه دهرفا و ب عهساناڤه زه
 لقينه. تو ديبژي قهه ديل هه نه پي قوچي خوه
 سينگي عهسان ل سهه روين بکه ن کون کون و
 بقه و ليشن و نه فراز هه لکيشن. بهست و چولي
 دگهل ههرد و دولي فيستانه کي سپي چيل و
 بي نشان ل خوه کره.

زوزان و چيپا ل بن لحيهک چفته خاسه
 کهڤه ردا که تنه خه وهک گران و کوور. خه ورا
 چوونه و خه ونا بهاري و گول و چيچه کي
 کهسک و شين و بهلهک و ئال ئالي سور و
 ئال، به بيوون و سووسن و مه ندک و هه لز،
 بيهنا سورگولا و دهنگي بولبولا ديين.

ل قووچيد چيپاي هه ره ژور، بلي گشينا
 باگه ر و فزينا باي، چ دهنگ باي. نه دهنگي
 طهه ير و طوويا نه ژي خوشينا ئاقيد رووبار و
 چهه م و کاني و بهلهک يا، ل زوزان و چيپا و
 نه وال و دهڤ که ليا بهر گوها نا کهڤه.

Gul û çîçekên biharî li ber tava
 havînê hişk bûn û bayê payîzê jî
 kirasê wan revand û berfa zivistanê
 jî ew kefen kirin. Danê zivistanê di
 gel bakurofa rêbendanê li ser bêhna
 cîhanê da peya bû* û bû mêvan.
 Renî û kirêwe û şepê dest dane hev û
 tev hêriş birin ser çîya û tepên*
 bilind û herejor. Çil û çîya li sir û
 seqem û mij û tem û dûman û firtonê
 da wenda bûn.

Ewir bînanî helqeyek gulçîçekên
 zozanan ketîye gerdena çîyan û
 serên çîyan li nav ewiran ra* der-
 ketine derva û bi esmanan va zeli-
 qîne. Tu dibêjî qey dîl hene pê qoçê
 xwe sîngê asimanê bêy ser û bin
 biqewlêşin u hevraz* hilkişin. Deşt*
 û çolan di gel herd û dolan fîstanên
 sipî çîle bê nîşan li xwe kirine.

Zozan û çîya li bin lihêfeke çifte-
 xase kever da ketine xeweke giran û
 kûr, û xew ra çûne, û xewna* gul û
 çîçekên kesk û şîn û belek, û halhal-
 kê n sor û al, beybûn û sosin û men-
 dik û heliz, bêhna sorgulan û dengê
 bulbulan dibînin.

Li qûçên çîyayên here jor, ji bilî
 givîna bagerê û vizîna bayê çî deng
 nayê. Ne dengê teyr û tûyan tê, ne jî
 xuşîna avên rûbar û çok û kanîyan.*

READINGS

Avên kanîyan bînanî mencil û
 sîtilên mastê mîyan meyîne û li cî da
 qerisîne. Zemzelîlkan li dev sûlên
 newalan, û dîwarên zang û kendalan
 va bînanî şûşeyên gircîgircî û ba-
 dayî, xwe jor da şûş berdane û li ser
 serî daliqiyane. Û bînbêrên cuwan û
 dîmenên ber bi çav afirandine.*

ئافید کانیا بینانی مه‌نجهل و سیتلید ماستی
 مییا مه‌ینه و جیدا قه‌رسینه. بووز و سه‌هول ل
 ده‌ف سوولسی نه‌وال و دۆل و دیواری
 که‌ندالانسه گرجی گرجی و بادایی بینانی
 شووشاشووش خوه ژوردا به‌ردانه و
 سه‌رسه‌ری دالقیانه. و بینه‌ر و دیه‌نید جوان و
 به‌ریچاف خوه لقاننده.

Sirušta pîr xew ra çûye û li hej û
 liv û weş ketiye. Dunya kir û mit û
 mat bûye û bêy hejîyan û livat maye.
 Bêdengîyê çîya û gelî dagîr kirîye.
 Her tenê çend heftîyan, yan jî çend
 rojan carekê, li dîwarê gelîyekî kûr û
 pêsîra çîyayekî bilind û dûr qîrçîna
 renîyan di gel zûrîn û lûrîna gurên
 bîrsî, bêdengîya çil û çîyan û mat-
 bûna dol û gelîyan dişkîne û ewana
 li xewê hildipekîne*.

سروشستا پیر خه‌ورا چوویه و ل هه‌ژ و لث و
 وه‌ش که‌تییه. دونیا کرومات و بی هه‌ژیان و
 لقات مت مایه. بینه‌نگی بی چیا و گه‌لی داگر
 کرپیه. هه‌ر ته‌نی چه‌ند هه‌فتی یا یان چه‌ند روژا
 جاره‌کی ل دیواری گه‌لییه‌کی کوور و پیسیرا
 چیاپه‌کی بلند و دوور، قیرچینا ره‌نی یا دکهل
 زوورین و لوورینا گورید برسی بینه‌نگی یا چل
 و چیا و مات بوونا دۆل و گه‌لی یا دشکینه و
 نه‌وانا ل خه‌و هه‌لدپه‌کینه و قیزه‌قیزێ د‌خه‌ دلێ
 وان.

Hemêşe bi şkestina renîyan ra
 zûrîn bi revdên guran dikeve. Gurên
 zivistanê hemû revde digirin. Lê car-
 caran gurên tekane jî ber çavan dike-
 vin.

هه‌مه‌شه ب ئشکه‌ستنا ره‌نی یان را زوورین ب
 ره‌دئ گورا دکه‌فه. گورید زه‌ستانی هه‌موو
 هه‌رطم ره‌ده‌ دگرن، لی جار جارای گوری
 ته‌کانه به‌رچافا دکه‌فن.

Dûr va revdeyek gurên bîrsî li ser
 berfa pûk û kurşenegirtî li dû hev ra
 rêz girtibûn.* Te digot qey ketine
 tarê. Carna hindek jî wan heta nav-
 tengê di berfê û şepe da çik dibûn.
 Carcaran li hîvîya hevdu diman, lê
 hinde caran jî qet guhê xwe nedidan
 zûrîn û lûrîna hevalên xwe yên nav
 berfê da çik bûyî.

دوورفا ره‌ده‌یه‌ک گوری برسی ل سه‌ر
 به‌رفا پوک و کورشه‌ نه‌گرتی دوو هه‌فر
 دچوون. ئوسا په‌بی هه‌ف ریز ببوون، ته
 دکوت قه‌ی که‌تته تارێ. هه‌نده جارنا هه‌ندک
 هه‌تا ناقته‌نگی د شه‌په و به‌رفی دا چک
 دبوون. جارجارا هه‌تی یا هه‌ف دمان و لی هه‌نده
 جارای قه‌ت گوه‌نی خوه نه‌ددانه زوورین و
 لوورینا هه‌قالید خوه‌یه ناف به‌رفیدا چک

بووی.

KURMANJI KURDISH

لى هه مېشه دوورى ههف و ته كۆته كۆ
 پيشدا دچوون و نيزىكى ههف نه دكه تن. يه كى
 پشدا خوه يه كيشه گرى نه ددا. ل پيشه پيشا
 وى رهفديدا گوره كى گه ورى پشدا هيشين
 پى سىنگى خوه شه په دقه لاشت و بىد مابين
 زى كه تىبون دوو وى.

Lê hemêşe dûrî hev û teko, teko
 pêş da diçûn û nêzîkî hevdu nedi-
 ketin. Yekê pişta xwe bi yê dî va*
 girê nedida. Li pêşayîka* wê revdê
 da gurekî gewirî pişthîşin pê sîngê
 xwe şepe diqelaşt û yên mayî jî
 ketibûn dûv wî.

ئەو پيشهنگى رهفدى بوو. پىچ و كه ژاوى
 سهه بهرفى را دخشكى و بهرف جغز دكر.
 يه كى گر و كه فده بوو. شهنگ و كه ژاوى
 لسهه روهاى ئى رهونه ق دكه تن. چافى وى
 بينانى دو كاسكى خوونى بوون.

Ew pêşengê revdê bû. Pîrç û keja
 wî li ser berfê ra dixîşîkî û hêlên
 zirav li dû xwe ra li ser berfa pûk cî
 da dihêla.* Yekî gir û bi gevde bû.
 Rewneq dikete pîrç û keja wî.*
 Çavên wî bînanî du kasikên xûnê
 sor* bûn.

ئەو گورید کو هافیندا هند گوشتى بزى و
 بهرخ و کار و دووئى هوکچ و مى و بهرانا،
 هند بهزى ههسپ و كهه و هيستر و
 هيشتر، گوشتى كهو و كىرووشك و خه زال
 و پهزكىشى يا خاربوون، كهژ دابوون. كهژ و
 شهنگا وان عهردى را دخشكى. رهونه ق دكه ته
 پىچا وان، لى دلى وان برسينا دلهزى و ئى
 تاو دبوون.

Ew gurên ku havîn da hind goştên
 bizin û berx û kar, û dûvên hogîç û
 mîh û beranan, bezên hesp û ker û
 hêstir û hêştiran, goştên kew û kê-
 rûşk û karxezal û pezkûvî û şivran*
 xaribûn, kej dabûn. Kej û şengên
 wan li ser berfê ra* dixîşîkîn. Rew-
 neq dikete pîrça wan, lê dilên wan jî
 bîrsîna dilerizîn û bêtaw dibûn.

بهرفى و باگه رى رى و درب ختمان دبوو.
 شوپ و رىچا چ تشتى نه دهاته خوويان.
 كه رى و ته رش و گاران چووبوونه هه ل و
 گوڤ و پاگ و ئاغلان. خه زال و پهزكىشى و
 كهو و كىرووشك ئىدى بهرچا ئا نه دكه تن. چ
 نىچىر نه مابوون. لى برسى بوونى ئەو ئاف
 ههفدا گرتبوون. نكارين ل ئاف وى بهرف و
 باگهه و شه په و كوروفى دا پيشدا هه رن و ل
 دوو را ئى بگه رن.

Berfê û bagerê rê û dirb xitiman-
 dibû. Şop û rêça çî tiştî nedihate
 xûyanê. Kerî û terş û garan cûbûne
 hel û gov û pag û axilan. Xezal û
 pezkûvî û kew û kêrûşk êdî li ber
 çavan nediketin. Çî nêçîr nemabûn.
 Lê bîrsîbûnê ew li nav hev da girti-
 bûn. Nikarîn li nav wê berf û bager û
 şepê da pêş da herin, û li dû ra vê
 bigerin.

READINGS

ئه‌فا چهندك و چهند رۆژه چ تمشت بهر ده‌فی وان نه‌كه‌تیه. زكى وان برسى و دلئ وان تینی و چاڤئ وان شیلی ببوون. پێشه‌نگئ وان ئیدی بینانی به‌رى نكاری سینگی به‌رفی به‌لاشتا و پێشدا بچوويا. هنده جارال پێشاییکا ره‌قدئ دقه‌ما و دراوه‌ستا و پشت خوه‌را دنه‌پیری و دینا خوه ددا هه‌ڤالا.

چاڤئدی وى ل چاڤئن برسییه هه‌ڤالی وه‌ش داكه‌تی دكه‌ت. دانئید به‌ار و هه‌ڤینی، لاندئا خوه‌یه پاییزی ده‌انی بیره خوه ... ده‌ماكو دگه‌ل كو‌ما گورا دله‌یستن و سه‌ر هه‌ڤرا بانز ددان، زكى وان تیر و دلئ وان شا و به‌شه‌را وان خوه‌ش بوو. ده‌مئید كو لاندئا وان ته‌ژی گوشت و هه‌ستی یئید نیچیرئید جو‌ره جو‌ره بوون. هینگا چهندئ حه‌ژی هه‌ڤ دكرن.

لئ نه‌ برسینا نه‌ شین رئ هه‌رن و لناف به‌رفئ دا قه‌مانه. گه‌لو نه‌ ژئ ئه‌و حه‌ژك و ئه‌فینا پێشدا ل دلئ واندا مایه؟! گه‌لو دیسا ژئ سه‌ها دلوفانی و هه‌ڤ هه‌بانئ ل دلئ واندا هه‌یه؟ یان برسى بوون و گیروداری بی دلئ وان ره‌ش کریه؟

كوندكئ سه‌ر به‌رفئ روونشت و به‌رى خوه هه‌واله سه‌ر عه‌سنا‌دا‌دا كر و كوور زوورییا. گورئید مایین ژئ پیرا زووریان—ته‌ دگوت قه‌ی برسینا‌گازی خودئ دكرن و رزقئ خوه ژ خودئ د‌خاستن. لئ ل وى چیبایی بی خایی و خوداندا چ هه‌بوو؟! چ ده‌ست دكه‌ت كو زكى وان تیر بکه و هیز و تاوئ بجه دل و چوكئید وان!*

Eva çendik û çend rojin, ku çî tişt li ber devê wan neketîye. Zîkê wan bîrsî, dilê wan bê taw* û çavên wan şêlû bibûn. Pêşengê wan êdî bînanî berê nikarî sîngê berfê biqelaşt û pêş da biçûya. Hinde caran li pêşayîka revdê da, vedîma û radiwesta û pişt xwe ra dinihêrî, û li hevalan mêze dikir.*

Çavên wî li çavên hevalên jî weşdaketî diketin.* Danên buhar û havînê, landa xwe ya payîzê dihanî bîra xwe. Dema ku di gel koma guran dileystin û ser hev ra banz didan, zîkê wan têr û dilê wan şa û beşera wan geş û* xweş bû. Demên ku landa wan tijî goşt û hestîyên nêçîrên cure cure bûn. Hîngê çendê hejî hevdu dikirin.

Lê niha bîrsîna neşên rê herin û li nav berfê da vemanê. Gelo niha jî ew hez û evîna pêş da li dilê wan da maye? Gelo dîsan jî seha dilovanî û hevhebandinê li dilê wan da maye*? Yan bîrsê û gîrodarîyê dilên wan reş kirine?

Kundkî ser berfê rûnişt û berê xwe hewale ser esmanan da kir û kûr zûriya. Gurên mayîn jî pê ra zûriyan. Te digot qey bîrsîna gazî xwedê dikirin û riskê xwe jê dixwestin. Lê li wî çîyayê bêxwedî û xudan da çî hebû?! Çî li dest diket, ku zîkê wan têr û çokên wan bi hêz û taw bikira?!*

KURMANJI KURDISH

ههوا بهره بهره سارتتر دبوو و سروسه رمایێ
هینز و تاوا گورا هیندی هیندی کیم دکر. زۆر
گران و ئی همدی خوه پێشدا دچوون.

Hewa berebere sartir dibû û sirê û
sermayê hêz û tawa wan hêdî hêdî
kêm dikirin. Zor giran û bêhemdê
xwe pêş da dicûn.

ل نزاری چییایهکی دا رهفدا گورا بوون دو
تیشا. بید پیر و وهستیایی لناف بهرفی دا ل بئی
گهلی دا مان و تیشهک ژێ ل دوو پێشهنگ
کهتن و ل پشت گراک دا قولوبین. دهستا کو
ل دوو پێشهنگ را دچوون سهه ههف چار
حهب بوون. دیله گور و پێشهنگ و دو توولید
وان.

Li nizarê çîyayekî da revda guran
bû du tîşan. Yên pîr û westiyayî li
nav berfê da li binê gelîyî da man.
Tîşek jî li dû pêşengî ketin û li pişt
girikî da qulibîn. Dest a ku li dû pê-
şengî ra diçûn, ser hev di gel pêşengî
çar heb bûn. Dêlegur û pêşeng û du
tûlên wan.

چافید پێشهنگ دوورفال رهخ ئاقهکی
تشتهک قهتهه کر. ب رهفدا خوهقه لناف
بهرفی دا بهر ب وی رهشی شوولکین. دینا
خو دانی، روقییهکی کهژ کو دیلا وی یا پان
گرافی ل لهشی وی به کووشکه دکر ل رهخ ئاقی
دسمسه. ههه چار گورا دؤرا رقی گرتن. رقی
ب وی فیلبازی و ئانیزازی یا خوهقه نهشییا ل
گیروههلبوفا گورا رزگار به. گورید برسی رقی
لناف ههفدا گرتن. واقهواق ب رقی خستن و
رقی پرتشه کرن. لی جهندهکی روقی ئی کووشکه
و هندک چ دکاری تهندووورا زکی چار گورا
گور که و دیزکا حووری وان داگره؟

Çavên pêşengî dûr va li rex avekî
tişteq qeter kirin. Bi revda xwe va li
nav berfê da ber bi wî reşî şûlikî.
Dîna xwe danê, rûvîyekî kej, ku dêla
wî ya pan giranî li leşê wî yê kûşke
dikir, li rex avê disimsime. Her çar
guran dora rûvî girtin. Rûvî bi wê
fêlbazîya xwe va, neşîya ji* gîr û
helboqa guran rizgar bibe. Gurên
birsî rûvî li nav hev da girtin û
waqewaqaq pê xistin û kirin piroze* û
pirtvekirin. Lê cendekê rûvî yê
kûşke û hindik çî dikarî tendûra zikê
her çar guran gur bikira* û dîzka
hûrê wan dagirta?*

READINGS

هەردوو تووله ل سەر چىپا رڤى دهڤۆزهنى هەف بوون. يەكى خوه ل ڤى دى دا. ل وى دەمىدا پيشهنگ و دپلهگور پيرا گههيشتن و هەر سى ل سەر سەرى يەكى بەرهف بوون و ئەو زى بينانى رڤى چق چتى كرن و پوورتا وى زى وهكى تووكا رڤى ل سەر بەرفى خستن و ئەو زى داقورتانندن و رى يا خوه گرتن و چوون. لى ديسا زى بينا بەرى ريز و رهڤده.

هەوا هند سار و حشكهسايى بوو كو تووك ل هەوا دقەرسى. بيهنا خوونى دابوو سەرى پيشهنگ و دلئى وى ديسا گوشتى گەرم داخاست. ل نيچيره كى دگەريا كو زكى وى به نيڤ تير تيزى كه. هەى دچوو، هەى پيشت خوهڤه دپهري. ل هەر دوو هەڤالا ميژه دكر و پيشدا دچوو، لى دودل و نهيران — ته دگوت قەى كافهكى پيشدا دچە و دو كافا پاشدا دئ.

نشكافا ل ديوارى كەندالهكى كوور كو باڤى تهزى بهفر كرىبوو، توولئى مايى ل بەرفى دا چك بوو. كاستين لى هات و سەر كەندال دا لكومى. پيشهنگ بينانى باڤى بهزى سەردا زڤرى و ئىدى فرک و پيش نهداڤى و نههيشت ئەو ل ناف بەرفى دا دەر كهڤه. دهڤ د پاطكا وى دا جى كر و كەته سەر بيهني. دپلهگور زى هاته ئارى. ئەوانا توولك دانه بەر قىلا و خوونا سۆره توولك رڤيا سەر بەرفا كهڤەر. پوورتا وى بينانى پىچ و هرى يا بزى و مى يا ل سەر بەرفى بوو بەراته. هەر دوو گورا هەتا هەستكىد توولك زى فههيران. پيشتى پرتشه كرن و خارنا توولك كەتن رى و بەر ب دهشتى داكەتن.

Herdu tûle li ser çîpa rûvî devojenî hevdu bûn. Yekê xwe li yê dî da. Li wê demê da pêşeng û dêlegurê jî xwe pê ra gîhandin* û hersêk li ser yekê berev bûn û ew jî wekî rûvî çiqçiqî kirin. Pûrta wî jî wekî tûka rûvî li ser berfê xistin û ew jî daqurtandin û rîya xwe girtin û çûn. Lê dîsan jî bînanî berê rêz û revde.

Hewa hind sar û hişkesayî bû, ku tûk li hewa diqerisî. Bêhna xûnê dabû serê pêşengî û dilê wî dîsan jî goştê germ dixwest. Li nêçîrekê digeriya, ku zikê wî yê nivetêr tijî bike. Hey diçû û hey jî li pişt xwe ra dinihêrî û li herdu hevalan mêze dikir û pêş da diçû, lê dudil û nihêran. Te digot qey gavekê pêş da diçe û du gavan paş da dizivire*.

Li dîwarê kendalekî kûr û bilind da, ku bayê tijî berf kiribû, tûlê mayî nişkava li berfê da çik bû û kastûn jê hat û li ser kendal da likumî. Pêşeng bînanî bayê bezê li ser da zivirî û êdî firk û pêş nedayê û nehîşt ew ji nav berfê da derkeve. Dev di patika wî da cî kir û kete ser bêhnê. Dêlegur jî hate arî. Ewana tûlik dane ber qîlan û xûna wî ya sor rijandin* ser berfa kever û pûrta wî jî bînanî pirça bizin û hirîya mîhan li ser berfê bû berate. Herdu guran heta hestikên tûlik jî vehêran. Piştî pirtvekirin û xarina tûlik ketin rê û ber bi deştê daketin.

KURMANJI KURDISH

گورئ گه وری پشت هیشین ئیدی فیله بی
 گوشتی هه فاله ببوو. دزانی چاوا هه فاله ل
 عهردی ده و دهف د پاطکا وندا جی که. لی
 دیله گور بی خه بهر ل دوور دچوو. ناگا ل چ
 نشتی نه بوو.

Gurê gewrî pişthişin êdî fêreyî
 goştê hevalan bibû. Dizanî çawan
 hevalan li erdê bide û dev di patika
 wan da cî bike. Lê dêlagur bêxeber li
 dû ra diçû. Agah li çi tiştî nebû.

مدهه که کورت سهرا ده رباس بوو. سر و
 سه قه م و با و باکه ری مه جالا وان بر پیبوو. چ
 رهش و ره شاتی ل بهر چاچا نه دکهت، بر سی
 بوونی زور دابوو وان.

Mideheke kurt li ser ra derbas bû.
 Sir û seqem û ba û bagerê mecala
 wan birîbû. Çi reş û reşatî li ber
 çavan nediketin. Birsîbûnê zor dabû
 wan.

گورئ گه وری ل سه بهرفی کوندکی روونشت
 بوو. چافی خوه کوتا بوو. دیله گورئ دپوئزی —
 ته دکوت قه ی خه ونا که ری و ته رشی ششان
 نشستی دینه. ل نا ف ده ریایا خه ون و خیالاندا
 زوور ما بوو. ل دیله گورئ میزه دکر.
 دیله گورئ پشتا خوه دابوو وی، های ژئی
 نبوو. راستی ژئی دیله گورئ پشتا خوه پیشه
 گری دابوو، نارخاین و پشتنگه رم بوو. نه وژی
 دپوئزی و ل بیر و هزرا زکی خوه بی برسی دا
 بوو.

Gurê gewr kundkî li ser berfê
 rûniştibû, çav kutabû dêlegurê û kûr
 diponijî. Te digot qey xewna kerî û
 terşên şivannivistî dibîne. Li nav
 deriyaya xewn û xîyalan da zûr
 mabû, li dêlegurê mêze dikir. Dêla-
 gura ji her derî bêxeber jî,* pişta
 xwe dabûyê*, hay jê nibû. Rastî jî
 dêlagurê pişta xwe bi pêşengî va
 girêdabû. Jê dilnîya û piştgerm bû.
 Ew jî dihênijî û diponijî. Li hizra
 zikê xwe yê birsî da bû.

READINGS

که‌لینه‌ک باش بوو. گوری گهور نه‌دکاری
 فنی فورسه‌ند و که‌لینه‌ی ژ ده‌ست خوه بکه.
 ده‌ف و ددانی وی فیله بیوون. ده‌ف و ددانی
 کو فیله‌ی خارنا گوشتی هه‌قالا به، رالی نابه.
 برسی بوونی زور دابوو گوری گهور.
 طه‌له‌طه‌ل ژ جی رابوو. نشکی‌شا خوه ئاقینه
 سه‌ر دپله‌گوری و مه‌جال و مکان لی بری و
 قیل د پاطکی و چه‌نگ ل هه‌وگی دا جی کر
 و که‌ته سه‌ر بیه‌نی و ل کافیدا نه‌و چق چتی کر
 و هه‌له‌راند و که‌ته سه‌ر جه‌نده‌کا. بدله‌کی تیز
 گوشت خار. پشستی پزقاندن و خارنا
 دپله‌گوری خوه سه‌ر به‌رفی که‌قزاند و ل به‌ر
 تافی قه‌لزانده. ده‌فی خوه ئالاست و ته‌فری‌یی
 خوه راست کر.

پشستی مده‌هکی دوور و دریز ته‌زه شیبابوو
 زکه‌کی تیز گوشت بخو. به‌رف پیکول دکر و
 پوزی خوه ل سن به‌رفی را دکر. ئیدی
 پی‌شه‌نگی گورا بیوو گوری ته‌کانه. ته‌ک و ته‌نی
 مابوو.

ئه‌و هیم بیوو ته‌نی دچوو نیچیری. ل چل و
 چیا نیچیر ده‌ست نه‌دکه‌ت، لی فیله بیوو.

دچوو ده‌ف دورا گوندا و سه‌بید گوندا نیچیر
 دکر. لی سه‌بید گوند پی‌ه‌سییا بوون. کافاکو
 گور نی‌زکی وان دکه‌ت هه‌مووی هه‌فر
 هیزش دتانی و دکر زووره زوور. لی گوری
 ته‌کانه لناف وی کومی دا خوه‌را تشته‌ک
 دره‌فاند. ترسا وی که‌توو دلی سان و سه
 نه‌دویرین سه‌ر سی یا وی بکه‌تانا.

Kelênek baş hilketibû*. Gurê
 gewr nedikarî vê derfendê* ji dest
 xwe bike. Dev û didanên wî fêreyî
 goştê hevalan bibû*. Dev û didanên
 ku fêreyî goştê hevalan bibe, ra lê
 nabe. Birsîbûnê zor dabû gurê gewr.
 Teletel ji cî rabû, ne ji gav* da xwe
 avîte ser dêlegurê û mecal û mikan û
 delîve* jê birî û qîl di patika wê* û
 çeng li hewkê da cî kir û kete ser
 bêhnê û di gavê da ew çiqçiqî kir û
 hildirând û kete ser cendeka. Bi
 dilekî têr goşt xwar. Piştî bijiqandin
 û xwarina dêlegurê xwe li ser berfê
 gevizand û li ber bayê* qelizand.
 Devê xwe alast û tevizîyên xwe rast
 kir.

Piştî midehekî dûr û dirêj taze
 şiyabû zikekî têr goşt bixo. Berf
 pêkol dikir û pozê xwe li bin ra
 dikir. Êdî pêşengê guran bibû gurê
 tekane. Tek û tenê mabû.

Ew êdî berebere hîm dibû, ku tenê
 biçê nêçîrê. Li ber sir û seqemê, li çil
 û çîyan nêçîr dest nediket. Lê ew

fêre bibû, diçû dev û dorên gundan û
 seyên gundan nêçîr dikir. Lê seyên
 gundan pê hesiyabûn. Gava ku gurî
 nêzîkî bi wan dikir, hemuyan bi hev
 ra hêriş didanê û dikirin zûrezûr. Lê
 gurê tekane çawa heba, ji nav wê
 komê da, ji xwe ra tiştêk direvand.
 Tirsî wî ketibû dilê segan da û se
 nediwêrîn ser sîya wî biketana.

KURMANJI KURDISH

شەفەکی دیسا گوری تەکانە بەر ب وی
گوندی ری کەت. هیمی بییری یا بیخودان
ببوو. بەرفی و باگەری دەست پی کریوو.
گۆفەگۆفا بای بوو، لی گەورۆ ئیھ بەرچاقارا
نەدھات. تەندووورا زکی وی پی ئاردوو مابوو.
بینانی هەرچار هیرش برە کۆما سان. لی
خودانی سان پی هەسیابوون و کەتبوون
بووسی پی. دەنگی گولەپەکی زووپی ب
گوری گەور خست و ئەول عەردی
قەخست و سەیند گوندل سەر جەندەکی
